



K. T.

**ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKÎYEYÊ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ**

Teza Lîsansa Bilind

**TÊGEHA “EMRÊ TEZE” DI ROMANÊN KURDÎ YÊN
ÊWRA SOVYETÊ DE**

Hüseyin KAR

22711027

Şêwirmend

Prof. Dr. Mustafa ÖZTÜRK

Mêrdîn 2025

K. T.
ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKÎYEYÊ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ

Teza Lîsansa Bilind

TÊGEHA “EMRÊ TEZE” DI ROMANÊN KURDÎ YÊN
ÊWRA SOVYETÊ DE

Hüseyin KAR

22711027

Şêwirmend

Prof. Dr. Mustafa ÖZTÜRK

Mêrdîn 2025

T. C.
MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ
TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
TEZ ONAYI

Enstitümüz Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı 22711027 numaralı yüksek lisans öğrencisi **Hüseyin KAR**’ın hazırladığı “**Têgeha Emrê Teze di Romanên Kurdî yên Êwra Sovyetê de**” başlıklı YÜKSEK LİSANS tezi ile ilgili TEZ SAVUNMA SINAVI, Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliği uyarınca 23.09.2025 günü saat 21.00’da yapılmış, tezin onayına OY BİRLİĞİYLE karar verilmiştir.

Başkan: Doç. Dr. Mustafa ASLAN

Üye: Dr. Öğr. Üyesi Mehmet YILDIRIMÇAKAR

Üye: Prof. Dr. Mustafa ÖZTÜRK

ONAY

Bu tezin kabulü, Enstitü Yönetim Kurulu’nun. tarih ve.sayılı
kararı ile onaylanmıştır.

...../...../2025

Doç. Dr. Ahmet KIRKAN

Enstitü Müdürü

ETİK BEYAN

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Tez Yazım Kurallarına uygun olarak hazırladığım bu tez çalışmada;

- Tez içindeki bütün bilgileri etik davranış ve akademik kurallar çerçevesinde elde ettiğimi,
- Tez çalışmasının hazırlık, bilgi, belge, veri toplama, analiz ve bilgilerin sunumu olmak üzere tüm aşamalarda bilimsel etik ve ahlak kurallarına uygun davrandığımı,
- Tez çalışmasında kullanılan tüm eserlere eksiksiz atıf yaptığımı ve kullanılan tüm eserlere kaynaklar/kaynakçada yer verdiğimi,
- Tez çalışmasının özgün olduğunu,
- Tez çalışmasının Mardin Artuklu Üniversitesi tarafından kullanılan “bilimsel intihal tespit programı” ile tarandığını ve hiçbir şekilde “intihal içermediğini” beyan eder, aksinin ortaya çıkması durumunda her türlü yasal sonucu kabullendiğimi bildiririm.

Hüseyin KAR

25.08.2025

KURTE

Teza Lîsansa Bilind

Têgeha “Emrê Teze” di Romanên Kurdî yên Êwra Sovyetê de

Hüseyin KAR

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê

Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

111 Rûpel

Ev vekolîn, li ser têgeha "Emrê Teze" di romanên Kurdî yên êwra Sovyetê de, disekine û bandora îdeolojîya fermî ya Sovyetê li ser Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê çî bûye, dinirxîne. Armanca vekolînê, di çarçoveya Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê de, şîrovekirin û analîzkirina têgeha "Emrê Teze" û têkilîya wê bi Realîzma Sosyalîst re ye. Lêkolîn, li ser bingeha "nivîskarên Kurd ên êwra Sovyetê, bi awayê edebî, çawa xizmeta propagandaya Sovyetê kirine?" hatiye avakirin. Lêkolîn, li ser bingeha teorîya Realîzma Sosyalîst a Jdanov-Stalîn û têkildarîya wê bi edebîyata kêmeteweyan re ye. Lêkolîn, li ser sê temayên sereke yên têgeha "Emrê Teze" di romanên Kurdî yên Sovyetê de disekine: Xwendin û Zanist, Aborî û Çandinî, Çand û Huner. Di encama lêkolînê de hat bidestxistin ku têgeha "Emrê Teze", bi pêşveçûnên aborî, zanistî, hunerî û teknolojîk ve tê temsîlkirin û li gor vê dîtînê, têgeha "Emrê Teze" ne tenê guherîneke dîrokî bû, herwiha projeyeke îdeolojîk bû ku diviyabû bi edebîyatê were normalîzekirin. Ev vekolîn, ji bo Edebîyata Kurdî ya giştî dikare bibe çavkanî, wekî mînaka têkilîya huner û siyasî û rola avakirina edebîyatê di avakirina civakan de.

Peyvên Sereke: Emrê Teze, Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê, minetdariya ji bo Sovyetan, Realîzma Sosyalîst.

ÖZET

Yüksek Lisans Tezi

Sovyet Dönemi Kürt Romanlarında “Yeni Hayat” Kavramı

Hüseyin KAR

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

111 Sayfa

Sovyet Kürt edebiyatının ilk adımları, Ekim Devrimi’nden sonra Sovyetlerin kültürel politikaları doğrultusunda, Ermenistan’da birkaç Kürt yazarın ve Kürtçe bilen Ermeni aydınların katkısıyla atılmıştır. Bu dönemde Erebe Şemo, Egîdê Xudo, Eliyê Evdilrehman ve Heciyê Cindî gibi yazarlar, Sovyet resmi ideolojisi olan Sosyalist Realizm doğrultusunda eserler üretmişlerdir. Bu çalışmada, söz konusu yazarların *Hopo* ve *Jiyana Bextewar* (Erebê Şemo), *Dê û Demarî* (Egîdê Xudo), *Morof* (Eliyê Evdilrehman) ve *Hewarî* (Heciyê Cindî) adlı romanları incelenmektedir. Bu romanlar, yoksul köylü, çoban, işçi gibi karakterlerin sosyalizmle bilinçlenerek dönüşümünü konu alır. Kahramanlar, Sovyet sistemine bağlı, çalışkan ve fedakâr bireyler olarak betimlenirken, ağa ve bey gibi geleneksel otoriteler mahkûm edilmektedir. İncelemede, bu romanlarda “yeni insan” anlayışı ile “Yeni Hayat” kavramı arasındaki ilişki kuramsal bir çerçevede değerlendirilmiş; Sosyalist Realizm’in anlatı stratejileri ve ideolojik etkileri irdelenmiştir. Ayrıca, eserlerde Sovyet sistemine duyulan minnettarlık ve yeni rejime bağlılık söylemi çözümlenmiştir.

Anahtar Kelimeler: Yeni Hayat, Sovyet Kürt Edebiyatı, Sosyalist Realizm, Sovyetlere minnettarlık.

ABSTRACT

Master Thesis

The concept of “New Life” in Soviet Kurdish Novels

Hüseyin KAR

Mardin Artuklu University

Institute of Graduate Education

Department of Kurdish Language and Culture

111 Pages

The first steps in Soviet Kurdish Literature were taken in Armenia after the October Revolution, thanks to the official policies of the Soviet Union, under the leadership of several Kurdish writers and with the assistance of Armenian intellectuals who knew Kurdish. Kurdish writers such as Erebe Şemo, Eliyê Evdîlrehman, Egîdê Xudo, and Heciyê Cindî wrote about the lives and struggles of shepherds, peasants, workers, and farmers within this literature, employing the methods of Socialist Realism, the official doctrine of the Soviet Union, which required writers to act as social engineers. In their novels, they addressed the helplessness and poverty of these people, then enlightened them through Socialism, leading them to happiness and peace. Their protagonists are self-sacrificing guardians of the new system and are always grateful to the Soviets. In their novels, they condemn landlords, beys, and exploiters while praising Lenin and the Soviet system. They also present the prototype of the "new Soviet person." In this study, we analyze the novels *Hopo* (Erebê Şemo), *Jiyana Bextewar* (Erebê Şemo), *Dê û Demarî* (Egîdê Xudo), *Morof* (Eliyê Evdîlrehman) and *Hewarî* (Heciyê Cindî) within the framework of the concept of the "New Era" and examine the influence of Socialist Realism on these novels. Additionally, we explore and analyze traces of gratitude toward the Soviet system in these works.

Key Words: New Life, Soviet Kurdish Literature, gratitude to the Soviets, Socialist Realism.

PÊŞGOTIN

Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê beşek ji Edebîyata Kurdî ya giştî tê hesibandin. Lê wekî Edebîyata modern a êwra Stenbol û Silêmanîyeyê, li ser hîmên Edebîyata Kurdî ya Klasîk bilind nabe. Salên dûredirêj di bin hukmê îdeolojîya Yekîtiya Sovyetan de dimîne, loma hem bi awayê naverok hem jî bi awayê teşe ji Edebîyata Kurdî ya giştî gelekî cuda ye. Salên pêşî wekî salên hînbûn, werger û perwerdehiyê derbas dibin. Yekem car li vê deverê pirtûkên Kurdî tînin nivîsandin, çapkirin û belavkirin. Piştî salên 60î, bi navên nû û perwerdekirî re, rengê nû peyda dibe li vê edebîyatê. Giranîya îdeolojîya Sovyetan kêmtir dibe, temayên cuda, wekî xweza, eşq û evîn û hesreta welatê bav û kalan derdikevin pêş.

Berhemên pêşîn yên vê edebîyatê, pirtûkên dersan in. Li dû wan berhevok û li dû wan jî helbest, roman, piyes û çîrok tînin nivîsandin. Ev berhem, bi temamî bi rêbazên doktrîna Realîzma Sosyalîst, bi armanca avakirina civakeke nû û belavkirina pergala Sosyalîzmê tînin nivîsandin. Ew, ji nav fabrîqeya îdeolojîyê ya Sovyetê derdikevin. Helbet mîna berhemên klasîk, di naveroka van berheman de beşa methîyeyê tune lê xwendevan ti car jî vê bêpar namînin. Spasî, şikurdarî û minetdarîya ji bo Sovyetan, ya di van berheman de, tim û daîm heye.

Romanên vê êwrê, ên ku bûne mijara vê xebatê jî, ji bo têgeha “Emrê Teze” hatine nivîsandin, ku ev têgeh bi xwe îdeolojîk e û amûrên propagandayê yên Sovyetê ew bi awayekî sistematîk û plankirî li nav hemû edebîyatên Sovyetê bi cih kirine.

Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê, ji ber sedemên polîtîk, herçiqas ji Edebîyata Kurdî ya Klasîk dûr mabe jî, piştî xwe hertim daye çand û folklorê Kurdî û pê xwedî bûye. Loma cureyên edebî yên vê edebîyatê, heman demê ji bo me nimûneyên arşîva ziman û çanda Kurdî ne jî. Bi hezaran gotinên pêşîyan, çîrok, stran, biwêj, mamik û wekî wan nimûneyên folklorîk hatine komkirin, pê re di helbest, çîrok û romanên de cih girtine. Qeyda zimanê Kurdî -Kurmancîya Serhedê- hatiye girtin û taybetîyên vê devokê hatine parastin.

Ji destpêka Şoreşa Cotmehê heta îro, bi sedan berhemên giranbiha hatine nivîsandin û li nav hemû Kurdan berbelav bûne. Bi peyrewîya kesên wekî *Erebê Şemo*, *Ehmedê Mirazî* û *Heciyê Cindî*, ku pîranîya wan Kurdên Êzidî ne, li devera Kavkazê, di bin serwerîya Sovyetê de, derbasî êwreke din bûne. Ev êwr, êwra afirandin û hilberîna berhemên hunerî ye. Îro gava em van berhemên wan dixwînin, folklorê Kurmancî, edet û tore, zimanê bav û kalan, ew zimanê çîrok û meselokên kal û pîran tînin hizra me.

Di amadekirina vê tezê de, birêz Prof. Dr. Mustafa Öztürk şêwirmendîya min kir. Ji ber alîkarîyên wî û zehmetîyên ku min danê spasiya wî dikim. Herwiha spasiya Doç. Dr. Mustafa Aslan û Dr. Öğr. Üyesi Mehmet Yıldırımçakar dikim ku bi û şîrove û rexneyên xwe, rê li ber min xistin. Herî dawî, spasîya malbata xwe, hevîna xwe Zeyneb û kurê xwe Ferzad, dikim ku di vê pêvajoyê de min ew îhmal kirin.

Hüseyin KAR

Mêrdîn-2025

NAVEROK

KURTE	IV
ÖZET	V
ABSTRACT	VI
PÊŞGOTIN	VII
NAVEROK	IX
KURTEBÊJE	XI
DESTPÊK	2
Mijar û Angaşta Xebatê.....	5
Mebest (Armanc) û Giringiya Xebatê	9
Çarçove, Sînor, Rê û Rêbazên Xebatê.....	10
Plana Xebatê: Danasîna Beşên Xebatê	11
BEŞA YEKEM	13
1. HEBÛNA KURDAN A LI KAVKAZÊ, KUNYEYA EDEBÎYATA KURDÎ YA ÊWRA SOVYETÊ Û REALÎZMA SOSYALÎST	13
1.1. Civaka Kurdên Li Kavkazê, Berîya Sedsala 20an.....	13
1.2. Di Sedsala 20an de Hebûna Kurdan li Kavkazê û Îmkanên ku bi Dest Ketin	15
1.2.1. Rûdanên şerê cihanê yê yekem li serhedê û kavkazê.....	16
1.2.2. Avabûna yekîtiya sovyetan û tesîra wê li ser kurdên kavkazê	17
1.2.3. Îmkanên ku bi dest ketin	19
1. 3. Kunyeya Edebîyata Kurdî ya Êwra Sovyetê	23
1.3.1. Êwra yekem (1920-1937):.....	25
1.3.2. Êwra duyem (1937-1955):	27
1.3.3. Êwra sêyem (1955-1991):	28
1.4. Teorîya Realîzma Sosyalîst.....	37
1.4.1. Têkilîya realîzma sosyalîst bi edebîyata kurdî ya êwra sovyetê re	40
1.4.2. Minetdarîya ji sovyetan re	41
BEŞA DUYEM	44

2. TÊGEHA "EMRÊ TEZE" DI ROMANÊN KURDÎ YÊN ÊWRA SOVYETÊ	
DE.....	44
2.1. Danasîn û Analîzeke Kurt.....	44
2.2. Xwendin, Perwerdehî û Zanyarî.....	51
2.3. Aborî û Çandinî.....	64
2.4. Çand û Huner	82
ENCAM.....	92
ÇAVKANÎ.....	95

KURTEBÊJE

hb.: heman berhem

hg.: heman gotar

hm: heman malper

hn: heman nivîs

hr.: heman rûpel

hwd.: her wekîî din

j.: jimar

r.: rûpel

wer.: wergêr

weş.; weşan/weşanên

YKSS: Yekîtiya Komarên Sosyalîst ên Sovyetê

YS: Yekîtiya Sovyetan

DESTPÊK

Tevgerên sîyasî û aborî, yên ku di sedsala 18. de zêde dibin, di destpêka sedsala 19. de dibin sedema şerekî cihanî ku Rojhilata Navîn û Kavkaz jî di nav de ne. Ji ber şerên dirêj ên navbera Osmanî û Rûsan û li pey wê şerê cihanê yê yekem, li herêma Serhed û Kavkazê pirsgirêkên mezin ên civakî, aborî û sîyasî rû didin. Ev xeletî tûnd û tûjîyê ku dibe sedema wêranîyeke giran li hemû aliyên civakê, piştî tevgerên gel û nakokîyên navxweyî yên li Împeratoriya Rûsyayê, bi dawî dibe. Pergaleke nû saz dibe û dewleta nû ya ku wekî *Yekîtiya Komarên Sovyet ên Sosyalîst (YKSS)* bi nav dibe, bi vê pergala nû tê birêvebirin. Pêvajoyeke nû ya avakirina civakî û çandî dest pê dike. Pergala kevn a ku li ser desthilatdariya bûrjûwazîyê ava bûbû, tê terkkirin û karker û gundî dibin xwedîyê mafên rêvebirinê. Di çarçoveya pêvajoyê de, ji hêla perwerde, çand û aborîyê reform tênê kirin ku herkes, bi taybetî karker, gundî û neteweyên kêmjimar ên ku di dema împeratoriya de hatibûn paşguhkirin, sûd jê werdigrin. Bi saya van reforman, ciwanên Kurd li komarên Sovyetê yên wekî Ermenîstan, Azerbaycan û Gurcîstanê dest bi xwendinê dikin. Herwisa bi alîkariya rewşenbîr û nivîskarên Ermen ên ku bi Kurdî baş dizanibûn, derîyê bizaveke nû ya edebî vedikin. Herçiqas berdewamîyeke bi rêk û pêk çê nebe jî, bi sedan berhemên wêjeyî tên nivîsîn, dibistanên ku perwerdehiya bi Kurdî didin tên vekirin, komên şanoyê tên avakirin, rojnameyên Kurdî, ku ya herî navdar *Rya Teze* ye, dest bi weşanê dikin û di radyoyên dewletan de weşanên Kurdî tên kirin. Bi van derfetan, digel ku nîyeta propagandaya Komunîzmê heye jî, ji bo Kurdan guherîn û pêşketineke rasterast çê dibe. Kurdên ku koçer, gundî û belengaz in bi perwerdehiyeke sistematîk dikevin ber bayê guherînê. Bi vî bayî re dibin xwende, rewşenbîr û nivîskar. Gelek berhemên ku bûne arşîvên ziman, wêje û çanda Kurdî, ji me re hiştine.

Nivîskar û edîbên civaka Kurdan jî mîna milletên din ên Sovyetê, berhemên xwe bi rêbaza Realîzma Sosyalîst nivîsandine. Li gor vê rêbazê, ku di salên 1930an de bûbû polîtîkaya fermî ya Sovyetê, edebîyat û hemû dîsîplînên din hêza xwe ji aborîyê distînin û hewce ye berê xwe bidin rastîyên civakî. Nivîskar û hunermendên ku vê rêbazê dipejirînin, berhemên xwe wekî amûrên pêşketina civakî dibînin, ji

nivîskar û hunermendîyê wêdetir, ruhê sîyasetmedaran hildigirin û bi hemû huner û hêza xwe pesnê Marksîzmê didin, ku ew çavkanîya şoreş û Realîzma Sosyalîst bi xwe ye. “Ê kevin” bi “ê nû” re tê berawirdkirin, tiştên nû yên ku Sosyalîzm bi xwe re tîne, tîne pesinandin. Rê û rêbazên bûrjûwazî û feodalîyê tîne lenetkirin, ji bo gundî û karkeran, ku ew çîna karker in, destan tîne nivîsandin û stran tîne xwendin. Romanên Kurdî yên ku vê demê hatine nivîsandin, tevî yên ku bûne mijara xebata me jî, li gorî vê rê û rêbazê hatine honandin. Ev, bi Erebe Şemo dest pê dike, bi Eliyê Evdîlrehman, Heciyê Cindî, Ahmedê Hepo, Sehîdê Îbo, Egîdê Xudo, Wezîrê Eşo, Ezîzê Gerdenezî, Eskerê Boyîk û Tosînê Reşîd berdewam dike.

Erebê Şemo, nivîskar û rewşenbîrê ji nifşa ewil ê vê êwrê ye. Ji destpêka êwrê heta demên herî xweş û berhemdar ên vê êwrê, bi hêzeke mezin tevdiqere, da ku civaka xwe bigihîjîne asta mîletên serdest. Romana yekem dinivîse, piştî jî sê romanên din. Romana wî ya sêyem (*Dimdim*) ne tê de, di romanên xwe yên din de (*Şivanê Kurmanca*, *Jiyana Bextewar* û *Hopo*) behsa jiyana û halê Kurdên Kavkazê, ya berî û piştî şoreşê dike. *Şivanê Kurmanca*, romaneke otobîyografîk e û her tişt berîya şoreşê diqewime. Di vê romana xwe de qala serpêhatîyên Mistoyê belengaz, ku tê qebûlkirin ew bi xwe ye, dike. *Jiyana Bextewar* û *Hopo* jî, ji bo ku halê Kurdan ê piştî şoreşê bê dîtin, hatine nivîsîn. Herçiqas bûyerên ewilîn ên di *Jiyana Bextewar* de li ser gengeşîyên serdemê bin jî, berevajîyê *Şivanê Kurmanca*, di van her du romanên de demên xweş ên piştî şoreşê jî bûne mijar. Ew demên ku wekî “Emrê Teze” hatine binavkirin. Li gor Erebe Şemo û karakterên wî yên Komunîst ên romanê, ev demên xweş bi saya Partîya Komunîst û bi saya diwana Sovyetê pêk hatine. Loma, ew her gavê minetdarê Sovyetê ne û dê bi dil û can ji bo berdewamîya wê û Komunîzê bixebitin.

Li gel Erebe Şemo, Heciyê Cindî di romana xwe *Hewarî* de, Eliyê Evdîlrehman di romana xwe *Morof* de, Egîdê Xudo di romana xwe *Dê û Demarî* de demên jiyana nû kirine mijara xwe û ketine hewla îspatkirina xweşîya wê. Ji ber vê ye, her tişt xerab û karakterên nelihev bi rojên berê yên berî şoreşê ve, yên baş û dirust jî bi erêbûna şoreşê ve girê dane. Herwiha vê wekî derfet û destkeftîyeke mezin dîtine û berhemdarê vê destkeftîyê jî Sovyet bi xwe nîşan dane, ku ew bi

têkoşîna Bolşevîkên kedkar ava bûye û li gorî wan, rê li ber wekhevî û biratîyê vekirîye.

Heciye Cindî, di beşa yekem a *Hewarîye* de, rasterast berê me dide nav ew demên “Emrê Teze” ku Kurdên Serhedê piştî ewqas salên zor û zehmet, ew li derdora çiyayê Elegezê, nêzîkê bajarê Yêrêvanê, li gundê Kûrekendê peyda kirine. Piştî salên dijwar, ew bi cî bûne, warê xwe şên û ava kirine. Şênîyên gundê Kûrekendê, êdî kar û barên xwe yên rojane dikin û bi aramî tevdigerin. Qîz û xort, dixwînin, dizewicin û tevî kêf û şahîyan dibin. Civak ji hev razî ye, şevbihêrkan li dar dixin û dibin mêvanên hev. Rojên xerab li paş mane. Helbet ev rewş ji ber xwe ve çê nebûye. Nivîskar, van dûmenan li ber me radixe da ku em li sebebên vê xweşîyê bigerin. Jixwe lehengê sereke yê romanê, ku ew vegêr e jî, vê wezîfeyê dike. Ew li gundên derdorê digere, dibe mêvanê gundîyan, mesele û çîrokên kal û pîran, ên li ser zilm û tehdeya cimetê guhdar dike. Di beşa duyem de, herwekî beşa yekem tunebe, em rasterast xwe li nav ew jiyana zor û zehmet a êl û eşîrên Serhedê dibînin. Berî Sovyetan, li vê deverê şer û pevçûn, zilm û zordarî, talan û tehdeyî, birçîtî, nexweşî, kuştin û koçberî heye. Bêguman nerazîbûna ji vê demê fikreke berbelav e, loma şoreşgerê navdar Ferîk Polatbekov, ku ew di dîrokê de jî wekî şoreşgerê Kurd ê Komunîst tê naskirin, bi jiyana xwe ya tije têkoşîn dibe lehengekî ji vê beşê.

Di *Dê û Dêmarîya Egîdê Xudo* de, wekî mekan em diçin gundekî Kurdan û wekî zeman em diçin dema şerê Êris û Almanan. Mêrên gund bi pîranî çûne şer û venegerîyane. Jin, dixebitin û bi zarên xwe re mijûl dibin. Li gund êtîmxaneyek heye û lehenga me ya sereke Karê li wir dixebite. Gundî li bendê ne ku şer bi dawî bibe û careke din vegerin demên xwe yên xweş, ew demên ku bi saya Sovyetê bûbû para wan.

Morofa Eliyê Evdilrehman, herçiqas ji alîyê weşanxaneyan ve ne wekî roman lê wekî novel hatibe pejirandin jî, bi ya me hem ji alîyê bûyersazîyê ve hem ji alîyê hejmara karakteran ve ti cudahîya wê ji romanên din ên Kurdên Sovyetê tune. Hem ji ber vê, hem jî ji ber ku çavkanîyeke girîng e di vî warê de, em ê vê berhemê jî tevî xebata xwe bikin û li gorî rê û rêbazên xebata xwe li ser bisekinin.

Morof, xortekî çê ye li devera Bidlîsê û şivantîya Xalit Begê zalim û zulimkar dike. Ji destê Xalit Begê ku hemû wesfên nebaş pê re hene, gelekî tehde û neheqîyê dibîne, lêdanê dixwe û bi kuştinê re rûbirû dimîne. Ji neçarîyê, berê xwe dide zom û zozaneke din ku li wê derê jî heman pîrsgirêk hene. Begê li wir jî, ku jê re dibêjin Selîm Beg, ne kêmtî Xalit Beg e. Ew jî her derfeta ber destê xwe, ji bo pelçiqandin û bêrêzkirina mirovên derdora xwe bi kar tîne. Berjewendîperest e û navê qencîyê nizane. Morof û hevalên xwe, wekî mirovên din ên zoma Selîm Begê, ji vî halê xwe yê belengaz û bindest ne razî ne. Her roj hinekî din zêdetir dixebitin, da ku xwe bigihînin ew welatê aram, yanî Sovyetê. Piştî ku diçin Sovyetê çîroka wan diqede û em rastî dîmenên aram û bi kêf tên. Çîrokeke din dest pê dike. Ev çîroka xwendin û evîndarîya Mehmedê lawê Silêman e. Em hîn dibin ku Silêman jî wekî Morof ji destê Romê, axa û began gelekî kişandiye û ji bêgavîyê revîyaye Sovyetê. Xeyala wî ew e ku her du zarokên wî, Mehmed û Kewser, bixwînin û bibin xizmetkarê milletê xwe. Gava em Morof û hevalên wî bînin bîra xwe, em ê bibînin ku xeyalên wan jî bi vî rengî bûn. Bi çîroka Mehmed re, em dibînin ku ev xeyal pêk hatine.

Ji bo vê xebata xwe, gava ku em li çavkanîyan digerîyan, bêguman çî romanên Kurdên Sovyetê hene, me berê xwe da wan û di çarçoveya vê xebatê de em li bersiva pirsên xwe gerîyan. Me di hinekan de bersivên xwe dîtin û di hinekan de jî nedîtin. Lê romanek heye ku li ser vê mijarê divê em hinekî behsa wê bikin. Ji ber ku ev roman nîvco maye û negihîştîye armanca xwe, em nikarin tevlî xebata xwe bikin. Ev roman, *Kurdê Rêwî* ya Sihîdê Îbo ye. Di beşa “Gotina Dawî” ya di dawîya vê romanê de em rastî vê hevokê tên; "Beşa yekê kuta bû". Dîyar e nivîskar, nîyeta pirtûka duyem kiriye û berê me daye wê. Lê ka pirtûka duyem? Wisa xuyaye pirtûka duyem qet nehatiye nivîsîn an jî hatibe nivîsîn nehatiye çapkirin û negihîştîye ber destên me. Agahîyên zêdetir em nizanin. Xana Omerxalî jî di pêşgotina vê pirtûkê de li ser vê pirsê disekine û piştrast dibe ku Sehîdê Îbo beşa duyem a vê romanê nenivîsîye. Di vê romanê de em li gundên derdora Îdirê ên di bin hukmê axa û began de digerin, çavdêrîyê li jîyan û xebatên gundîyan dikin. Gundî, ji zilm û zordarîya axa û begên milkedar bêzar in, ji kar û barên xwe yên rojane dûr ketine, loma tedarîka xwe ya reva “Sovyetê aram” dikin. Gava ku ew wext tê, bi zorê canê xwe xelas dikin û xwe digihîjînin axa Sovyetê û tam li vir pirtûk diqede. Çi dibe? Ew gundî êdî çî dikin?

Rewşa wan çawa dibe? Helbet em nizanin. Lê em dikarin texmîn bikin. Eger pirtûka duyem bihata nivîsandin, bêguman, dê Sihîdê Îbo jî wekî Erebe Şemo, çawa ku di romana *Hopo* de dike, di vê pirtûkê de li ser jiyana bextewar a van gundîyan bisekinîya. Ew jiyana ku di bin hukmê Sovyetê de bûbû warê kêfxweşî, rehetî û aramîyê. Jixwe nivîskar di beşa “Sivte” ya vê pirtûkê de nîyeta xwe di serî de eşkere dike:

*Merivekî wexta tasa ava sar ji kanîkê vexwar gotî wê tucar bîr neke. Ew kanî bona me Oktyabra azadar e. Ewê li ber me dergê emrekî teze vekirin. Ewê da destê min qelema hana, ji wê jî ev nêtana dirijine ser kaxezê.*¹

Di xebata xwe de wekî berxebat û çavkanî, me ev pênc roman hilbijartin; *Hopo* (Erebê Şemo), *Jiyana Bextewar* (Erebê Şemo), *Dê û Demarî* (Egîdê Xudo), *Morof* (Eliyê Evdilrehman) û *Hewarî* (Heciyê Cindî). Me ev roman hilbijartin, ji ber ku hem têgeha “Emrê Teze” wekî peyv di nav wan de heye, hem jî naveroka wan li dor wateya vê têgehê hatiye honandin. Ev pênc roman, dikarin romanên Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê bi rehetî temsîl bikin, ji ber ku nivîskarên wan, hem di warê nivîskarîyê de hem jî di warê ronakbîrîya Kurdên Sovyetê de kesên naskirî û xwedînav bûn û cihê wan diyar bû.

Mijar û Angaşt Xebatê

Ev xebat, bi awayekî berfireh û analîtîk, têkilîya di navbera îdeolojîya Sovyetê û Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê (1920–1991) de vedikole. Armanca wê ew e ku têgeha “Emrê Teze” bi awayekî krîtîk, di pênc romanên Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê de vekole: *Hopo* û *Jiyana Bextewar* (Erebê Şemo), *Hewarî* (Heciyê Cindî), *Dê û Demarî* (Egîdê Xudo) û *Morof* (Eliyê Evdilrehman).

Di vê xebatê de, tê angaştîkirin ku, ev berhem, bi awayekî stratejîk û bi rêbazên îdeolojîk hatine nivîsandin. Di heman demê de, hin taybetmendîyên çandî û neteweyî yên Kurdî jî di nav xwe de diparêzin. Têgeha “Emrê Teze” di vê çarçoveyê de wekî

¹ Sehîdê Îbo, *Kurdê Rêwî*, Avesta, Stenbol, 2009, r. 16.

amûrekê tê dîtin ku bi Realîzma Sosyalîst re têkildar e. Herwiha di Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê de rola wê ya taybet heye.

Xebat, li ser vekolîna bingeheên îdeolojîya Sovyetê disekine û dinirxîne bê ka çawa ev îdeolojî bandor li Edebîyata Kurdî kiriye. Piştî, li ser romanên Kurdî ên êwra Sovyetê disekine û analîz dike, bê têgeha "Emrê Teze" di van berhemên de çawa derbas dibe. Wekî mînak, di *Hopo û Jiyana Bextewar* de, Erebe Şemo projeyeke îdeolojîk ku bingeha wê Komuzîm û rêbaza wê Realîzma Sosyalîst e, çawa li ser gundekî Kurdan pêk tîne û jiyana gundîyan li ser wê ava dike û wî çawa hewl daye ku di nav çarçoveya îdeolojîyê de, hin taybetmendiyên çandî yên Kurdî biparêze. Herwiha, di *Hewarî* de rola jinan di civaka nû ya Sovyetê de çawa tê nîşandan, di *Morof* de hewla avakirina jiyaneke nû, li gel şerê bi axa û began re çawa tê vegotin û di *Dê û Dêmarî* ya Egîdê Xudo de jî, di navbera kevneşopî û modernîteyê de pevçûna çandî çawa tê çêkirin û nakokîyên nîşên nû û nîşên kevin bi çî awayî tên safîkirin. Ji ber ku xebat bi gelemperî li ser têgeha "Emrê Teze" disekine, divê em raveya vê têgehê bikin, da ku meqseda me zelaltir bibe.

Têgeha "Emrê Tezê"

Piştî Şoreşa Cotmehê, ev têgeh, ji aliyê Bolşevîkan ve wekî fikreke sereke ya guherîna civakî, li ser hemû aliyên jiyaneê tê bikaranîn. Ev têgeh, ne tenê guherînên aborî û siyasetî diheve, herwiha çandê nû, têkilîyên civakî û awayê jiyana rojane jî di nav xwe de digire. Lê hêjayê gotinê ye mirov bibêje, ev têgeh, di demên cuda de bi wateyên cuda jî hatiye bikaranîn. Di dema Sovyetê de bi wateya "jiyana nû", yanî "serdema nû" hatiye bikaranîn. Bêguman mirov dikare bingeha wê bigihêjîne fikrên Engels û Marks, ên derbarê Sosyalîzmê de lê yekem car, yê ku ev têgeh bi kar aniye, di rojnameyek bi navê "*Новая Жизнь-Novaya Zhizn*" (Nû Jîn) de, Maksim Gorki ye, ku sala çapkirina vê rojnameyê 1905-1906 e.² Ji ber ku ev rojname weşaneke fermî ya Bolşevîkan e, Gorki, li gel Lenîn, di vê rojnameyê de nêrînên xwe yên derbarê pergala heyî û jiyana nû de dinivîse.³ Tişteke din heye, ku mirov qal neke nabe; ev rojname ji aliyê Împeratoriyeê ve tê qedexekirin. Herçiqas bi heman navê, di 1917an

² <https://electro.nekrasovka.ru/books/6179694> (erişim tarihi: 17.07.2025)

³ Maxim Gorky, *Untimely Thoughts: Essays on Revolution, Culture and the Bolsheviks 1917-1918*, Translate; Herman Ermolaev, New Haven: Yale University Press, 1995, r. 45-50.

de careke din dest bi weşanê dike jî, ji ber rexneyên tund ên li dijî desthilatdarîya Bolşevîkan, vê carê ji alîyê Lenîn û Bolşevîkan ve tê girtin.⁴ Di vê rojnameyê de jî Gorkî dibêje jiyanê nû mimkun e tenê bi veguherîna çandî çê bibe.⁵ Lenîn jî, wê demê li ser vê fikrê bû ku, li gorî wî, divê dinyaya kevn bê hilweşandin û dinyayeke nû (jiyanêke nû) bê avakirin. Nivîs û axaftinên wî, bi temamî li ser vê bingehe bûn.⁶

Bolşevîk, têgeha “Emre Teze” mîna sloganekî netewî bi kar tînin û li hemû qadên jiyanê, ji bo rakirina kapîtalîzmê û avakirina civaka sosyalîst reng didin. Di nîgar, helbest, edebîyat, sînema û belgîyên partîyê de bi cih dikin. Ev têgeh, ji bo Bolşevîkan pir giring bû. Lewra ev ne tenê slogan bû, projeyeke endezyarîya civakî bû. Armancên ji vê projeyê ev bûn: Rakirina bermahiyên Çarîzmê, Afirandina mirovê Sosyalîst (Homo Sovieticus) û şoreşa çandî.⁷

Louis Althusser, ku teorîsyenekî Marksîst e û derbarê têkilîya dewlet û kesayetê de bal dikêşe ser rola amûrên îdeolojîk ên dewletê (dibistan, medya, dîn, malbat û wd.), diyar dike ku îdeolojî, kesayetan wekî sêbjê dibîne.⁸ Li gor vê nêrînê, em dibînin ku ji bo jiyanê nû, Bolşevîk, bi rêya medya, huner û perwerdehîyê, hewl didin ku kesayetan wekî “sêbjeyên sosyalîst” nîşan bikin ku ew divê bi nîrxên kolektîf û antî kapîtalîst ve girêdayî bin.

Antonio Gramsci, ku di warê îdeolojîya Marksîst de bi fikrên xwe yên “serwerîya çandî” tê nasîn, di wê bawerîyê de ye ku jiyanê nû ya sosyalîst ne tenê guhertineke aborî an jî sîyasî ye, ew guhertineke kûr a çandî û rewşenbîrîyê ye jî. Loma, çîna karker divê serwerîyeke çandî ava bike, da ku civak bi awayekî xwezayî nîrxên sosyalîzmê qebûl bike. Pêvajoyeke wiha jî, bi rêya sazîyên çandî, perwerdehîyê û rewşenbîran pêk tê. Gramsci tekez dike ku serdestî, berîya

⁴ Ji bo arşîva rojnameya *Новая Жизнь-Novaya Zhizn* (Menshevik) 1917-1918: https://nlr.ru/res/inv/ukazat55/record_full.php?record_ID=126741 (erişim tarihi: 17.07.2025)

⁵ Maxim Gorky, h.b., r. 72.

⁶⁶ V. I. Lenin, *Ekim Devrimi Dosyası*, Çeviren; Kenan Somer, Sol Yayınları, Ankara, 1999, r. 37-41.

⁷ Stephen Kotkin, *Magnetic Mountain: Stalinism as a Civilization*, University of California Press, 1995, r. 89-92.

⁸ Louis Althusser, *Lenin and Philosophy and Other Essays*, Monthly Review Press, New York and London, 1971, r. 12.

bidestxistina desthilatdarîyê, bi “rêberîya rewşenbîrî û exlaqî” tê bidestxistin, ku ev yek ji bo afirandina civakeke sosyalîst girîng e.⁹

Di serdema Sovyetê de, yek ji teorîsyenên sereke yê şoreşa jinan, Aleksandra Kollontai, têgeha “Emrê Teze” bi azadîya jinan û şikandina qalibên kevneperest ve girê dide. Li gor wê, divê di “Emrê Teze” de, yanî di jiyana nû de, jin ji bin desthilata mêr derkevin û qedexeyên civakî red bikin, da ku karibin di warê aborîya sosyalîst de aktif bin.¹⁰

Ji bo bicihkirina ramana vê têgehê, diwana Sovyetê gelek şêwazên hunerî û çandî bi kar anî. Posterên propagandayê, yê mîna slogana “xera bike jiyana kevn, ava bike jiyana nû!” hatin belavkirin.¹¹

Herçiqas di serdema Lenîn de, têgeha "Emrê Teze" temsîleke dinamik a guherînê be jî, di dema Stalîn de, ev têgeh rengê formulên burokratîk digre û ji temsîla şoreşa çandî û civakî ya radikâl, vediguhere amûreke parastinê ya partîyekê.¹² Di rêbaz û şêwaza hunerê de jî, Realîzma Sosyalîst dibe qaîdeya fermî û her tişt divê li gor dilê partîyê bê kirin. Bi vî rengî, "Emrê Teze" ku di destpêkê de xeyala avakirina jiyaneke xweş bû, di dawîyê de dibe amûrek ji bo zextê û standardîzasyonê. Bi gotineke din, dibe pergaleke mekanîk a kontrolkirinê. Sheila Fitzpatrick, ku ew diroknas û pisporê Yekîtiya Sovyetan e, derbarê vê veguherînê de wiha gotiye:

*Mirovê nû yê Sovyetê ji dayîk nebû; ew, bi rêya şêwe, pîvan û çavdêrîyên bêdawî hate afirandin.*¹³

Di Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê de, têgeha “Emrê Teze” bi awayê temsîla guherînê û pêkanîna pergala sosyalîzmê pir caran derdikeve pêşîya me. Bêguman ne

⁹ Antonio Gramsci, *Selections from the Prison Notebooks*, translate by Quintin Hoare û Geoffrey Nowell Smith, International Publishers, New York, 1971, r. 57.

¹⁰ Alexandra Kollontai, *The Autobiography of a Sexually Emancipated Communist Woman*, Foreword by Germaine Greer, Herder and Herder, 1971. R. 30-35.

¹¹ Victoria E. Bonnell, *Iconography of Power: Soviet Political Posters under Lenin and Stalin*, University of California Press, 1997. R. 67-70.

¹² Orlando Figes, *A People's Tragedy: The Russian Revolution 1891–1924*, Penguin Books, London, 1996, r. 521-523.

¹³ Sheila Fitzpatrick, *Everyday Stalinism: Ordinary Life in Extraordinary Times Soviet Russia in The 1930s*, Oxford University Press, Inc, 1999, r. 54.

tenê guherîn, lê hêvîyên ji bo siberojê xweştir, avakirina cihaneke nû û civakeke adil, azad û wekhev jî di hewînê. Herwiha, ew wekî metaforeke têkoşînê jî tê dîtin, ku tê de çîna karker û gundî, bi awayekî kollektîf, li hemberî zordestîya feodalîzm û kapîtalîzmê serî hil didin. Rizgarbûna ji zincîrên kevneperestî, nezani û koletîyê û vekirina derîyê zanist û ronahîyê, pêvajoyên misoger ên vê demê ne. Dibistanên nû, nexweşxaneyên modern, kolxoz û sovxozên ku bi keda kollektîf hatine avakirin, temsîlên berbiçav ên vê jiyana nû ne. Di vê jiyana nû de, bêguman şertê sereke yê serkeftinê, têkoşîna li dijî bermahîyên berî şoreşê ye. Lehengên vê têkoşînê, bi gelemperî, bi perwerdehî û hişmendîya sosyalîzmê hatine kemilandin û ji bo silametîya Sosyalîzmê rastî azmûnên giran ên fedakarîyê tên. Ew, ne tenê sembola îdealên şoreşê ne, herwiha ew parêzerên dilsoz ên “Emrê Teze” ne. Naxwe, di Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê de, wekî mînaka van lehengan em dikarin navê Sehîd (*Jiyana Bextewar*), Hesên û Zînê (*Hopo*), Morof û Mehmed (*Morof*), Sîsê û Îsko (*Dê û Dêmarî*) û çend kesên din bidin, ku nivîskarên van berhemên, berhemên xwe li ser bingeha fikra “Emrê Teze” nivîsîne.

Li nav Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê, ên ku bi awayekî sistematîk li ser têgeha “Emrê Teze” sekinîne û li ser vê bingehê roman nivîsîne, herwiha romanên wan bûna mijara vê xebatê Erebe Şemo, Egîdê Xudo, Eliyê Evdilrehman û Heciyê Cindî ne. Ligel wan, divê em behsa du berhemên din jî bikin ku li ser vê fikrê hatine nivîsîn û ji ber vê nav jî girtine, lê ji ber ku ne roman in, me ew nexistine navê xebatê. Yek, *Ber Bi Emrê Teze* ye, ku ev pirtûkeke xwendin û hînkirina Kurmancî ye. Di 1931ê de ji aliyê R. Drambjani ve hatiye nivîsandin û li Yerêvanê hatiye çapkirin. Ya din, rojnameya *Rya Teze* ye, ku ew jî di 1930ê de bi awayekî fermî dest bi weşanê dike û li gor polîtîkayên Sovyetê, herwiha li gor fikra têgeha “Emrê Tezê” berdewam dike.

Mebest (Armanç) û Giringîya Xebatê

Giringîya vê xebatê bi çend alîyan e. Pêşî, ev lêkolîn qeydeke dîrokî ye, ji ber ku Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê şahidê guherîna civakî ye: ji koçberîyê û adaptasyona Kurdan heta pêşxistina wan a çandî, zimanî û aborî di bin serdestîya Sovyetê de. Ya din, herçend berhemên Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê di bin bandora îdeolojîyek de hatibin nivîsandin jî, bêguman ji bo ziman û folklorê Kurdî

arşîveke giring in. Wekî din, ev xebat dikare bibe çavkanîyeke akademîk bo lêkolînên li ser Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê. Herwiha, ew dikare bibe mînak ji bo têkilîya çand û sîyasetê û rola edebîyatê di avakirina civakan de. Em hêvî dikin ku encamên vê lêkolînê bibin bingeş ji bo lêkolînên siberojê yê derbarê Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê de û bibin alîkar ji bo vekolînên kûrtir ên mîrasya edebî ya Kurdên Sovyetê.

Çarçove, Sînor, Rê û Rêbazên Xebatê

Di vê lêkolînê de, rêbazên analîza naverokê û berawirdê hatin bikaranîn. Romanên Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê bi hûrgilî hatin xwendin û têgeha “Emrê Teze” di van berhemên de hate naskirin. Hate lêkolînkirin ku ev têgeh çawa hatiye pêşvekirin û pêşveşkirin û her weha têkilîya karakterên van romanên bi vê têgehê re çî ye. Dûv re, analîzeke berawirdê hate kirin û cudahî û wekhevîyên di awayê şîrovekirina vê têgehê de, di nav romanên cuda de hatin ronîkirin. Herwiha nîrxandîneke dîrokî-civakî jî hate kirin, da ku çarçoveya sîyasî û civakî ya dema Sovyetê bê diyarkirin û bandora wê li ser afirandina van berhemên bê fêmkirin.

Bêguman di pêkanîna vê xebatê de hin astengî û kêmasî jî hene. Yek ji wan bîdestxistina çavkanîyên orjînal e. Ji ber ku gelek sal di ser re derbas bûne, roman û berhemên din ên ji dema Sovyetê kêmtir peyda dibin an jî tenê li hin arşîv û pirtûkxaneyên taybet hene. Herwiha, divê em bînin ziman, eger me ev berhemên orjînal bi dest jî bixistana, astengîyeke din li pêşîya me hebû: ew jî alfabeya Kirîlî bû. Digel vê yekê, piranîya çavkanîyên derheqê vê serdemê de bi zimanê Rûsî an jî Ermenî ne. Ev jî bû sedem ku pêvajoya lêkolînê diwartir bibe. Di vî warê de eger em berê xwe bidin lêkolînên akademîk ên guncaw, em ê navê çend kesan bibînin; Remezan Alan, Zülküf Ergün, Mehmet Yıldırımçakar, Zahir Ertekin, Güneş Kan (2016), Betül Çoban (2017) û Bahar Enç (2024).

Betül Çoban, di 2017an de, teza xwe ya mastîrê bi navê *Şopên Realîzma Sosyalîst di Romanên Kurdî yê Sovyeta Berê de*, li ser Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê amade kiriye. Di vê tezê de, bandora Realîzma Sosyalîst li ser romanên Kurdî yê ku di serdema Sovyetê de hatine nivîsandin, lêkolîn dike. Tez, balê dikişîne ser teorîya Realîzma Sosyalîst ku di naverokê û şewaza romanên Kurdî yê

serdema Sovyetê de çawa cih girtiye. Analîza vê dike, ku nivîskarên Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê, realîteya civakî, di çarçoveya Realîzma Sosyalîst de çawa nîşan dane û ji bo ku di nav sînoren îdeolojîk de dengê xwe bidin bihîstin çî kirine. Ev tez, ji bo ku bê têgihiştin, Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê di bin şert û mercên siyasî yê taybet de çawa bi pêş ketiye, girîng e.¹⁴

Güneş Kan, teza xwe ya mastirê bi navê *Îmaja Ermenî di Romanên Kurdî yê Sovyeta Berê de*, di 2016an de, li ser Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê amade kiriye. Di teza xwe de, têkilîyên Kurd û Ermenan û îmaja Ermenan di romanên Kurdî yê Sovyetê de analîz dike. Xebat, bi taybetî li ser vê yekê rawestiyaye ku di van romanên de karakter û civaka Ermen çawa hatine teswîrkirin û ev teswîr bi faktorên dîrokî, çandî û îdeolojîk ve çawa hatine girêdan.¹⁵

Bahar Enç, teza xwe ya mastirê bi navê *Edebîyata Kurdî ya Zarokan di Serdema Kafkasyayê de*, di 2024an de, amade kiriye. Têkilîya vê tezê jî bi Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê re heye. Di tezê de, di nav çarçoveya Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê de, bi taybetî li ser pêşketinên edebîyata zarokan, pirtûkên perwerdehîyê, helbest û çîrokên ku ji bo zarokan hatine nivîsandin û wergerandin, disekine. Herwiha tez, kurtedîroka êwra Sovyetê û xebatên edebîyata zarokan ên ku li wir hatine kirin analîz dike.¹⁶

Ev her sê xebat û xebatên din ên li ser Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê, herçiqas li dor sebeb û encamên bandora Realîzma Sosyalîst ya li ser vê edebîyatê, diçin û tînin jî, di hêla danasîn û ravekirina têgeha “Emrê Teze” de, ku ew bingeha fikrî ya Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê ye, kêr dimînin. Giringî û cudahîya vê xebatê, ji ên berîya xwe, yek jê ew e ku vê valahîyê dadigire.

Plana Xebatê: Danasîna Beşên Xebatê

Xebat, ji xeynî destpêk û encamê, ji du beşan pêk tê. Beşa yekem li ser Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê û konteksta wê ya dîrokî disekine. Di vê çarçoveyê

¹⁴ Betül Çoban, *Şopên Realîzma Sosyalîst di Romanên Kurdî yê Sovyeta Berê de*, Teza Lîsansa Bilind a Zanîngeha Mardin Artûklûyê, 2017.

¹⁵ Güneş Kan, *Îmaja Ermenî di Romanên Kurdî yê Sovyeta Berê de*, Teza Lîsansa Bilind a Zanîngeha Mardin Artûklûyê, 2016.

¹⁶ Bahar Enç, *Edebîyata Kurdî ya Zarokan di Serdema Kafkasyayê de*, Teza Lîsansa Bilind a Zanîngeha Bîngolê, 2024.

de, dîroka Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê û tesîra Şoreşa Cotmehê li ser çanda Kurdan tê nirxandin. Herwiha di vê beşê de li ser teorîya Realîzma Sosyalîst û têkilîya wê ya bi Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê re tê sekinîn. Minetdarîya li hemberî Sovyetan ya ku di Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê de tê dîtin, tê nirxandin.

Di beşa duyem de, romanên *Hopo* û *Jiyana Bextewar* (Erebê Şemo), *Dê û Demarî* (Egîdê Xudo), *Morof* (Eliyê Evdilrehman) û *Hewarî* (Heciyê Cindî), di çarçoveya têgeha “Emrê Teze” de, bi hûrgulî tên analîzkirin. Li ser awayê ku têgeha “Emrê Teze” di van romanên de hatiye şîrovekirin, tê sekinandin û têkilîya vê têgehê bi sê taybetmendîyên sereke re tê nirxandin: perwerde û zanist, pêşveçûnên aborî, û guherîna çandî. Herwiha di vê beşê de, analîza vê tespîtê tê kirin ku ev roman ne tenê bûyerên dîrokî hewandine, bi awayekî çalak, xizmeta modela civaka îdeal ya Sovyetê kirine. Berdewam, di vê beşê de, bandor û mîrasiya vê edebîyatê tê nirxandin. Tesîra vê edebîyatê li ser nifşên nû û cihê wê di dîroka Edebîyata Kurdî de tê vekolîn.

Di encama xebatê de, hat bidestxistin ku têgeha “Emrê Teze” di romanên Kurdî yên Sovyetê de bi pêşveçûnên aborî, zanistî, hunerî û teknolojik ve tê temsîlkirin. Di encamê de tê destnîşankirin ku ev têgeh ne tenê guherîneke dîrokî bû, herwiha projeyeke îdeolojîk bû ku diviyabû bi edebîyatê were normalîzekirin.

BEŞA YEKEM

1. HEBÛNA KURDAN A LI KAVKAZÊ, KUNYEYA EDEBÎYATA KURDÎ YA ÊWRA SOVYETÊ Û REALÎZMA SOSYALÎST

1.1. Civaka Kurdên Li Kavkazê, Berîya Sedsala 20an

Hebûna Kurdan a li Kavkazê digihîje serdemên kevnar. Wekî dîrok rasterast nayê zanîn Kurd cara pêşîn çi wextî çûne li wir, lê bermahî û şûnwarên li herêmê bi me didin zanîn ku ev demeke dirêj e ew di navbera çemê Aras û Kûrayê de niştecih in. Pêşîyên Kurdan ji Mezopotamya û Îranê xwe gîhandine li vir û di avabûna dewletan de bûne xwedî rol.¹⁷ Di nav 2 hezar salên B.Z. de, milletên ku ji alîyê dîroknasan ve wekî proto-Kurd tên binavkirin, heta van deran hatine.¹⁸ Ji van deman heta sedsalên 10. û 11. mîrektîyên wekî Şeddadî û Rewadîyan tên avakirin.¹⁹ Ji van mîrektîyan Şeddadî, heta demekê li herêma xwe gelekî bi hêz dibin û di encama şer û pevçûnên li gel Ermen, Gurc, Oxûz û Bîzansîyan de axa xwe firehtir dikan.²⁰

Di sedsalên 18. û 19. de, şerên navbera Osmanî, Îranî û Rûsan, dibin sebeb ku gelek Kurdên Serhed û Kavkazê cihên xwe biguherînin. Vê demê hejmareke zêde ji Kurdên Serhedê, li herêma Kavkazê bi cih dibin, ku ew bi piranî wekî Kurdên Şemsedînov tên naskirin. Ew di serî de niştecihên devera Serhedê ne, lê ji ber şer û pevçûnan berê xwe didin Kavkazê, heta hinek ji wan digihîjin gund û bajarên Împeratoriya Rûsyayê jî û li wir bi cih dibin.²¹ Împeratoriya Rûsyayê bi hêza wan dihesê, bi hinek îmtîyazan, wan li kêleka xwe tevî şerê Osmanîyan dike.²² Bi vê tevgerê, Osmanî jî li hemberî Rûs û Ermenan alayên Hemîdîye ava dikan, ku ew bi gelemperî ji serok û eşîrên Kurdên Misilman ên Sunnî pêk tên. Kurdên Êzîdî yên li devera Serhedê, digel Ermenên li wir rastî tehde û talanê tên. Gelek jê, ji ber zilm û

¹⁷ Hejarê Şamil, *Diaspora Kürtleri*, Pêrî, İstanbul, 2005. s. 23.

¹⁸ İsmet Konak, *Sosyalist Kürtler*, Nûbihar, İstanbul, 2022, s. 17.

¹⁹ Ezîzê Zîyo Bedîrxan, *Kızıl Kürdistan*, çev. Hejarê Şamil, Dara, İstanbul, 2022, s. 17.

²⁰ Nevzat Keleş, *Şeddadiler(951-1199) Orta Çağda Bir Kürt Hanedanı*, Bilge Kültür Sanat, İstanbul, 2016, s. 83.

²¹ Özkan Öztaş, *Sovyetler Birliği'nde Kürt Sanatı*, Yazılama, İstanbul, 2016, r.12.

²² Rohat Alakom, "Kürt-Rus İlişkileri Tarihinden Şemsedînov Kürtleri", *Kürt Tarihi*, s. 1, İstanbul, 2012, s. 30.

zordarîyê koçber dibin, dikevin rêyan, berê xwe didin Ermenîstan û Gurcîstanê.²³ Ew ji bajar, gund û zozanên xwe dûr dikevin, mal û milk û dewarên wan talan dibin.²⁴ Di şerê mezin ê Rûs û Osmanîyan de (1877-1878), ku ev şer ji ber sala 1293 ya Rûmî wekî şerê 93yan tê binavkirin, gelekî Kurd bê mal û milk dimînin. Xela radibe, nexweşîyên girseyî çê dibin, talan, neheqî, bêduzenî zêde dibe. Ji ber bacên giran ên dewletê, gel feqîrtir û hejartir dibe.²⁵

Bêguman, berî şerên Osmanî û Rûsan, Kurd jixwe li Kavkazê hene. Hinek ji wan jî Kurdên Îranê ne ku ew li devera Xorosanê, ji alîyê şahên Îranê Şah Ebbas û Şah Nadir ve di sedsalên 17. û 18. de li ser sînorê Tirkmenîstanê hatine bicihkirin. Sedema bicihkirina wan ew e; da ku êrîşên Rûs, Ozbek û Qazaxan, ên li ser sînorê Îranê bişkînin.²⁶ Ya rast Kurdên vê deverê divê em wekî Kurdên Kavkazê nehesibînin, ji ber ku, ji xeynî hejmareke kêr, Kurdên Xorosanê her tim di bin hukmê Îranê de bûne û têkilîya wan bi Rûsan re, çi Împeratoriya Rûsyayê çi jî Rûsyaya Sovyet, zêde çê nebûye. Jixwe devera Xorosanê jî, ji alîyê erdnîgarîyê ve ne nêzîkê Kavkaz e. Helbet me belasebeb behsa wan nekir. Di şerên Îran û Rûsyayê de Kurdên Xorosanê jî cih digrin û hinek ji wan di nav çend salan de li Kavkazê bi cih dibin.

Li gorî lêkolînan, berî ku şerê yekem ê cîhanê dest pê bike, hejmara Kurdan a li Kavkazê digihîje 500.000 kesî, ku ji nîvî zêdetirê wan li Azerbaycan û Ermenîstanê ne. Herwisa divê em bi bîr bixin, Êzîdîyên li Ermenîstanê ji neteweya xwe bêtir, bi dînê xwe dihatin binavkirin. Yanî li gorî dewleta Ermenîstanê ew ne Kurd lê Êzîdî bûn û ji Kurdan (ên Misilman) cuda bûn.²⁷

Li gel alozî û tevgerên tund ên dewletên herêmê, axa û derebegên ji civakê jî, tehde û zilma li ser xelkê ji xwe re kiribûn wezîfe. Nexasim ên li herêma Serhedê, bi piştgirîya rêvebiran dest didan ser erdên gundîyan, pez û dewarên koçeran talan dikirin, jin û qîzên xelkê direvandin, zar û zêçên derdorê kom dikirin, dibirin şer. Ên

²³ Öztaş, h.b., r. 15.

²⁴ Mehmet Gültekin, “Kurdên Qafqasyaya Başûr”, *Nûbihar*, j. 126 (jimara taybet), Zivistan, Istanbul, 2014, r. 21- 22.

²⁵ Konak, h.b., r. 47.

²⁶ Şamil, h.b., r. 15.

²⁷ David McDowall, *Modern Kürt Tarihi*, Doruk, İstanbul, 2004, s. 642.

ku derfet bi xwe re didîtin, ji ber vê zilm û zordarîyê direvîyan, berê xwe didan Kavkazê, ji ber ku wê demê Kavkaz di bin hukmê Împeretoriya Rûsyayê de bû.²⁸ Helbet gengeşî, şer û pevçûnên li devera Kavkazê jî ne kêr bûn lê qet nebe Împeretoriya Rûsyayê, wekî Împeretoriya Osmanî tune kirina Kurdên Êzîdî nekiribû armanca xwe ya sereke.

Di van salan de, Kurdên devera Serhedê bi piranî bê kar, bê sewal, bê erd û bê xwedî ne. Piraniya wan xulamî, şivantî, gavantî û bêdervaniya axa, beg û şêxan dikin. Hinek jê bi rojheqa xwe, di karên zor û zehmet de dixebitin.²⁹ Heman rewş jî bo Kurdên li welatên Kavkazê jî heye. Li gorî lêkolînerê Sovyetan A. B. Bukşpan, beriya pergala Sosyalîzmê, Kurdên Azerbaycanê di navbera hovîtî û şaristanîyê de dijiyan.³⁰

Gelek Kurdên ku niştecihê Ermenîstan û Gurcîstanê bûn, dîsa bê kar, bê erd û bê sewal bûn. Ên ku li bajaran diman hemalî, nobedarî û dergevanîya derdorê dikirin. Hinekan bazirganî dikir. Ên li gundan jî, eger hebûya bi heywan û erdên xwe re, tunebûya, bi xulamî û rênçberîya dewlemendan debara xwe dikirin.³¹

1.2. Di Sedsala 20an de Hebûna Kurdan li Kavkazê û Îmkanên ku bi Dest Ketin

Eger em berê xwe bidinê, em ê bibînin ku di navbera Osmanî û Rûsan de pir şer çê bûne. Herî dawî, di destpêka sedsala 20an de, li herêma Serhed û Kavkazê tîn hemberî hev û bi salan şer dikin. Her du alî jî bi piranî ji Kurd û Ermenan pêk tîn, ku ji bo serwerîya van her du dewletan bi hev dikevin. Piştî şoreşa Bolşevîkan, Yekîtiya Sovyetan tê damezrandin. Bi polîtîkayên nû, Kurdên Kavkazê derfetên çandî û hunerî bi dest dixin. Dibistanên Kurdî tîn vekirin û berhemên edebî tîn nivîsandin. Lê di dema hikumeta Stalîn de, sîyaseta tundiyê tê kirin, destkeftiyên miletan ên çandî û hunerî tîne rakirin, rewşenbîrên Kurdan tîn sirgûn kirin an jî qetilkirin.³² Piştî

²⁸ Eskerê Boyîk, *Çanda Kurdên Sovêtê*, Peywend, Istanbul, 2019, r. 14.

²⁹ Konak, h.b., r. 66.

³⁰ A. B. Bukşpan, *Azerbaycan Kürtleri*, çev. Hejarê Şamil, Peri Yayınları, İstanbul, 2007, s. 33.

³¹ Konak, h.b., r. 69.

³² Müslîh Sezer, "Destpêka Romana Kurdî; Panoramaya Romana Êwra Kavkazê (1935-1991)", Edîtor; M. Zahir Ertekin-Mehmet Yıldırımçakar, *Destpêka Romana Kurdî*, Peywend, Van, 2020, r. 25.

Stalîn, derfetên nû çê dibin û Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê dikeve qonaxeke rengîn û berhemdar.

1.2.1. Rûdanên şerê cihanê yê yekem li serhedê û kavkazê

Di şerê cihanê yê yekem de Osmanî li gel Alman û Macaran, Rûs jî li gel Îngilîz, Frensî û Yewnanan ketibûn şer. Osmanî û Rûs, Ji Serhedê heta Kavkazê hev dibirin û dianîn. Jixwe berê jî li vê herêmê şerê wan hebû. Rûs heta Qers, Erdêxan, Erzirom û Erzinganê hatibûn, van devaran bi dest xistibûn.³³ Leşkerên Osmanî, bi piranî Kurdên herêmê bûn, ên Rûsan jî bi piranî dîsa Kurd û Ermenên vê herêmê bûn. Yanî li her du alîyan jî Kurd hebûn û ji bo serwerîya van dewletan li herêmê, bi hev re şer dikirin.³⁴ Ev şerên dirêj bi xwe re tehde, feqîrî û neçarîyê tîne. Bi sed hezaran malbat ji Serhedê direvin, berê xwe didin Kavkazê, deverên aramtir. Ji ber ku Împeratoriya Rûsyayê, wan, wekî leşkerên xwe yên siberojê dibîne, hatina wan dipejirîne, rê li ber wan vedike û cî dide wan.³⁵

Ji ber şer û aloziyên wê demê, îmkanên pêşketinê çê nebûbûn li nav gel. Jiyana koçerî û gundîtîyê jî asteng bû li ber vê. Ronakbîr û rewşenbîrên Kurdan pir kêmtir, hema bêje qet tunebûn.³⁶ Di navbera salên 1900-1904ê de ji alîyê Împeratoriya Rûsyayê ve sê dibistan ji bo Kurdan tên vekirin. Lê tev jî bi zimanê Rûsî ne. Jixwe zêde jî vekirî namînin, ji ber tevger û aloziyên navxweyî.³⁷ Ji bilî van her sê dibistanan, ji alîyê edebî, hunerî û kulturî ve gaveke din nehatibû avêtin.

Di şerê yekem ê cihanê de, herçiqas zîyaneke mezin li herêma Serhed û Kavkazê çê bûbe jî, ji ber tevger û bûyerên navxweyî yên Rûsyayê, şerê Osmanî û Rûsan zêde berdewam nake. Heta em dikarin bêjin, ev dibe şerê dawîn ê Tirk û Rûsan. Piştî şoreşa Bolşevîkan, Rûs, ji Serhedê vedikişin û bi peymana Brest-Litovsk bajarên wekî Erdêxan, Qers, Artvîn û Batûmê ji Osmanîyan re dihêlin.³⁸ Lê aloziyên li deverê heta çend salên din jî bi dawî nabin, Gurc û Ermen, şerê xwe yê bi

³³ Herman Taels, *Eski Sovyetler Birliği'nde Kürtler*, çev. Nadire Işık, Pêrî, İstanbul, 2001. s. 42.

³⁴ Taels, h.b., r.42.

³⁵ Taels, h.b., r.43.

³⁶ Cristine Allison û Philip Kreyenbroek, *Kürt Kimliği ve Kültürü*, Avesta, İstanbul, 2008, s. 112.

³⁷ Boyîk, h.b., r.14.

³⁸ Muhammed Emin Zeki Beg, *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*, Nûbihar, İstanbul, 2010, s. 37.

Osmanîyan re didomînin. Şer û pevçûnên dirêj gelên herêmê bêzar dîkin. Bi piranî Kurdên Êzîdî rastî tehdeyên giran tên. Bi milyonan însan dimrin an jî cî diguherin.

1.2.2. Avabûna yekîtiya sovyetan û tesîra wê li ser kurdên kavkazê

Împeratoriya Rûsyayê, gava ku dikeve şerê dinyayê yê yekem, Împerator Nikolayê II. li ser text e. Rewşa hilberîn û aboriya dewletê ne baş e, di warê teknoloji û sanayîyê de li paş maye. Şerên dirêj ên bi salan, barê gel girantir dike, feqîrî û hejarî belavtir dibe. Zext û tehdeyên çîna serdest û milkedar (Bûrjûva), ên li ser karker û gundîyan (Proleterya) zêdetir dibin. Bi van sedeman, tevgerên guherînê dest pê dîkin. Karker, gundî û her kesê ku xwe bindest didît nerazîbûnên xwe eşkere dîkin, dest bi çalakîyan dîkin, li hemberî bûrjûvazîyê, di bin serwerîya V. Lenin de şer dîkin. Ev tevgerên ku di dawîya sedsala 19an de dest pê dîkin, di Cotmeha 1917an de bi serkeftina Lenîn û Bolşevîkan bi dawî dibe.³⁹ Du kes hene di nav tevgerên vê demê de, ku ew ji bo me girîng in. Wan li ser navê Kurdan, di şerê azadîya kedkaran de barên giran hilgirtine ser milê xwe. Yek ji wan Fyodor Agitoviç Litkin e, bi navê xwe yê din Ferîk Polatbekov e. Ew, di dema Şoreşê de li hemberî Împeratoriye sekîniye û li Sîbîryayê piştgirîya Bolşevîkan kiriye, paşê li ser vê rêyê hatiye kuştin.⁴⁰ Gelek helbestên wî yên li ser Şoreşê hene.⁴¹ Yê din jî edîp û nivîskarê navdar Erebe Şemo bi xwe ye, ku wî jî di Şoreşa Sovyetê de rasterast cih girtiye. Erebe Şemo, li malbateke feqîr hatiye dinyayê û bêkes bûye. Wextê Şoreşê di temenê xwe yê ciwan de ye û li gundên devera Qersê, fikra Komunîzmê belav dike. Piştî Şoreşê jî nasekine, di avakirina civaka nû de, hem bi tevgerên xwe hem bi qelesa xwe, alîkarîyên mezin dike.⁴²

Ji ber tevger û şerên navxweyî, Împeratoriya Rûsyayê, ji şerê dinyayê yê yekem vedikişê. Bi navê Yekîtiya Komarên Sovyet a Sosyalîst, dewleta Rûsyayê ji nû ve tê avakirin û dîzaynkirin. Ev şoreşa mezin, tesîrê li hemû derdora xwe dike. Desthilatdarîya nû, bi artêşa xwe ya bi navê “Artêşa Sor”, ku di dema împeratoriye

³⁹ İsmet Konak, “Mustafa Suphi’nin Rusya İç Savaşındaki Rolü”, *Ayrıntı Dergi*, s. 23, Ekim- Kasım 2017, s. 40-43.

⁴⁰ Rohat Alakom, Candan Badem “Karşı Bir Kürdün Digor’dan Sibirya’ya Uzanan Öyküsü”, *Kürt Tarihi*, s. 3, İstanbul, 2012, s. 10-17.

⁴¹ İsmet Konak, “1917 Ekim Devrimi’nde Kürtler”, *Kürt Tarihi*, s. 30, İstanbul, 2017, s. 4-7.

⁴² Rohat Alakom, *Çokkültürlülük Işığında Kars Kürtleri*, Avesta, İstanbul, 2009, s. 423.

de navê artêşê “Artêşa Spî” bû, careke din, di Adara 1921ê de, berê xwe dide Kavkazê û li herêmeke berfireh (Gurcîstan, Azerbaycan, Ermenîstan...) belav dibe.⁴³

Ev pergala nû, ku ji yekîtiya komaran pêk dihat, fikra “biratî” û “azadîya gelan” ji xwe re dike binaxe (binyad), ku binaxeya vê fikrê jî prensîba şoreşa Fransayê bû. Rê li ber vê vedibe, ku her netewe karibe bi temsîliyeta xwe, di nav vê yekîtiyê de îdara xwe bike.⁴⁴ Polîtîkaya ku wekî “herêmparêzî” jî dihat binavkirin, entegrasyoneke nerm çê dike di navbera pergala Sovyet û gelên kêmar ên Sovyetê de.⁴⁵ Wekî milletên din, Kurdên Kavkazê jî, vê wekî derfeteke mezin dibînin.⁴⁶ Li herêma Kurdan, ku ev herêm di navbera Azerbaycan û Ermenîstanê de bû, bi piştgirî û pêşniyazên V. Lenîn, di 16ê Tîrmeha 1923an de, ji aliyê Partîya Komunîst a Azerbaycanê, bi navê “Kurdîstana Sor” herêmek tê avakirin.⁴⁷ Rêveberîya vê herême dikeve destê Kurdan û herçiqas kêr be jî, çend gavên çandî û edebî tînin avêtin. Dibistanên ku perwerdeya Kurdî didin, vedibin û ji bo nivîsîna Kurdî xebat tînin kirin. Di salên 30î de, polîtîkaya “herêmparêzî” û fikrên mîna “wekhevî” û “azadîya gelan”, tînin terkkirin. Stalînê ku her roj hinekî din otorîtertir û hişktir dibe, ji bo ku serdestîya xwe bide berdeewamkirin, li hundir û derve, polîtîkayên tund dide destpêkirin. Asîmîlasyon û Rûsperestî dibin fikrên sereke.⁴⁸ Vê demê statuya Kurdîstana Sor, Bi sedemên cuda lê bi piranî ji ber têkilîyên bi Tîrkîyeyê re, di 1929an de, Bi erêkirina Sovyetan û bi mudaxaleya rasterast a Azerbaycanê, bi biryarnameyekê bi dawî dibe.⁴⁹ Li Azerbaycanê, sansura li ser Kurdan zêdetir dibe, peyva “Kurd” bi xwe jî tê qedexekirin. Li ser nasnameya Kurdan ku berê “Kurd” dihat nivîsandin, ji ber qedexeyan, êdî wekî “Azerbaycanî” tê nivîsandin.⁵⁰ Vê demê, Kurd ji aliyê rêvebirîya Stalîn ve wekî milletê “neewle û pênebawer” tînin destnîşankirin. Edîb û rûsipîyên Kurdan, digel gelekî Kurdên din tînin girtin,

⁴³ Taels, h.b., r. 42.

⁴⁴ Hüseyin Can, *Sosyalist Sovyetler Birliği'nde Kürtler*, Pêrî, İstanbul, 2005, s. 11-13.

⁴⁵ Konak, *Sosyalist Kürtler*, s. 151.

⁴⁶ İsmet Konak, “Kürt Tarihinde Bir Özerklik Modeli: KIZIL KÜRDİSTAN”, *Kürt Tarihi*, s. 14, İstanbul, 2014, s. 37.

⁴⁷ Bedîrxan, h.b., r. 20.

⁴⁸ Konak, *Sosyalist Kürtler*, s. 157.

⁴⁹ Şamil, h.b., r. 13.

⁵⁰ Konak, *Sosyalist Kürtler*, s. 158.

sirgûnkirin û kuştin. Polîtîkayên asîmîlasyonê tên amadekirin.⁵¹ Piştî mirina Stalîn (1953), rêvebîrîya Sovyetan û pê re polîtîkaya Sovyetan, careke din diguhere. Stalîn gunehkar û polîtîkayên wî şaş tên dîtin, lêborîn ji milletên tehdedîtî yên wekî Kurdan tê xwestin. Rê li ber îmkanên nû vedibin.

1.2.3. Îmkanên ku bi dest ketin

Bi avabûna sîstema Sovyetê re, ji bo Kurdên Kavkazê îmkan û derfetên perwerdehîyê û pêşketinên edebî çê dibin. Lê belê Kurdên ku wê demê hema bêje bi temamî gundî û rênçber bûn, di vî warî de pir qels diman. Kesên xwende û ji edebîyat, dîrok û çanda xwe haydar pir kêmbûn. Edebîyat û dîroka ku dihat zanîn, bi tenê zargotin bû. Em bi lêv nekin nabe, Ermenên ku li devera Serhedê bi Kurdan re cîrantî kiribûn, wekî zimanê dayîka xwe bi Kurdî dizanibûn, loma di destpêkê de para zêde ya nivîsîna Kurdî ya wan bû. Di 1921an de li Ermenîstanê, Agop Xazaryan (Lazo) bi alîkarîya Ahmedê Mirazî bi tîpên Ermenî pirtûkeke Kurdî ya dersan dinivîse, bi navê *Şems*. Heta sala 1929an him di dibistanên gundên Kurdan de û him jî li nav Kurdên bajarê Tîblîsê, zarokên Kurdan bi vê kitêbê hînê xwendin û nivîsandina bi zimanê dê dibin.⁵² Di salên pey re Museyîp Axundov elîfbayeke Latînî ji bo dibistanên herêma Kurdan amade dike. Dîsa 1928an de Erebe Şemo û Îsheq Marogulov bi navê *Xo Xo Hînbûna Xandina Nivîsara Kurmancî* pirtûkeke bi tîpên Latînî çap dikin. Di 1922an de bi însiyatîfa Ahmedê Mirazî, Lazo û hinek edîbên din, li bajarê Tîblîsê Ji bo zarokên Êzîdî û êtîm, ên ku dê û bavê xwe di şer û komkujiyên wê demê de winda kirine, dibistaneke Kurdî tê vekirin. Di wê dibistanê de zarok hem hînê xwendina Kurdî dibin û hem jî hinê kar û xebatê dibin û bi şev jî li wir radikevin. Kesên wekî Qanatê Kurdo, Çerkezê Beko, Semend Sîyabendov û Tîtal Mûradov li vê dibistanê dixwîn.⁵³ Hêjayê gotinê ye, salên ewilîn ên Sovyetê, mamosteyên Kurdî piranî rewşenbîrên Ermen in. Ji ber ku piranîya Kurdan hê nexwende bûn.

⁵¹ Michiel Leezenberg, “Tarih Tarafından Unutulmuş Bir Halk: Kürtler Hakkındaki Sovyet Çalışmaları”, *Kürt Tarihi*, çev. Metin Yüksel, s. 52, İstanbul, 2023, s.12.

⁵² Boyl, h.b., r. 44.

⁵³ Tosinê Reşîd, “Sovyetler Birliği’nde Kürt Edebîyatı”, Derleyen; Vecdi Erbay, *Înatçı Bir Bahar; Kürtçe ve Kürtçe Edebiyatı*, Ayrıntı, İstanbul, 2012, s. 203.

Xebatên ku tên kirin, di nav wan de ya ku pirtirîn bala mirov dikşîne çêkirina filmeke Kurdî ye. Helbet ên ku vê filmê kişandine ne Kurd lê Ermen in. Ev fîlm, ji çîroka nivîskarê Ermen, Lazo, ya bi navê *Zerê*, bi derhênerîya Hamo Baknazaryan bi heman navî tê kişandin. Mijara wê, çîroka evîndarîyeke romantîk e. Rexneya li sîstema feodal û milkperest, fikra wê ya sereke ye. Lîstikvanên sereke dîsa Ermen in û temsîla Kurdên koçer dikin.⁵⁴

Di 1930an de, rojnameya *Rya Teze* li Yêrêvanê bi Kurdî û tîpên Latînî, bi hejmara xwe ya yekem dest bi weşanê dike.⁵⁵ Salek di pey re dîsa li Yêrêvanê Akademîya Pedagojîyê ya Transkavkazê, *Teknîkum*, vedibe. Di nav xebatên wê demê de, cihekî girîng ê vê dibistanê çêdibe li nav Kurdên Sovyetê. Ne tenê ji Ermenistanê, herwiha ji komarên Sovyetê yên din jî, xwendekarên Kurd tên vê dibistanê. Digel xwendekarên Kurd, ên Ermen jî hene. Di navbera şeş salan de, ji vê akademîyê nêzîkê heftê xwendekar mezûn dibin. Di navbera van mezûnan de, kesên ku îro navê wan bi me nas tên, hene: Erebe Şemo, Heciyê Cindî, Emînê Evdal, Wezîrê Nadirî, Casimê Celîl û wd.⁵⁶

Di dema perwerdehîya ciwanên Kurdan de û piştî perwerdehîya wan, hejmara berhemên Kurdî her ku diçe zêdetir dibe. Berhemên ku yekem car tên dayîn, wekî her derê, li vir jî werger in. Di navbera salên 1929-1938an de, ji 70yî zêdetir pirtûkên Kurdî çap dibin. Ji van pirtûkan nêzîkê 20 heb, ên dersê ne.⁵⁷ Herwiha di berhevokan de, ku ew bi xwe jê re dibêjin “Efrandin”, gelek helbest, şano û çîrokên girîng û hêja tên civandin.

Piştî van xebatan, du xebatên din ên girîng tên kirin ku yek jê avabûna *Koma Şanoya Dewletê ya Elegezê ye* (1937- 1947) û ya din jî vekirina beşa Kurmancî ye, di nav *Radyoya Yêrêvanê*, 1955-, de.⁵⁸

Koma Şanoya Elegezê, bi keç û xortên Kurdan tê avakirin, ew lîstikvan in lê senarîst û mamosteyên ku perwerdeya wan didin Ermen in. Herwiha fînansekirin jî ji

⁵⁴ Boyîk, h.b., r. 116.

⁵⁵ Rohat Alakom, *Riya Teze*, Avesta, Stenbol, 2023, r. 15.

⁵⁶ Şamil, h.b., r. 96.

⁵⁷ Şamil, h.b., r. 97.

⁵⁸ Boyîk, h.b., r. 116, 67.

alîyê dewletê ve tê kirin.⁵⁹ Ev koma şanoyê, ji berhemên Kurdî yê folklorîk re dibe ruh û can. Bi saya wê, destan û çîrokên wekî *Mem û Zîn*, *Dimdim*, *Siyabend û Xecê*, *Gur Hesoyê*, *Kerr û Kulik*, *Keça Mîrekî* ji nû ve belav dibin li nav civakê.⁶⁰

Di *Radyoya Yêrêvanê* de, gava ku carên pêşîn weşanên bi Kurdî tên kirin, hem saetên weşanê kêr in û hem jî ne fermî ye. Lê di sala 1955an de, piştî ku Stalin dimre û Komara Sovyetê ji nû ve dîzayn dibe, beşa Kurdî di bin banê *Radyoya Yêrêvanê* de bi awayekî fermî vedibe û xebatkarên wê li nav dewletê wekî karmend tên qebûl kirin.⁶¹ Weşanên pêşî, bi tenê nûçe tên xwendin. Piştî ku saetên weşanê zêdetir dibin, digel wê naverok jî diguhere. Stran, pîyes û çîrok li weşanan zêde dibin.⁶²

Radyoya Yêrêvanê, wekî dibistaneke hunerî, hem dengbêjên ku turikên wan tije çîrok û destan in bi dengê wan ê xweş derxistiye pêşberî gel, hem jî cewherên ku dengxweş in lê nayên nasîn, bi gel daye nasandin. Ew dengbêjên hêja ku îro bi nav û deng in, hinek jê ev in: Şeroyê Bîro, Karapetê Xaço, Dawîdê Xîlo, Zadîna Şakir, Nûra Cewar, Aslika Qadir, Egîdê Cîmo, Xelîlê Evdîle, Şamilê Beko, Mecîdê Silêman, Hovhannes Badalyan, Fatma Îsa, Aramê Tîgran, Sûsîka Simo û wd.⁶³

Berpirsyarê Radyoyê yê yekem Casimê Celîl e. Dûv re Xelîl Mûradov û Ehmedê Gogê vî barî hildigirin ser milê xwe. Herwiha gelek kesên din jî, bi dil û can di vî arşîva dengî de xebitîne, wekî Temûrê Xelîl, Îşxanê Eslan, Hesenê Mehmûd, Tîtalê Efo, Cemîla Casim, Mirazê Evdo, Cemalê Êsiv... ku gelekî ji wan îro ne li heyatê ne. Pêşkeşvanê binavûdeng Keremê Seyad jî divê neyê jibîrkirin, ku wî bi salan dengê xwe yê bi hêz daye vî radyoyê, digel pêşkeşvanên din Eznîfa Reşîd, Sêvaza Evdo, Gulîzera Casim, Lûsîka Huseyn.⁶⁴

Piştî salên 60î, Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê dikeve dema xwe ya herî rengîn û berhemdar. Nifşên nû û perwedekirî, wekî Eliyê Evdîlrehman, Qaçaxê

⁵⁹ Şamil, r. 99.

⁶⁰ Boyîk, h.b., r. 119.

⁶¹ Hasan Akboğa, “Kürt Aydınlanmasının Kalesi: Radyoya Yêrêvanê”, *Kürt Tarihi*, s. 4, İstanbul, 2013, s. 16-19.

⁶² Boyîk, h.b., r. 75.

⁶³ Öztaş, h.b., r. 103.

⁶⁴ Boyîk, h.b., r. 73.

Mirad, Usivê Beko, Mîroyê Esed, Ferîkê Usiv, Qanatê Kurdo, Ehmedê Hepo, Celîlê Celîl, Şikoyê Hesên, Mîkayîlê Reşît, Sehîdê Îbo, Ordîxanê Celîl, Egîtê Xudo, Egîtê Şemsî, Wezîrê Eşo, Emerîkê Serdar, Sîma Semend, Tosinê Reşîd, Çerkezê Reş û wd. digihêjin nîşên kevn û bi tecrube, wekî Erebe Şemo, Emînê Evdal, Casimê Celîl, Heciyê Cindî û Ehmedê Mirazî. Erebe Şemo, piştî ku ji sirgûnê vedigere, ji nû ve dest bi nivîsandinê dike. Berhemên xwe yên ku di salên 30î de nivîsîbû, careke din dinivîse, nûjen dike. Emînê Evdal, Ehmedê Mirazî, Casimê Celîl û Heciyê Cindî berhemên xwe yên girîng vê demê dinivîsin.⁶⁵ Herwiha di vê serdemê de digel berhemên edebî, yên akademîk jî tên nivîsandin. Di vê de, para vebûna *Beşa Kurdzanîyê* li nav *Enstîtuya Rojhilatzanîyê* ne hindik e, ku ev enstîtu jî di bin banê *Akademîya Ermenîstanê ya Zanyarîyê* de bû. Qanatê Kurdo û Kurdologên din bi saya vê beşê, xebatên muhîm dikin ji Edebîyata Kurdî re.⁶⁶

Bi avabûna Sovyetê re, pêşketina ku li nav Kurdan dest pê dike, ne bi awayekî rîtmîk e. Ji bo ku sîstema Komunîzmê zû û li her derê Sovyetê rûne, ji bo kêmeteweyan gavên girîng û bi lez tên avêtin. Kurd jî yek ji wan miletan e ku cara yekem derfetên pêşketinê û zanyarîyê bi dest dixin. Di 1937an de, di dema Stalîn de, îmkân û derfetên ku ji bo pêşketina miletan hatibûn çêkirin, yek bi yek tên binpêkirin dîsa. Rê li ber xebat û tevgerên edebî tê girtin. Weşana *Rya Teze*, ya ku ji bo propagandaya Komunîzmê bi Kurdî derdiket, ji ber ku bi tîpên Latînî bû, bi îddîaya “propagandaya emperyalîst û dijminê gelan” tê sekinandin.⁶⁷ Du salan piştî mirina Stalîn, di 1955an de, careka din dest bi weşana xwe dike.⁶⁸ Di dema dîktatoriya Stalîn de, Kurdên ku ji zilma Romê reviyabûn hatibûn li Nehciwan, Azerbaycan, Gurcîstan û Ermenîstanê bi cih bûbûn, gelekî ji wan careke din tên sirgûnkirin. Piranîya wan di rê de ji ber birçîtî û nexweşîyan dimirin. Rewşenbîrên vê civakê jî nikarin xwe ji vê zilm û zordariya Stalînîzmê biparêzin. E. Şemo, H. Cindî, E. Mirazî, C. Genco, Cangîr Axa û Şamil Têmûr bi îddîaya “Kurdperestîyê û Sîxurên Rojava” tên derdestkirin. Erebe Şemo piştî derdestkirinê, tê sirgûnkirin bo Sibîryayê.⁶⁹

⁶⁵ Boyîk, h.b., r. 18.

⁶⁶ Şamil, h.b., r. 102.

⁶⁷ Amir Hassanpour, *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil*, Avetsa, İstanbul, 2005, s. 338

⁶⁸ Boyîk, h.b., r. 56.

⁶⁹ İsmet Konak, “Sovyet Kürtlerinin 1937-1938 Sürgünü”, *Kürt Tarihi*, s. 4, İstanbul, 2014, s. 22.

Herwiha elîfbayên Latînî tên qedexekirin, dibistanên ku dersa Kurdî didan tên girtin.⁷⁰

1. 3. Kunyeya Edebîyata Kurdî ya Êwra Sovyetê

Bi qasî ku tê zanîn, berîya avabûna Sovyetê, li Kavkazê ti nimûneyeke Edebîyata Kurdî tune. Ji serdemên kevn ta niha, Kurd niştecihên vê herêmê bûne. Gelo qet berhemek jî nedane? Helbet mimkun e dabin, lewra bi sedsalan hakimîyet û serdestîya Kurdan çê dibe li wir, lê ji ber ku berdewamîya vê hakimîyetê nayê, dîrok û çanda heyî jî parçe dibe. Talana çandî û hunerî çê dibe. Ji ber ku gelek avahî û berhemên mîmarî yê serdema Şeddadîyan, ne li ser navê Kurdan lê li ser navê miletên din ên ku piştî Kurdan hakimîyeta li wir kirine, hatine qeydkirin. Ev jî, îxtîmala hebûna berhemên Kurdî yê wê demê piştrast dike lê xuyaye negihîştine heya serdema nêzîk û îro, loma nayên zanîn. Helbet divê em vê jî bidin ber çavan, piştî ku hakimîyet li Kavkazê ji destê Kurdan diçe, bişaftineke sistematîk dest pê dike, heta sedsala 19an kesên ku bi Kurdî xeber didin pir kêr dimînin.⁷¹ Eger koçberî û tevgerên siyasî yê sedsalên dawî çê nebûna, yanî bi sed hezaran Kurd ji Serhedê derbasî Kavkazê nebûna, bi îxtîmaleke mezin îro edebîyateke Kurdî ya Sovyetê ku em ê niha behsa wê bikin dê tunebûya.

Bi avabûna Sovyetan re, bi piştgirî û pêşniyazên rêvebirîya hikûmeta Sovyetê, Kurd bi alîkarîya edîbên Ermen ên Kurdîzan dest bi xebatên nivîsandinê dikin. Bi vî awayî, rê li ber Kurdan vedibe û Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê dest pê dike.⁷² Di serî de çend dibistanên Kurdî vedibin, pirtûkên dersan û elîfbayên Kurdî ji bo van dibistanan tên amadekirin, çend sal paşê xwendekarên van dibistanan mezin dibin, dest bi lêkolîn û nivîsandinê dikin, pêşî wergeran dikin, paşê berê xwe didin klasîk û folklorê Kurdî. Her çiqas ne bi awayeke rîtmîk be jî, bi sedan berhemên Kurdî bi destên wan derdikevin bazarê. Ne tenê pirtûk, lê radyo, muzîk, rojname û şano jî. Destê wan gîştîbe ku derê, para xwe ya xebatê ji wir kêr nekirine. Zanîn û pêşdebirina miletî, kirine armanca xwe û li gorî wê bi dil û can xebitîne.

⁷⁰ Şamil, h.b., r. 98.

⁷¹ Şamil, h.b., r. 56.

⁷² Boyîk, h.b., r. 16.

Ji bo salên destpêkê em dikarin Ermenîstan, Gurcîstan û Azerbaycanê wekî navenda vê edebîyatê bihesibînin, lê ji salên 30î û bi şûn ve Ermenîstan derdikeve pêş û li her du dewletên din, bazara Kurdî qels dibe. Kedkar û xebatkarên Kurdî li navenda Yêrêvanê kom dibin, wê derê dikin cineta Kurdî. Lê çawa ku Gurcîstan û Azerbaycan du dewletên Sovyetê bûn, Ermenîstan jî dewleteke girêdayî Sovyetê bû. Loma wekî *Ergun* jî dîyar dike, rengûrûyê rasteqîne yê vê edebîyatê Sovyet bi xwe ye, ji ber ku bikerê rasteqîne yê vê dîyardeyê sîyaseta Sovyetê ye. Ji ber vê ye, cihê vê edebîyatê Ermenîstan be jî ruhê wê Sovyet e.⁷³

Gava rêvebirîya Sovyetê ji bo xwendin û nivîsandinê rê li ber kêmteweyan vedike, helbet ne ji ber bejn û bala wan a dirêj, çavê wan ê reş û belek e, bêguman berjwendîyên xwe difikire. Ji ber ku armanca wan, belavkirin û rûniştandina îdeoloji û pergala Sosyalîzmê bû. Li hemû komarên Sovyetê, bêtê destûra komîteyên Partîya Komunîst ti berhem nedihat weşandin an belavkirin. Mîsal, tiştê balkêş e, Kurdên Ermenîstan û Gurcîstanê wê demê hema bêje bi tevahî Êzîdî ne, herwisa dîndar in û îbadetên xwe terk nekirine, lê gava em bala xwe didinê, di nav ewqas salan de bi sedan pirtûk hatine nivîsin ku ji wan pirtûkan yek jî behsa dînê Êzdayetîyê nake. Wisa xuyaye, komîteyên Partîya Komunîst ti carî destûra vê yekê nedane. Jixwe gava em berê xwe didin naverok, karakter, bûyer û temaya berhemên jî, dîsa em derdikevin ser heman rêyê. Yê salên dawîya Sovyetê ne tê de, hema bêje di hemû berhemên Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê da (roman, helbest, şano, radyo, rojname...) propagandaya Komunîzmê, minetdarîya ji Sovyetan re û lenetkirina dîn û feodalîzmê heye. Bêguman ev ne sebeb e ku ev berhem li ber çavên me reş bibin, ji ber ku keyseke mezin a xwendin û nivîsandinê bi dest ketibû û bi xêra vê xwendin û nivîsandinê, herwiha bi fedekarîyeke mezin, Kurdên Sovyetê qeyda ziman û çanda xwe girtin û xwe ji asîmîlasyon, helandin û tunebûnê parastin. Ji me re jî çavkanî û arşîveke têr û tije hiştin.

Hewcehî pê heye, em Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê li ser sê êwran binirxînin. Ji ber ku atmosfera sîyasî ya Sovyetan tim ne wekî hev bûye û rewşa Kurdên Sovyetê bi vê atmosferê girêdayî bûye. Êwra yekem, em dikarin bêtê bi avabûna Sovyetê dest pê dike. Kurd bi awayeke fermî tîr naskirin, heqê

⁷³ Zülküf Ergün, *Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê*, Nûbihar, Ankara, 2023, r. 20.

perwerdehîya zimanê zikmakî û temsîlkirina milletî tê dayîn. Di salên 20î de, ji alîyê edebî ve gavên pêşîn tên avêtin. Pirtûkên dersên Kurdî û elîfbayên Kurdî tên amadekirin. Di salên 30î de gelek werger tên kirin û digel romana yekem a Kurdî (Şivanê Kurmanca-Erebê Şemo) berhemên girîng ên pêşîn tên nivîsandin (Folklorî Kurmanca-Heciyê Cindî, Emînê Evdal).⁷⁴

Di 1937an de, Stalîn tehde û zilma xwe dibe asteke din. Bi hincetên pûç, berê gelek Kurdan dide sirgûn û xerîbîyê dîsa. Edebîyat û hunera Kurdî qedexe dike, dide sekinandin. Em dikarin vê demê wekî êwra duyem bi nav bikin. Ev dem, heta mirina Stalîn dewam dike. Piştî ku Stalîn dimre, careke din atmosfera sîyasî diguhere, pê re jî rewşa edebîyat û hunera Kurdî. Em dikarin vê demê jî wekî êwra sêyem bi nav bikin. Rojnameya *Rya Teze* bi kadroyên nû careke din dest bi weşanê dike, di *Radyoya Yêrêvanê* de beşa Kurdî vedibe. Rewşenbîr û edîbên nû û ciwan, bi xebat û pirtûkên xwe yên nû, tevî refên Kurdî dibin. Amatorî kêr dibe, xebatên akademîk dest pê dikin. Herçiqas 1991ê de komarên Sovyetê belav bûbin û ev bizava edebî wekî nav bi dawî bûbe jî, hindek nivîskarên vê edebîyatê, îro jî li welatên Ewropa û Rûsyayê dinivîsin.

1.3.1. Êwra yekem (1920-1937):

Me li jorê behsa vebûna dibistanên Kurdî û amadehîyên bo van dibistanan kiribû. Herwiha me dabû zanîn elîfbayên Kurdî çawa û bi alîkarîya kê hatine amadekirin. Ev di salên 20î de diqewimin. Di salên 30î de ji xeynî pirtûkên dersan, berhemên ewil ên Kurdî tên nivîsandin li Kavkazê. Kesên wekî Heciyê Cindî, Emînê Evdal, Cerdoyê Genco, Casimê Celîl, Îsivê Beko ku ew berê li dibistan û êtîmxaneyan mezin bûne, dest bi nivîsîna Kurdî dikin. Erebê Şemo, Ehmedê Mirazî, Wezîrê Nadîrî, Etarê Şêro, Qaçaxê Mirad û nivîskarên Ermen ên wekî Rûbên Drampyan, Hovakîm Margaryan û Îsheq Marogûlov, ku ew jî Mexînî ye, tevî van xebatan dibin.⁷⁵

Yekem berhema ku ji hêla van nivîskarên Kurd ve hatiye amadekirin û nivîsandin, rojnameya *Rya Teze* ye, ku ev rojname di 25ê Adara 1930an de li

⁷⁴ Reşîd, h.b., r. 206.

⁷⁵ Reşîd, h.b., r. 205.

Yêrêvanê dest bi weşanê dike û heta niha berdewam dike⁷⁶ Di 1931ê de, berhema Erebe Şemo a bi navê *Koçeke Derewîn* tê çapkirin.⁷⁷ Li dûv van, berhema hevkarîyê a bi navê *Efrandina Ewlîn* tê amadekirin ji hêla van nivîskaran. Ev berhem wekî antolojîyek e, ku di 1932an de li Yêrêvanê tê çapkirin. Di vê berhemê de nivîsên çend helbestkar û nivîskarên Kurd û Ermen hene, wekî Heciyê Cindî, Emînê, Etarê Şêro...⁷⁸ Di 1934an de Antolojîya duyem tê weşandin bi navê *Efrandina Duda*. Di vê berhemê de nivîsên Heciyê Cindî, Cerdoyê Genco, Emînê Evdal, Ehmedê Mirazî û Casimê Celîl cih digrin.⁷⁹ Heman nivîskar û helbestkar, di 1935an de antolojîya xwe ya sêyemîn diweşînin bi sernavê *Nivîskarê Kurmanca Şewirî; Efrandina Sisêya*. Û ji bilî van antolojiyan, di 1935an de Emînê Evdal pirtûka xwe ya bi navê *Bihar*, Nûrî Hîzanî pirtûka xwe ya kurteçîrokan a bi navê *Şewqa Sibê*, Ehmedê Mirazî pirtûka xwe ya bi navê *Zemanê Çûyî*, Etarê Şêro pirtûka xwe ya bi navê *Birqandina Ewlîn*, Erebe Şemo pirtûka xwe ya bi navê *Şivanê Kurmanca*, Wezîrê Nadîrî jî pirtûkên xwe yên bi navê *Nûbar* û *Reva Jinê* diweşînin.⁸⁰ Di 1936an de berhema berhema Erebe Şemo *Kurdê Elegezê* û berhevoka zargotina Kurdî ya navdar, ku bi hevkarîya Heciyê Cindî û Emînê Evdal hatiye nivîsîn, *Folklor Kurmanca* tîne weşandin.⁸¹ Di 1937an de, li gundê Elegez ê bi ser Yêrêvanê ve Koma Tîyatroya Kurdî ya Dewletê tê avakirin. Rêvebir û derhênerên wê yên pêşîn Ermen, lîstikvan jî, bi piranî xort û ciwanên Kurdan in. Di lîstikên xwe de nimûneyên ji zargotina Kurdî û pîyesên nivîskarên wê demê dilîzin.⁸² Hin berhemên ku derxistine ser dikê ev in; *Kerr û Kulik*, *Sîyabend û Xecê*, *Mem û Zîn*, *Lûr de Lûr* (Celatê Koto), *Miraz* (Heciyê Cindî), *Xûşka Doxtirîyê*, *Bira* (Cerdoyê Genco).⁸³

Hêja ye em bibêjin, para wergerandina berhemên ji Rûsî û Ermenî di pêşketina Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê de ne hindik e. Ji salên 30î heta 38an gelekî

⁷⁶ Boyîk, h.b., r. 59.

⁷⁷ Reşîd, h.b., r. 204.

⁷⁸ Têmûrê Xelîl, *Antolojiya 35 Helbestvan û Nivîskarên Kurd Ên Sovyeta Berê*, Îzmîr, 2014, r. 19.

⁷⁹ Xelîl, h.b., r. 19.

⁸⁰ Xelîl, h.b., r. 19.

⁸¹ Boyîk, h.b., r. 18.

⁸² Boyîk, h.b., r. 116.

⁸³ Boyîk, h.b., r. 119.

berhemên bi Rûsî û Ermenî tên wergerandin bo Kurdî. Ji van wergeran piranîya wan ên Ermenên Kurdîzan in.⁸⁴

Nivîs û berhemên vê demê, bi piranî ji bo pesindayîn û şîrînkirina sosyalîzm, V. Lenîn, Kolxoz, Partîya Komunîst û sazîyên pergala Sovyetê dihatin amadekirin. Ji alîyê hevoksazî û derûnîya lehengan ve, qels û bê ser û ber in. Zimanê berheman tamsarkî û xav e, ji hunera edebî dûr in.⁸⁵ Herçiqas wekî bingeş, zargotina Kurdî bûbe bingeş jî, gelek caran mudaxele li metnan hatiye kirin û bi îdeolojîya Komunîzmê hatine dagirtin.

Vê demê, Sovyet bi îmkân û kirinên xwe li piştê kêmteweyan, herwhiha li piştê Kurdan jî sekinîye, lê kadroyên Kurdî pir kêmteweyan. Ji ber vê yê, zêdetir berhem nehatine nivîsîn lê dîsa jî wekî destpêk gavên baş hatine avêtin.

1.3.2. Êwra duyem (1937-1955):

Di 1937an de ewrên reş û tarî careke din li ser Kurdên Sovyetê digerin. Stalîn bi hemû kîş û xeziba xwe li wan dibe teyrok û dibare. Bi hincetên pûç û bereday, ew rihetîya ku çend sal in bi dest xistibûn, careke din di devê wan re dike xwar. Di serî de bi hinceta *Elîfbaya Latînî*, edîbên Kurd, wekî Heciyê Cindî, Cerdoyê Genco, Ehmedê Mirazî, Cangîr Axa û Şamîl Têmûrov bi tohmata *xizmeta ji emperyalist û dijminên Sovyetan re sûncdar dike* û wan dişîne kamp û zindanan. Nivîskarê navdar Erebe Şemo jî wekî sirgûn dişînin Sibîryayê, ku ji 19 salan bêtir li wir dimîne, heta ku Stalîn dimre.⁸⁶

Weşana rojnameya *Riya Teze* di 1938an de tê rawestandî. Heta 1955an weşana wê nayê kirin. Di navbera van salan de bi temamî nebe jî, Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê parek zêde radiweste. Bi biryara desthilatdarîya Sovyetê, bi armanca ku çanda gelên Sovyetê nêzîkê hev bibe li şûna Elîfbaya Latînî, Elîfbaya Kirîlî tê bikaranîn edî. Di destpêka salên 40î de komek zanyarên Kurd û Ermen, ji bo amadekirina Elîfbaya Kirîlî dixebitin, lê barê girantir dibe yê Heciyê Cindî. Li ser vê gelekî dixebite. Di 1947an de, berhevoka xwe ya novelan a bi navê *Siba Teze*, bi

⁸⁴ Boyîk, h.b., r. 19.

⁸⁵ Boyîk, h.b., r. 19.

⁸⁶ Reşîd, h.b., r. 204.

tîpên Kirîlî çap dike. Di 1948an de antolojîya 4. ya berhemên nivîskarên Kurd, bi navê *Efrandîna Nivîskarê Kurmancê Sovêtiyê* li Yêrêvanê tê çapkirin. Ya 5. jî di 1954an de bi sernavê *Nivîskarê Kurmancê Sovêtiyê* tê çapkirin. Nivîskarên nû yên wekî Qaçaxê Mirad, Mîkayîlê Reşîd û Êsivê Beko bi nivîsên xwe tevî nivîskarên destpêkê dibin.⁸⁷

Bêguman di vê dema dijar de, ti tiştî heta dawî berdewam nekiriye. Yek ji wan Koma Şanoyê ya Elegezê ye, ku ew jî dikare heta 1947an xebatên xwe berdewam bike. Di salên 40î de bi lîstikên xwe, li gund û bajaran derdikevin tûrneyan û ji hêla gel ve rastî eleqeyeke mezin tên.⁸⁸ Digel destanên Kurdî, berhemên Ermenî û Rûsî jî wekî şano derdixin ser dikê. Vê demê, ji ber ku duyemîn şerê dinyayê dest pê dike, ew jî repertûara xwe li gorî şert û mercên demê diguherin. Şanoyên welatparêzî, mîrxasî û qehremanîyê dilîzin, ku hinek ji wan ev in; *Heso* (Ş. Gênosyan), *Heyfhildan* (Nayrî Zaryan), *Mêrgên Elegezê* (H. Şaybûn), *Jêlêznîyakê Partîzan* (B. Staffl).⁸⁹

1.3.3. Êwra sêyem (1955-1991):

Di 1953an de, Stalînê ku bi tehde û zilma xwe ya mezin navdar dibe, dimre. Partîya Komunîst a Sovyetê ji ber biryarên wî yên tund lêborîna xwe ji gelên Sovyetê dixwaze, ku Kurd jî di nav de ne. Stalîn, gunehkarê tîtin û careke din rê li ber tevgerên edebî, çandî û hunerî tê vekirin.⁹⁰ Ew agirê destpêkê ku hindik mabû vemire, ji nû ve geş dibe. Îja ne wekî berê ye jî. Kadroyên destpêkê bûne xwedî tecrube û xwendekarên wan ên pêşî li kêleka wan cihê xwe digrin, bi hev re dinivîsin. Ji aliyê teknîk û hunerî ve xurttir dibin. Tesîra zimanê îdeolojîk û sloganîk kêmbûnê dibe, cihê xwe dide yê edebî û hunerî. Di standardbûna ziman de gavên girîng tên avêtin. Naverok dewlemendtir dibin, cureyên nû yên edebî tên nivîsandin û temsîlkarên ku di warê xwe de navdar dibin derdikevin. Mijar û temayên nû, wekî evîn, xerîbî, welatperwerî û hesreta rastîn, yanî Serhed-Kurdistan, peyda dibin. Helbet divê em ji bîr nekin, di vê peydabûna hestên netewî de sebebê girîng heye.

⁸⁷ Xelîl, h.b., r. 22.

⁸⁸ Öztaş, h.b., r. 84.

⁸⁹ Boyîk, h.b., r. 118.

⁹⁰ Xelîl, h.b., r. 22.

Ew jî ev e; Serokê navdar Mistefa Barzanî û pêşmergeyên li gel wî, ji ber şerê xwe yê bi dewleta Îraqê re piştgirîya Sovyetan distînin û dikevin rojeva Yekîtiya Miletan. Ev dibe gaveke girîng bo hemû Kurdan, herwisa bo Kurdên Sovyetê jî. Tovên Kurdbûnê ên ku bi salan di bin axê de mabûn û her qalik girtibûn, bi vê hêvî û kelecaniyê zîl didin û şîr dibin dîsa. Ji hêla Kurdbûn û netewebûnê ve, hişyarbûn dest pê dike û bi Kurdên din re têkilî çê dibe. Transkrîpsiyona berhemên Kurdî yên derveyî Sovyetê tên kirin, wekî helbestên Cegerxwîn û berhemên Kurdî yên klasîk.⁹¹

Di 1963an de xwendekarên Kurd, li Yêrêvanê, komeleyek bi navê *Şêwra Xwendekarên Kurd* ava dikin. Ev yekem rêxistina civakî ye li nav Kurdên Sovyetê. Armanca wan ev bû, gelem Kurd ê li Sovyetê ji hêla Kurdbûnê ve hişyar bikin û yekîtiya wan çê bikin. Heta derekî bi ser dikevin jî, ji ber ku wê demê temaya sereke ya Edebîyata Kurdên Sovyetê, nexasim ya helbestê, rasterast dibe serxwebûnxwazî û azadîxwazîya Kurdistanê.⁹² Em dikarin du nava bi lêv bikin ku di vê mijarê de derketine pêş: Şikoyê Hesên û Fêrîkê Êsiv. Wan, herçiqas ji çem û kanîyên Elegezê av vexwaribin jî, fikr û sewta wan her welatê bav û kalan, Kurdistan e. Li ser wê dinivîsin, bi bîr tînin, pê diêşin, qedir didinê, bêrîya wê dikin û hesreta wê dikêşin.

Gava dîrok digihêje 1955an, weşana *Rya Teze* careke din dest pê dike. Di *Radyoya Yêrêvanê* de para axaftina Kurdî çê dibe. Ne tenê li Ermenîstanê, li nav hemû Kurdan dengê wê belav dibe.⁹³ Li Ermenîstan, Gurcîstan, Azerbaycan û Rûsyayê beşên Kurdnasîyê vedibin û dersên li ser ziman û çanda Kurdî tên dayîn. Bajarên wekî Yêrêvan, St. Petersburg, Moskova, Tîflîs û Bakû dibin navendên perwerde û lêkolînên Kurdî. Kurdolog Joseph Abgarovich Orbeli, ku wî di navbera salên 1916-1937an de li Zankoya Lenîngradê dersên Kurdî dida, di 1959an de li Lenîngradê, di avabûna *Beşa Xebatên Kurdî (Kurdskiy Kabinet)* de pêşengîyê dike, ku ev beş di bin banê *Enstîtuya Gelên Asyayî* de û ew jî di bin banê *Akademîya Zanistên Sovyetê* de bû. Di 1961ê de serokatîya vê beşê ji Qanatê Kurdo re dihele.⁹⁴ Di vê beşê de Kurdolog û nivîskarên heja dixebitin. Yek ji wan lêkolîner û

⁹¹ Reşîd, h.b., r. 211.

⁹² Reşîd, h.b., r. 209.

⁹³ Reşîd, h.b., r. 208.

⁹⁴ Michiel Leezenberg, "Sovyet Kürdolojisi ve Kürt Oryantalizmi", Çev. Menaf Êlî, *Kürt Araştırmaları Dergisi-Dosya; Kafkasya Kürtleri*, s. 8, 2022, s. 103.

Kurdologê navdar Margaret Rudenko ye. Ew berhemên Kurdî yên klasik, wekî *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî, *Zembîlfiroşa* Melayê Bateyî, *Şêxê Sen'ana* Feqîyê Teyran, *Leyl û Mecnûna* Harisê Bitlîsî û *Adet û Rusûmatnameyê Ekradîyeya* Mele Mehmûdê Bazidî çap dike.⁹⁵

Di vê dema geş de, di warê fikr û jiyana Kurdan de guherînên mezin çê dibin. Hejmareke zêde xwendekarên Kurd diçin zanîngehan. Li beşên Kurdnasîyê yên enstîtu û zanîngehan, di warên lêkolîn û berhevkarîyê de kesên hêja radibin. Heciyê Cindî, Qanatê Kurdo, Ordîxanê Celîl, Celîlê Celîl ji wan hinek in.

Heciyê Cindî, di temênê xwe yê dirêj ê nivîskarîyê de bi dehan pirtûk û metnên Kurdî dinivîse. Ji ber ku êtîm û sêwî ye, li êtîmxaneyan mezin dibe û Kurmancîya xwe ji bîr dike. Lê gava ku dibe dersdar û li gundên Kurdan dersdarîyê dike, vedigere ser zimanê bav û kalan. Ji bo zarokên Kurdan pirtûkên dersan amade dike û gund bi gund digere, da ku cureyên Zargotina Kurdî berhev bike. Li pey xwe, ligel pirtûkên xwe yên navdar *Hewarî û Folklor Kurmanca*, 15 pirtûkên folklorzanî û edebîyatzanîyê, 12 berhevokên zargotinê, 7 pirtûkên zanista pedagojîyê û 33 pirtûkên dersan dihele.⁹⁶

Qanatê Kurdo jî wekî Heciyê Cindî, li êtîmxaneyan mezin dibe. Di 1922an de, bi însîyatîfa nivîskarê Kurd Ehmedê Mirazî, dostê Kurdan Lazo (Hakob Xazaryan) û hinekên din, li Tîblîsê ji bo zarokên Kurdan dibistan vedibe. Li vê dibistanê hem zarokên Kurdan dixwend, hem hînê kar dibûn, hem jî tê de radizan. Q. Kurdo jî yek ji wan xwendekaran e. Xwendina xwe ya bilind, bi alîkarîya Erebe Şemo, li zanîngeha Lenîngradê di beşa ziman, dîrok û edebîyatê de dike. Di dema xwe de, bi jîr û zanatîya xwe û xebatên xwe zû bal dikşîne ser xwe. Bi dehan pirtûk û gotarên wî yên zanyarîyê hene li ser ziman, zargotin, dîrok û çanda Kurdî. Hinek xebatên wî ev in; *Rêzimana Zimanê Kurdî* (1957), *Ferhenga Kurdî (Kurmancî)-Rûsî* (1960), *Ferhenga Kurdî (Sorani)-Rûsî* (1983) ligel Zara Yûsûpovayê, *Tarîxa Edebîya Kurdî*

⁹⁵ Leezenberg, h.b., r. 106.

⁹⁶ Boyîk, h.b., r. 150.

cilda pêşîn (1983), *Tarîxa Edebîya Kurdî* cilda duyem (1985), *Gramera Zimanê Kurdî* (1990), *Duwazdeh Varîant, Mem û Zîn* (1996).⁹⁷

Ordîxanê Celîl, lêkolîner û filologekî navdar e li nav Kurdên Sovyetê. Piştî ku xwendina xwe ya li Ermenîstanê bi awayeke serkeftî diqedîne, diçe Lenîngradê û di warê folklorê Kurdî de doktorayê dixwîne. Ligel Kurdologên mezin Î. A. Orbelî, Q. Kurdo, Î. Sûkêrman, Ş. Rûdenko dixebite û di warê filolojîyê de digihîje dereceya profesoriyê.⁹⁸ Hinek xebatên wî ev in: *Şîer û Poyem* (1959), *Têlî Hemze* (1963), *Lêkolîna li ser Kela Dimdim û Serhildana Emîrxanê Lepzêrîn, Poêzîya Cegerxwîn a Bajarvanîyê* (1986), *Zargotina Kurdan* (1978), *Stranên Kurdî yê Dîrokî* (2003), *Gulançik Zêrîn û Gulçin*.

Celîlê Celîl, li nav malbateke rewşenbîr û Kurdperwer mezin dibe. Bavê wî helbestvanê navdar Casimê Celîl e, dêya wî Xanima Celîl e. Birayê wî yê mezin filologê navdar Ordîxanê Celîl e. Cemîla Celîl û Zîna Celîl jî du xwişkên wî ne, ku ew jî bi xebatên xwe yê berhevkarî û wergerê tên nasîn. Casimê Celîl û Xanima Celîl, digel ku ne li gund lê li bajêr in jî, zarokên xwe bi çand û zimanê Kurdî mezin dikin û girîngîyê didin perwerdehiya wan a di vî warê de. Celîlê Celîl wekî birayê xwe yê mezin Ordîxanê Celîl, piştî xwendina xwe ya li Yêrêvanê berê xwe dide Lenîngradê, Enstîtuya Rojhilatnasîyê. Li ser dîrok û çanda Kurdan dixwîne û bi serkeftî temam dike. Salên dûvedirêj wekî Kurdzan-xebatçîyê zanyariyê li Yêrêvanê kar dike.⁹⁹ Di sala 1991ê de li Moskovayê digihîje dereceya profesoriyê. Piştî belavbûna Sovyetan berê xwe dide Wîyanayê û heta niha jî li wir dijî. Di zanîngeha Wîyanayê de wekî Kurdzan, li ser ziman, dîrok, çand û Edebîyata Kurdî kar dike û dersan dide. Gelekî xebatên wî yê berhevkerin û tomarkirinê hene di warê Zargotina Kurdî de. Ew di Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê de yekem kes e ku li ser bîr û bawerîyên Êzdîyan nivîsîye û nimûneyên qewlên Êzdîyan berhev kiriye û çap kiriye. Herwisa lêkolînên wî yê li ser Sûfîzmê jî bal dikişînin. Xebateke wî ya din heye ku wekî berhevokeke pir girîng tê qebûlkirin. Navê vê berhevoka wî *Keşkula Kurmancî* ye. Di vê berhevokê de gelek helbestên destnivîs ên helbestvanên ku nehatine

⁹⁷ Boyîk, h.b., r. 502.

⁹⁸ Boyîk, h.b., r. 545.

⁹⁹ Boyîk, h.b., r. 552.

naskirin civandiye.¹⁰⁰ Di 1994an de ew û hevalên xwe li Wîyanayê Enstîtuya Kurdzanîyê ava dikin û heta niha jî xebatên xwe li wir didomînin.¹⁰¹ Va ne hin xebat û pirtûkên wî yên naskirî: *Mesele û Metelokên Kurda* (1972) tevî Ordîxanê Celîl, *Gulçîn* (1972) tevî Ordîxanê Celîl, *Çîrokê Cimaeta Kurda* (1974) tevî Ordîxanê Celîl, *Zargotina Kurda* cilda 1. û 2. tevî Ordîxanê Celîl, *Zargotina Kurdê Sûryayê, Avsûnên Kurdî* (1987) tevî Ordîxanê Celîl û Zîna Celîl, *Kurdên Ermenistana Sovêtiyê Bîblografya 1920-1980* (1987), *Sêzde Rûpelên Balkêş ji Dîroka Gelê Kurd* (2002), *Keşkûla Kurmancî Sedsalîya X-XX* (2004).

Di destpêka salên 70yî de li Gurcîstanê derfetên nû çê dibin bo pêşketina civaka Kurdî. Jiyana çandî ya Kurdên Gurcîstanê geş dibe. Komên şano, muzîk û govendan tîrên avakirin û karê wênesazîyê tê kirin. Nivîskarên wekî Ezîzê Îsko, Cerdoyê Esed, Baxçoyê Îsko, Taharê Biro ligel çend nivîskarên Kurd ên Gurcîstanê, di bin banê Yekîtiya Nivîskarên Gurcîstanê de beşa Nivîskarên Kurd vedikin.¹⁰² Herwisa li Azerbaycanê jî gavên girîng tîrên avêtin. Di Akademîya Zanistên Rojhilatnasîyê de beşa Kurdnasîyê tê vekirin. Nivîskarên wekî Rehîm Qazî, Şamîl Esgerov, Elî Gelawêj, Zumrûd Şafîyêva, Ehmedê Hepo, Mehemed Şemsî, Huseyîn Kurdoxlî li vî welatî bi xebatên xwe yên Kurdî tîrên naskirin.

Gava Erebe Şemo dest bi nivîsandinê dike û romana xwe ya yekem, *Şivanê Kurmanca* (1935) dinivîse, di vî warî de ew bi tenê ye. Şemo, demeke dirêj ji xeynî *Şivanê Kurmanca* romaneke din nanivîse, ta ku ji sirgûnê vedigere û *Şivanê Kurmanca* bi awayeke berfireh û nûjenkirî, bi navê *Berbang* (1959) dîsa diweşîne. Piştî wê, her sê romanên xwe yên din diweşîne. *Jiyana Bextewar* (1965), *Dimdim* (1965) û *Hopo* (1969).¹⁰³ Di êwra sêyem de, di warê romannivîsîyê de Erebe Şemo ne bi tenê ye. Qelema Kurdî xurt dibe û romannûsên nû peyda dibin. Ew berhemên xwe li vî edebîyata ciwan û nû zêde dikin. Eliyê Evdilrehman *Gundê Mêrxasan* (1968), *Xatê Xanim* (1969) *Şer Çiya da* (1989) dinivîse. Sehîdê Îbo romana xwe ya bi navê *Kurdê Rêwî* (1979) dinivîse. Egîdê Xudo romana xwe ya bi navê *Dê û Dêmarî* (1986), Heciyê Cindî ji romana xwe ya bi navê *Hewarî* (1967) dinivîse.

¹⁰⁰ Boyîk, h.b., r. 554.

¹⁰¹ Boyîk, h.b., r. 555.

¹⁰² Reşîd, h.b., r. 211.

¹⁰³ Xelîl, h.b., r. 94.

Ezîzê Gerdenzerî romana xwe *Fîncana Ferfûrî* (1990), Ehmedê Hepo her du romanên xwe *Birîn* (1996) û *Bawerî* (1990) dinivîse. Tosinê Reşîd romana xwe *Mestûre Serê Hêjayî Tac Bû* (2005) û Rehîmê Qazî jî romana xwe ya navdar *Pêşmerge* (1959) dinivîse.¹⁰⁴

Divê em li vir balê bikşînin ser du tiştan, da ku hinek nêrîn zelaltir bibin. Ya yekî, wekî me berê jî gotibû, Kurdên li Kavkazê bi temamî Kurmancî diaxivin û nimûneyên Edebîyata xwe jî bi zaraveyê Kurmancî dinivîsin. Lê Rehîmê Qazî romana xwe *Pêşmerge* bi Soranî nivîsîye. Ji ber ku ew ne Serhedî lê Rojhilatî bûye û bala wî bi temamî li ser bûyer û serpêhatîyên Rojhilat bûye. Bi gotinekî din, her çiqas li Azerbaycanê jîya be jî, ew ne endamê vê tradîsyonê ye lê para xwe ji derfetên heyî stendîye. Ya duduyan, di 1991ê de Sovyet hildiweşe û Kurdên ku di bin hukmê wê de dijîn, berbelav dibin. Nivîskarên wekî Celîlê Celîl, Tosinê Reşîd, Eskerê Boyîk û Têmûrê Xelîl ku gelek berhemên xwe di demên nêzîk de çap kirine, ji vê tradîsyonê tên û êdî li dîyasporayê dijîn. Heqê me ye em pirseke wiha bikin; Gelo em dikarin berhemên wan di nav berhemên Kurdî yên êwra Sovyetê de bihesîbinin? Helbet em dikarin lê tenê ew berhemên ku di dema Sovyetê da nivîsîne û çap kirine.

Piştî salên 60î di warê Çîroknûsî û Şanonûsîyê de çend navên girîng derdikevin pêş. Emerîkê Serdar yek ji wan e. Ew salên dûr û dirêj di rojnameya *Rya Teze* de dixebite. Keda wî ne hindik e. *Destê Dê* (1974), *Êdî Dereng bû* (1979), *Dengê Dil* (1985), *Gundê Me* (2006), *Heja Emir* (2008), *Dawet Du Cara Kirin* (2005), *Heta Kengê* (2007) pirtûkên wî yên kurteçîroka ne.¹⁰⁵ Di warê çîroknûsîyê de em behsa Wezîrê Eşo nekin nabe. Sê pirtûkên wî yên çîrokan hene, ku navê wan ev in; *Mizgînî* (1976), *Dengbêj Kal Bûbû* (1983), *Pamp-Sîpan* (1986).¹⁰⁶ Têmûrê Xelîl, ku wekî lêkolîner û rojnemavan tê nasîn, pirtûkek çîrokan nivîsîye bi navê *Dengê Xûnê* (2009).¹⁰⁷ Ne mimkun e gava em behsa berhemên çîrokan bikin û em navê Babayê Keleş bi lêv nekin. Ew li derdoreke çîrokbêj, dengbêj û qewlbêj mezin dibe. Gelekî helbest, çîrok û gotarên wî di rojnameya *Rya Teze* de tên weşandin. Pirtûka wî ya

¹⁰⁴ Xelîl, h.b., r. 105.

¹⁰⁵ Boyîk, h.b., r. 381.

¹⁰⁶ Boyîk, h.b., r. 389.

¹⁰⁷ Boyîk, h.b., r. 462.

kurteçîrokan *Nîşanî* di sala 1983an de li Yerêvanê tê weşandin.¹⁰⁸ Eskerê Boyîk, ku ew ji bo Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê wekî çavkanî tê zanîn, xwedîyê gelek xebat û berhemên Kurdî ye. Sê pirtûkên wî yên çîrokan hene, ku navê wan ev in; *Li Çiya* (1991), *Çîrokên Oda Me* (2004), *Merivê Bê Derd* (2021). Fîlolog, Pêşkeşvan û redaktora navdar a Radyoya Yêrêvanê Sîma Semend xwedî çend pirtûkên çîrokan e. Navê pirtûkên wê *Xezal* (1961), *Du Şahî* (1967) û *Guman* (1982) e. Helbet ew hêjayê pesindayîne ye, ji ber ku ew tekane jin bû, ya ku wê demê nivîskarî dikir.¹⁰⁹ Hovakim Margaryan, ku ew wekî Nûrî Hîzanî dihat naskirin, Zargotina Kurdî baş nas dikir. Bi eslê xwe Ermen bû lê li nav Kurdan mezin bûbû û berhemên xwe bi Kurdî dinivîsand. Pirtûka wî ya çîrokan *Şewqa Sibê* di 1934an de hatiye çapkirin.¹¹⁰

Ji ber ku komên şanoyan li nav civaka Kurdên Sovyetê rastî eleqeyên mezin hatine, nivîskar û rewşenbîrên Edebîyata vê deverê, xwe ji nivîsandina şanonameyan bêpar nehiştine. Hinek şanoname ji ber eleqeya mezin a temaşevanan, bi salan ji ser dikê nehatine xwar, serbilindî ji nivîskarê xwe re çê kirine, hinek ji wan jî qet nehatine pêşberî temaşevanan, lê gihîştine ber destê xwendevanan. Herwisa hinek ji wan bûne pîyes û di Radyoya Yêrêvanê de hatine weşandin. Piştî salên 60î hejmareke zêde şanoname hatine nivîsîn. Hinek ji wan ev in; *Huba Bêdil* (1964) ya Îsmayîlê Dûko, *Zarîna Çiya* (1989) ya Ezîzê Gerdencerî, *Bêqelen* ya Ferîkê Êsiv, *Remo, Şemo, Temo* (1970) ya Wezîrê Eşo û *Sinco Keça Xwe Dide Mêr* (1980), *Heyf, Birînen Rojên Bihorî* yên Eskerî Boyîk, *Sîyabend û Xecê* ya Tosinê Reşîd, *Elenewêrek û Mem û Eysê* yên Xelîlê Çaçan, *Gulîzer* ya Emînê Evdal, *Hisret* ya Hraçya Koçar, *Gîkor* ya H. Tûmanyar.¹¹¹

Di salên pêşîn ên Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê de berhemên ku tên nivîsandin bi piranî pexşan in û parek zêde jî karên zargotin û berhevkarîyê ne. Gelekî sal di ser re derbas dibin heta ku helbestvan tevî berhemên xwe yên helbestan tevî vê edebîyatê dibin. Di serî de herçiqas bêhna hubra berhemên Rûsî û Ermenî ji wan tê jî, salên di pey re resenî û xwemalîyek mezin çê dibe bi wan re. Bi taybetî piştî salên 60î, gava ku xwendekarên Kurd ên perwerdekirî tevî vê edebîyatê dibin û

¹⁰⁸ Boyîk, h.b., r. 455.

¹⁰⁹ Boyîk, h.b., r. 373.

¹¹⁰ Boyîk, h.b., r. 27.

¹¹¹ Xelîl, h.b., r. 24.

têkilî bi Edebîyata dinyayê û Kurdên deverên din re çê dikin, şêwaz û awayên xwerû diafirînin û li ser vê qelema xwe tûj dikin. Temayên nû, ên wekî welat, xerîbî, sirûşt, netewetî, hesret û evînîyê dibin temayên sereke. Hestên millî û hişyarkirina netewî dibin para yekemîn. Berîya wê cara yekem Qaçaxê Mirad di helbesta xwe ya bi navê *Hisret* de behsa Kurdên derveyî Sovyetê kiribû, piştî salên 60î ev tema dikeve pêşîya hemû temayên din û nexasim di helbesta Kurdî de xuya dibe.¹¹²

Helbestvanên navdar Fêrîkê Êsiv, Şikoyê Hesen û Qaçaxê Mirad di serî de berê xwe didin folklor û helbesta klasîk û ji wir rêyekî nû peyda dikin. Di pey wan re Egîte Şemsî, Rizalîyê Reşîd û Eskerê Boyîk jî heman tiştî dikin, piştî xwe dispêrin helbesta klasîk a Kurdî û gavên nû diavêjin. Mîkailê Reşîd, şêweya nû ya Ewropaî bi kirasê Kurdî diceribîne û bi vê berdewam dike. Sihîdê Îbo û Simoyê Şemo didin pey wî.¹¹³ Gava em qala helbesta Kurdî ya civata Kurdên Sovyetê bikin hewce ye em van navan jî bi bîr bin, ku wan bi qelema xwe Kurdî neqîşandine; Baxçeyê Îsko, Ezîzê Îsko, Cerdoyê Esed, Şerefê Eşîr, Şamîl Eskerov, Tosinê Reşîd, Çerkezê Reş, Korda Mad (Ezîzê Cewo Mamoyan), Ezîzê Gerdengerî, Egîdê Ehmed, Vanîkê Elîxan, Torinê Ozman, Barîyê Bala, Paşayê Erfût, Mecîte Silêman, Cemalê Êsiv, Svêtlana Silêman, Zîna Emer û wd.¹¹⁴ Fêrîkê Êsiv û Şikoyê Hesen bi qelema xwe ya xurt pêşengîya vê demê dikin. Êşa nav gel, bi xwe re digêrin û her tînin ziman. Dilê her neferekî Kurd, dikin nav dilê xwe û pê re dijîn, heta ku karibin. Şikoyê Hesen çawa ku bi tijî kul û keser tê dinyayê wisa jî bi tijî kul û keser ji vê dinyayê bar dike diçe. Pirtûka wî ya pêşîn berhevoka helbestan *Qalçîçek* e, ev berhevok di 1961ê de çap dibe. Ew bi vê berhevoka xwe, li nav civata Kurdên Sovyetê deng vedide. Di rojnameya *Rya Teze* de gotar li ser tînin nivîsîn. Teknîka helbestên wî ya helbestên klasîk bûn, lê zimanê wî sade û yê axaftinê bû. Ji ber ku zarokatîya xwe li nav xwezaya çîyayê Elegezê derbas kiribû, piranîya helbestên xwe jî li ser xweşîkbûn û bedewîya xwezayê dinivîsî.¹¹⁵ Di 1965an de berhevoka wî ya duyem bi navê *Tembûrê Kurda* tê çapkirin. Gelek helbestên wî yên di vê berhevokê de paşê dibin stran û dikevin devê gel, wekî helbesta wî ya navdar *Zimanê Kurdî*. Berhevoka wî ya

¹¹² Reşîd, h.b., r. 209.

¹¹³ Reşîd, h.b., r. 209.

¹¹⁴ Xelîl, h.b., r. 23.

¹¹⁵ Boyîk, h.b., r. 95.

sêyem *Meremê Dilê Kurd* e, ku di 1970an de tê çapkirin. Di 1977an de, salek di pey mirina wî re berhevoka wî ya çarem *Perwezê Wetîn* çap dibe.

Bêguman di nav helbestvanên Kurdên Sovyetê de, yê herî navdar û berhemdar Fêrîkê Êsiv e. Ew bi hunera xwe ya xurt gul vedide li mêrg û çîmenên Elegezê, li newal û kanîyên Pampa xwe ya kubar û mîna Bûkan. Bêhna gul û kulîlkên Elegezê tî jî helbestên wî yê xwezayê, wisa jî bîranînên zarokatîya wî. Derd û kulên gel bi hostetî raxistîye ber me û evîna xwe ya welat her anîye bîra me. Wekî Şikoyê Hesên, gelekî helbestên wî jî dibin stran û di nav gel de tî gotin. Pirtûkên wî dibin dîyarîyên dost û hevalan. Helbestên wî dibin mêvanên şî û şahîyan. Berhevoka wî ya pêşîn a helbestan bi navê *Çavkanî* (1961) tê weşandin. Ev pirtûka wî di demeke kin de tê firotin û diqede. Bijîşkê navdar Sihîdê Îbo di rojnameya *Rya Teze* de gotareke berfireh li ser vê berhemê dinivîse û qîmeteke mezin didê.¹¹⁶ Berhevokên wî yê din jî rastî eleqeyên mezin tî, ku navê wan ev in; *Gula Elegezê* (1964), *Lîrîka* (1967), *Destana Êsivê Nevya* (1973), *Narê* (1977), *Hisretdefter* (1984), *Dinya Delal* (1987). Çîrokehelbestên wî yê ku wekî destan tî qebûlîkin, jîyan, xweza û civaka gundê wî bi xwe temsîl dikin. Destanên wî *Hisret*, *Rihana Reşo*, *Rizayê Kurmet*, *Dewatîyê Dîlbend* û şanoya wî *Bê Qelen* û gelek afirandinên wî yê din jî jîyana gundê wî bi xwe ne. Gava xwendevanekî van berheman dixwîne, li nav gund digere, însanên wî, deşt û çîyayên wî nas dike, bi şivan re diçe ber pez, bi jinan re nan li tenûrê dixê, bi ciwanan re dilîze, bi kal û pîran re digîrî. Fêrîkê Êsiv jî gundê xwe Pampê (Sîpan) pîr hez dikir û bi hunera xwe ya xurt bi xwendevanan jî dida hezkirin. Me qala destanên wî kir, divê em van destanên wî yê din jî ji bîr nekin; *Êsivê Nevîya*, *Xewna Mîrmih*, *Hubê Xwedêhiz* û *Heja Hêle*. *Heja Hêle* ne tê de, ew ên din bi naveroka xwe nimûneyên zargotinê ne.¹¹⁷ Destanên wî *Dewatîya Dîlbend*, *Rihana Reşo* û *Rizayê Kurmet* jî trajedyayên biçûk ên ji bûyerên rastî û dîrokî ne.¹¹⁸

Fêrîkê Êsiv herçiqas di hêla helbestvanîyê de nav û dengê xwe belav kiribe jî, ew di wergerandina berhemên bîyanî de jî hosteyekî bêqisûr e. Ji kesên wekî *William Shakespeare*, *George Gordon Byron*, *Heinrich Heine*, *Aleksandr S. Puşkin*, *Mihail*

¹¹⁶ Boyîk, h.b., r. 263.

¹¹⁷ Boyîk, h.b., r. 278.

¹¹⁸ Boyîk, h.b., r. 279.

Lermantov, Sergey Yesenin, Sayat Nova û gelekên din wergeran kiriye.¹¹⁹ Hindek stranên ku wî ji helbestvan û dengbêjê navdar ê Ermen, Sayat Nova, wergerandine, ji alîyê stranbêja navdar *Aslîka Qadir* ve di Radyoya Yêrêvanê de hatine xwendin.¹²⁰

Di dawiyê de, em dikarin bibêjin ku hebûna Kurdan li Kavkazê dîrokeke dirêj û tevlihev e, ku ji serdema kevnare heta niha berdewam kiriye. Bi avabûna Yekîtiya Sovyetê, Kurdên Kavkazê bi awayê fermî wekî miletekê tên nasîn û rêya xwendin û nivîsandinê li ber wan tê vekirin. Her çend di dema Stalîn de rastî zilm û zordariyê hatibin jî, piştî wî derfetên nû çê dibin û Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê, ji berê geştir dibe. Bi xebat û nivîsên gelek edîb û rewşenbîran, ziman û çanda Kurdî tê parastin û pêş xistin.

1.4. Teorîya Realîzma Sosyalîst

Mirov dikare Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê, di nav edebîyata giştî ya Sovyetê de wekî beşeke biçûk qebûl bike ku ev edebîyat li gorî taybetmendiyên Realîzma Sosyalîst ava bûye. Di bin çarçoveya polîtîk a Sovyetê de, tu derfet ji bo çêkirina edebîyateke cûda tunebû; rejîmê, bi sansûreke giran li ser hemî cureyên weşanan kontrol hebû. Ji ber vê yekê, Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê, wekî naverok û şewaz, bi tevayî li gorî îdeolojîya Sovyetê saz bûye, ku ev jî teorîya Realîzma Sosyalîst e. Li ser vê binyadê, Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê bi piranî ji alîyê Kurdên Êzîdî ve hatiye berhemanîn, ku di encama şerên dirêj ên di navbera Împeratoriye Rûs û Osmanî de xwe li Rûsan girtibûn. Bi vê sedemê, ev edebîyat xwe li ser sosyolojîyeke diyar a Kurdewarî datîne, ku rû û rûyên komeke etnîkî ya paşdemayî jê xuyaye..¹²¹ Di vê edebîyatê de, têkilîyên civakî, dîrokî û çandî yên Kurdên Êzîdî bi awayekî berbiçav tene nîşandan. Bi vî rengî, ev edebîyat ne tenê qeydeke çandî û zimanî ye, lê di heman demê de şahidê guhertinên mezin ên dîrokî û civakî ye, ku vê koma etnîkî, di navbera du împeratorîyên mezin de ew tecrube kiriye. Loma, Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê ne tenê wekî beşek ji Edebîyata Sovyetê, lê wekî dîmeneke taybet ji çanda Kurdî jî tê dîtin.

¹¹⁹ Boyîk, h.b., r. 263.

¹²⁰ Boyîk, h.b., r. 264.

¹²¹ Zülküf Ergün, “Ducemseriya Realîzma Soayalîst di Romanên Erebe Şemo û Heciyê Cindî de”, *e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi*, 9(2), 2017, r. 644-661.

Binaxeya Realîzma Sosyalîst a felsefîk digihîje felsefeya marksîst, ya polîtîk digihîje tevgera Bolşevîzmê û ya estetîk û edebî jî digihîje Edebîyata Rûsî ya Klasîk. Binaxeya herî kevin a Realîzma Sosyalîst jî digihîje nivîskar, feylesof û rexnegirê Rûs N. G. Çernîşevskî (1828-1889) ku, ew li ser têgihîştina vê hunerê sekiniye û berhemên xwe li ser estetîka vê teorîyê daniye. Çernîşevskî, di 1855an de teza xwe ya doktorayê bi navê *Boçûna estetîk a hunerê ber bi rastiyê ve parastiyê*. Fikra sereke ya vê tezê ev e: “Ya xweşik, jiyan bi xwe ye.” Herwiha li gorî Çernîşevskî “jiyan, bi awayê ku em dixwazin wê bibînin xweş e.” Ev hevok, bi temamî binyada estetîka marksîst pêk tîne. Çernîşevskî, vê têgihîştina estetîka xwe di romana xwe ya bi navê *Şto Dyelat? (Çi Bikin?)* de xwestiyê bi awayekî pratîkî nîşan bide. Wî di vê romana xwe de hêza edebîyatê ya li ser sîyaset û perwerdehîyê destnîşan kiriye. Lehengê Çernîşevskî, ewil pirtûkan dixwîne xwe bi pêş dixê, piştê bi rêya edebîyatê, kesên derûdora xwe jî gelemşeyên jiyanê rizgar dike. Bi rêya lehengê xwe, fikrên xwe yên sîyaset û felsefeyê digihîjîne xwendevanan.¹²²

Binyada esasî ya Realîzma Sosyalîst, felsefe û îdeolojîya Marksîst e. Di berhemên afirînerên Marksîzmê, Marks û Engels de, digel ku li ser edebîyatê fikrên zêde tunene jî, dîsa di wê fikrê de ne ku guherîna şikl û naveroka berhemên hunerî bi guherîna civakê re hevîyek e. Herwiha ji bo Marks û Engels edebîyat, ji bo têkoşîna îdeolojîyê girîng e. Piştê ev fikr, ji gotara V. Lenîn ya bi navê “Teşkilata Partîyê û Edebîyata Partîyê” re bû sermijar. Ev gotara ku ji bo weşanên partîyê hatibû nivîsîn, demekê bi şûn ve di warê edebîyat û hunerê de dibe “Binyada Teorîk” a polîtîkayên Partîya Komunîst a Sovyetê. Li gorî Lenîn, nivîskarê ku dixwaze rastiyê têbigihîje, ne tenê yê xwe, herwiha fikr û hestên derûdora xwe û civaka xwe jî nîşan dide. Loma li gorî Lenîn, edebîyateke serbixwe û bêalî ne mimkun e. Ev boçûn, dibe binyada têgihîştina Edebîyata Sovyetê û Realîzma Sosyalîst jî li gorî vê fikrê tê sazîkirin. Herweha bingeha esasî ya vê têgehê jî, têgihîştina hunerî ya Marksîst-Lenînîst danî. Li gorî vê “Huner pêwîstiyên civak, çîn, komên estetîk û civakî bi cih tîne, şikil dide dinyaya menewî ya ferdan, norm û fikrên ku ji paşîla çandê derketine li ferdan belav dike.”¹²³

¹²² Leyla Tagızade, h.b., r. 10.

¹²³ Leyla Tagızade, r. 10.

Realîzma Sosyalîst ku bi Lenîn re di nav Edebîyata Sovyetê de belav dibe, ne bi awayekî tundewarî û zordarî ye, lê di dewra desthilatdarîya Stalîn de, Partîya Komunîst a Sovyetê rêyek tenê daye pêşîya nivîskaran, ku ew rê jî pesindayîna sîstema sosyalîzmê ye. Bi serkêşîya rêhevalê Stalin, Jdanov, edebîyateke partîperest tê avakirin.¹²⁴ Di hemû berhemana de îdeolojîya Sosyalîzm-Komunîzîmê serwer e. Yek ji armancên sereke ku tê qebûl kirin endazyarîya civakî ye. Afirandina welatîyên nû yên Sovyetan cihê herî giring digre di vê îdeolojîyê de.¹²⁵ Ev yek, vê gotina nivîskarê desthilatdarîya Stalîn, Karl Redek piştrast dike ku wî di “Kongreya Diyarkirina Rê û Rêbazên Edebîyata Realîzma Sosyalîst” de wiha gotiye:

*Rastî, ne ew e ku tenê hilweşîna kapîtalîzmê û çanda wê ya rizandî nişan bide, di heman demê de nîşandayîna civakeke nû û afirandina çîneke nû ye ku bi wê çînê çandeke nû jî bê afirandin.*¹²⁶

Jdanov, dîsa di heman kongreyê de li ser vê yekê wiha dibêje:

*Divê Edebîyata Sovyetê, bi lehengên erênî were têr û tijekirin. Bila ev, wekî xeyalekî utopîk neyê dîtin. Lewra ev leheng, insanên pêşerojê plankirî ne.*¹²⁷

Li gorî Realîzma Sosyalîst, rastîya ku di hunerê de ye, rastîya civakî ye. Ev rastî, di nav pêşketina şoreşê de tê dîtin û ji bo pedagojîya çîna karker tê bikaranîn.¹²⁸ Lehengên vê edebîyatê, ku ji bo perwerdekirin û terbiyekirina welatîyan hatine afirandin, bi cewherên payebilind hatine dagirtin. Ev lehengên ku fezîleteke polîtîk nîşan didin, dibin rêberê rêya rast û mînakeke bêhempa ji bo gel.¹²⁹

Bêguman, Realîzma Sosyalîst, bi awayekî berbiçav, hunerê wekî amûreke siyasî dibîne ku divê hem rastîya niha nîşan bide hem jî plansazîya paşerojê sosyalîst bike. Di vê çarçoveyê de, lehengên vê edebîyatê, bi taybetmendîyên îdeal û

¹²⁴ Berna Moran, *Edebiyat Kuramları ve Eleştirisi*, İletişim, İstanbul, 2009, s. 52.

¹²⁵ Haşim Ahmedzade, *Ulus ve Roman*, Pêrî, İstanbul, 2004, s. 49.

¹²⁶ Berna Moran, h.b., r. 54.

¹²⁷ Berna Moran, r. 61.

¹²⁸ Berna Moran, r. 53.

¹²⁹ Alan, h.b., r. 197.

erênî, ne tenê refleksa civakê ne, her wiha mînakên pêşeng ên ji bo guhertinê ne. Armanca bingeşîn ew e ku xwendevan, bi navgînîya hunerê, ji bo avakirina civaka nû ya sosyalîst bêne teşwîqkirin an jî perwerdekirin. Ji ber vê, em dikarin Realîzma Sosyalîst wekî rêbazeke perwerdehîyê jî bi nav bikin.

1.4.1. Têkiliya realîzma sosyalîst bi edebîyata kurdî ya êwra sovyetê re

Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê bi temamî li ser hîmên Realîzma Sosyalîst ava dibe. Di berhemên vê edebîyatê de, ji bo guherîna Kurdên vê herêmê, nasnameyeke ku bi nîrxên sosyalîzmê hatiye ristin, tê pêşkêşkirin.¹³⁰ Ji ber rêgezên Realîzma Sosyalîst, berhemên vê edebîyatê, hewla guherîna civakê di xwe de dihundirînin. Armanca van berheman, helbet ne tenê avakirina pergaleke nû ya civakî ye. Bêguman ew şahidê rabirdûyê ne jî û bi qasî ku di van berheman de em serkeftina tîpên erênî dibînin, em binkeftin û pûçbûna tîpên neyînî jî dibînin.¹³¹ Lewra li gorî rêgezên Realîzma Sosyalîst ev jî mecbûrîyetek e, ku xwendevan yanî civak têkeve nav wê bawerîyê ku sosyalîzm hebe serkeftin heye, ji xeynî wê her binkeftin e.

Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê, ne encamek vejîna neteweyî an jî pêşveçûnên çandî yên xwezayî ye. Ev edebîyat, di bin şert û mercên guncaw ên sîyasî û civakî de, bi alîkarîya dewletê, ji bo pêşketinê derfetan dibîne û berheman diafirîne, ku ev berhem jî, bi awayê fikrî, ji manîfestoya sosyalîzmê pir ne dûr in. Wekî nimûne em dikarin van berheman bi nav bikin, ên ku li nav Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê bi ruhê îdeolojîya Sosyalîzmê hatine nivîsîn û hişyarkirina gel ji xwe re kirine armanc; Romanên Erebe Şemo Şivanê Kurmanca, Jiyana Bextewar, Hopo û Dimdim, Romana Hewarî ya Heciyê Cindî, romana Kurdê Rêwî ya Sehîdê Îbo, romana Bawerî ya Ahmedê Hepo, romanên Eliyê Evdilrehman Gundê Mêrxasan, Xatê Xanim, Şer Li Çiya, romana Dê û Dêmarî ya Egîdê Xudo, romana Fîncana Ferfûrîyê ya Ezîzê Gerdenzerî.

¹³⁰ Mehmet Nur Yavuzer, “Panoramaya Nasnameya neteweyî di Romana Êwra Kavkazê de (1935-1991)”, Editor; M. Zahir Ertekin-Mehmet Yıldırımçakar, *Destpêka Romana Kurdî, Peywend, Van, 2020*, r. 55.

¹³¹ Mehmet Yıldırımçakar, “Bi Perspektîfa Hînwerîya Lehengên Erênî Tîpê Şoreşger ê Rûs di Romana Kurdê Rêwî ya Sehîdê Îbo de”, Editor; M. Zahir Ertekin-Mehmet Yıldırımçakar, *Destpêka Romana Kurdî, Peywend, Van, 2020*, r. 156.

1.4.2. Minetdarîya ji sovyetan re

Bi avabûna Sovyetan re, ligel milletên din, li nav Kurdên Sovyetê jî guhertineke mezin û sistematîk a çandî, aborî û civakî dest pê dike. Bi polîtîkayên fermî yên rêvebirîya Sovyetan, Kurd tevî çalakî û xebatên xurtkirina destkeftiyên şoreşê dibin. Ev civaka ku hertim stûxwar û bêderfet bûn, hatina Sosyalîzmê bi dil û can qebûl dikin û ji bo avabûna civaka nû li çareyan digerin, dixwînin, dinivîsin, dilîzin, dibêjin, berhev dikin. Wekî Îsmet Konak jî anîye ziman, Qamyona tijî ya qûrabîyeyan berê xwe dabû kuçeya Kurdan jî û Kurdan şoreşa Cotmehê bi kêfxweşî pêşwazî kiribûn. Şoreş, çawa ku li nav herkesî wekî rêya rizgariyê dihat dîtin, wiha li nav gundî û xebatkarên Kurd jî hatibû erêkirin.¹³²

Ji destpêka Şoreşê, sala 1917an, heta hilweşîna Sovyetan, Kurdên Sovyetê hemû gavên xwe li gorî rê û rêbazên fermî yên rêvebirîyên komarên Sovyetan diavêjin. Ew, di sazîyên dewletê de dixebitin û wekî berpîrsîyarên dewletê tevdigerin. Polîtîkayên tund ên dema Stalîn wekî meseleyeke şexsî dinirxînin û ji dewletê naxeydin. Wekî mînak em dikarin behsa Erebe Şemo bikin. Di dema rêvebirîya Stalîn de, nêzîkê nozdeh salan li Sîbîryayê sirgûn dimîne lê gava Stalîn dimre û vedigere, mîna ku sûncê kesekî din an jî Sovyetan bi xwe tunebe, dest bi nivîsandina berhemên xwe yên nû dike û wekî berê dîsa pesnê Partîya Komunîst û Sovyetê dide û minetdarîya xwe ji wan re tîne ziman. Helbet em dikarin sebebên cuda bibînin ji vê re. Ya pêşîn sansur e, ku bîyê destûra komîteyên kontrolkirinê tu nivîs nedihatin pêşîya xwendevanan. Ya duyem wefadarî ye. Wekî ku me di serî de jî got, hem di bin hukmê Osmanîyan de, hem di bin hukmê Împeratoriya Rûsan de tu mafê insanî yên Kurdan tunebûn, lê piştî Şoreşa Cotmehê, her tişt diguhere.

Di romanên Kurdî Yê Sovyetê de, tiştên ku zêde rastî me tê, yek jê minetdarîya ji Sovyetan re ye. Di van romanên de, gelek caran em dibînin ku nivîskar dev ji neqilkirina mijarê berdidin, dest bi pesindayîna dîwana Sovyetê, Partîya Komunîst, Lenîn û Bolşevîkan dikin. Vê yekê carna bi xwe, carna jî bi devê lehengên xwe dikin.

¹³² Îsmet Konak, *Sosyalist Kürtler*, s. 233.

Di romana *Hopo* ya Erebê Şemo de razîbûn û minetdarîya Kurdan a ji Sovyetê re, tim tê pêşberî me. Li gor vê pirtûkê, Kurdên ku di bin hukmê Osmanî, axa, beg û şêxan de rastî zilm û zordarîyê dihatin, bi saya Artêşa Sor azad bûne. Herwiha wefadarîya welêt li ber dilê wan çêdibe, ku teqsîr nakin li hember faşîstan can û ruhê xwe bidin. Di “şerê wetenîyê” de, ku ev şer di navbera Sovyet û Împeratoriya Almaniyayê de bû, jin, ji bo zilamên xwe yên ku diçin şer nagrîn, serûçavên xwe venarûn. Bereksê wî, ji ber ku mêrên wan dê ji bo “weten” şer bikin kêfxweş dibin.¹³³

Di destpêka romana *Jiyana Bextewar* de, berawirdîya ku di navbera Rom û Rûsan de tê kirin, piştî ku Kurd koçberî Sovyetê dibin, dibe berawirdîya Bolşevîk û Molşevîk, karker û milkedaran. Carna çardeh dewletên Emperyalîst ên Ewropê jî para xwe ji vê berawirdîyê distînin.¹³⁴

Li gorî Sosyâlîzmê perwerde, ji bo terbhêyekirina mirovan pêwîst e. Perwerde nebe, ne mimkun e hînkirina îdeolojîyê bigihêje serî. Mistoyê di van her du romanên de, Ereb bi xwe ye ku ewil golikvanî û wergêrîya zimanan dike, piştî dest bi xwendinê dike. Dê paşê jî bibe endamê Partîya Bolşevîkan, bixwîne, tezên Lenînê ku xwediyê milletê belengaz û kesîban e, hîn bibe û ji milletê xwe re bixebite.¹³⁵ Xwendina ku bi xêra Lenîn û Bolşevîkan dikeve nav Kurdan, dibe sedema hişyarbûnekê di nav Kurdan de, bi taybetî jî di nav jinên Kurd de. Dibistan vedibin, keç û xortên mîna Zînê û Hesen dibin xwende û ji gundên xwe re xizmetê dikin. Edetên berê yên xerab, wekî qelendayîn û bi zorê keçbirin an revandin ji holê radibin. Lewra keçrevandin ne şanê Komunîstan e.¹³⁶ Ew edeta ku, ji dêvla qelendekî mezin keçikeke ciwan bo zilamekî zewicandî, salmezin û têrpere dihat dayîn, kevin dibe. Mîna berê êdî xwediyê qîzan ne bav û birayên wan in ku wan bidine mêr, lê xwediyê qîzan dîwana Sovyetê ye.¹³⁷

Gava mirov van romanên dixwîne dibêje qey ew daxwaza welatekî serbixwe, ku di dilê her Kurdî de ji xwe re quncikek peyda kiriye, hatiye cih. Çimkî ew têkilîya

¹³³ Erebê Şemo, *Hopo*, Lîs, 2016, Diyarbakır, r. 18, 50.

¹³⁴ Erebê Şemo, *Jiyana Bextewar*, Deng, 1994, İstanbul, r. 164.

¹³⁵ Şemo, *J. Bextewar*, r. 154, 161.

¹³⁶ Şemo, *Hopo*, r. 246.

¹³⁷ Şemo, *Hopo*, r. 124

herrojîn, ya ku Kurd bi dewletên serdest re dijber in, li vir berovajî dibe. Kurdên ku di dîrokê de çîyayî, kovî, dijwar û serhildêr tînan nasîn, di navbera wan û dewletan de hertim şer heye, li vir bûne hezîr û minetdarê Sovyetê. Ji bo pêşketina Komunîzm û Sovyetê bi dil û can dixebitin. Ji bo Sovyetan, bi faşîst, axa, milkedar, daşnak, Emberyalîst û Kapîtalîstan re şer dikin, dibin eskerên sor, dikujin, birîndar dibin û tînan kuştin. Nahêlin zirar bigihêje Sovyetê. Lewra hemû hebûna wan bi saya Komunîzmê ye, bi wê pêş ketine û jiyana bextewar bi wê bûye para wan. Bi saya serê dîwanê, jiyana bextewar bi pakî berdewam dike û diçe.¹³⁸

Ev dîmênên dilsozî û welatparêzîyê, ku ji bo parastina destkeftîyên Sosyâlîzmê can tînan fedakirin, peyamên xurt dide xwendevanên ne Kurd jî. Bi vê yekê, ne tenê rewşa Kurdan a nû di nav sîstema Sovyetê de tê ronîkirin, herwiha peyama yekîtiya hemî mîletên Sovyetê di bin banê Partîya Komunîst de tê xurtkirin. Di van berheman de, ne tenê Kurd, lê hemî mîletên Sovyetê tînan temsîlîkirin. Yanî, Edebîyata Kurdî ya Êwra Sovyetê, di çarçoveyê berfirehtir de, esasen amûrek e ji bo hewldanên Partîya Komunîst, ku armanc jî çêkirina nasnameyê nû ji bo Sovyetê ye.

Di vê çarçoveyê de, Edebîyata Kurdî ya Êwra Sovyetê, herçiqas wareke hunerî be jî, ji ber hîmên Realîzma Sosyâlîst, wekî platformeke ragihandin û endezyarîyê ya sîstema Sovyetê kar kiriye. Berhemên wekî *Hopo*, *Jiyana Bextewar*, *Morof* û *Hewarî* ên vê edebîyatê, bi lehengên erênî yên bi nîrxên Sosyâlîzmê xemilandî, hem guhertinên civakî yên Kurdan di bin banê Sovyetê de nîşan didin, hem jî xwendevanan ji bo xebata bi dilsozî ya ji bo civaka nû teşwîq dikin, Bi vî awayî, hewl didin ku nasnameyê kolektîf a Sovyetî ava bikin.

¹³⁸ Mûrad Celalî, “Di romanên Erebe Şemo Jiyana Bextewar û Hopo de: Tîpên Şoreşger ên Romantîk”, *Nûbihar*, 126 (Jimara Taybet), 2014, r. 75.

BEŞA DUYEM

2. TÊGEHA "EMRÊ TEZE" DI ROMANÊN KURDÎ YÊN ÊWRA SOVYETÊ DE

2.1. Danasîn û Analîzeke Kurt

Her du romanên Erebe Şemo, *Hopo û Jiyana Bextewar*, wekî du cildên kitêbekî bîrî hesibandî, dê şaş çê nebe. Ji ber ku, ji hemî alîyan ve hev û du temam dikin. Di *Jiyana Bextewar* de, destpêkê em rastî ew jiyana baxtewar nayên lê gav bi gav amadehiya wê tê kirin û ew jiyana zor û zehmet a Kurdên Serhedê, ku di despêka pirtûkê de li ser wan hatiye sekinandin, êdî ber bi bextewarbûnê ve diçe. Li şûna neyînî û tundîyên salên berê, demên xweş û aram dest pê dikin. Şerê di navbera dewlet, karker û milkedaran de xilas dibe, jiyaneke nû dest pê dike. Kurdên ku li Sovyetê bi cih bûbûn jî, ji vê jiyana nû para xwe distînin û jê re dibêjin *Emrê Teze*. Di vê jiyana nû de ne şer û pevçûn, ne bîr û bawerîyên pûç, ne erf û edetên paşverû lê wekhevî, zanîn, aştî û kêfxweşî heye. Herwisa di *Hewarîya Heciyê Cindî, Morofa Eliyê Evdilrehman û Dê û Dêmarîya Egîdê Xudo* de em rastî van nîşaneyan tên. Di van romanên de ev dema nû, wekî muqayese li hemberî dema berê, ku di wê demê de hertim şer, pevçûn û birçîtî hebû, hatiye nîşandan. Hewildana nivîskarên van romanên li ber çav e ku dixwazin nîşan bidin ew demên şer, zilm û zorê li paş mane, êdî dema dema xebat û kirinê ye ji bo milletê xwe û diwana Sovyetê. Lewra divê wisa bê zanîn ku ev aramî û jiyana nû bi saya serê diwana Sovyetê bûye para wan.¹³⁹

Jiyana Bextewar, romana Erebe Şemo ya duyemîn e. Ev roman, cara pêşîn di 1959an de tê çapkirin. Di nav romanên Erebe Şemo de ya herî berfireh e. Nivîskar, jiyana êla Sîpkan dike navenda mijarê. Bûyerên dirokî ji xwe re dike paşxane û li ser vê fonê jiyana Kurdên herêma Serhedê û Sovyetê nîşan dide. Qehremanê sereke Emerîk e û bûyer li dora malbata wî û Kurdên vê herêmê pêk tên. Bûyerên di vê romanê de li pey hev diqewimin. Zêdebûna bûyeran, heta astekê dibe sedema tevlihevîyê jî. Rêyeke ji alîyê nivîskar ve kifşkirî, yan plankirî ku xwendevanan li pey xwe bibe, tune.

¹³⁹ Murad Celalî, h.g., r. 75.

Beşeke zêde ya romana *Jiyana Bextewar*, wekî mekan li devera Serhedê derbas dibe û bûyerên ku di romanê de cih digrin, bi temamî bûyerên trajîk ên vê deverê ne. Miletê li vir di nav tengasiyê de ye. Piştî ku berê xwe didin welatê Îrisan, hinekî din jî bi zehmetî û dijiwariyên jiyanê re rû bi rû dimînin. Lewra Kurdên ku ji şer direvin, careke din xwe li nav şer dibînin. Ev, şerê Bolşevîk û Monşevîkan e ku di dawîyê de Bolşevîk bi ser dikevin. Paşê, Kurdên koçber li gundan tên bicihkirin. Şertên jiyanê yên nû li ber wan tên raxistin. Dest bi karûbarên rojane dikin. Hîmên jiyana nû tê avêtin.

Jiyana Bextewar, bi temamî li ser hîmên Realîzma Sosyalîst hatiye nivîsandin. Lehengên erênî, ên di vê romanê de, kesên serkeftî û bêqisûr in. Ew xebatkarên bi heysîyet, paqij û zana ne. Ji bo heqî, pêşveçûn, edalet û dostaniyê şer dikin.¹⁴⁰ Ew, ne bi dilê xwe, lê bi hişê xwe yê îdeolojîk tev digerin. Di rewşên zehmet de jî, civaka xwe hêvîdar û bi cesaret dikin. Ew, tu caran ji armanca xwe û ji fikr û ramanên xwe dûr nakevin.¹⁴¹ Axa û milkedar jî ewqas zalim û tehdekar in ku, di dema xelayê de, wexta ku ji birçîna dest û lingên xelkê diwerimin û dimirin, jixwe li rewşa wan nafikirin, bi ser de jî dawetê dikin. Erebe Şemo, di *Jiyana Bextewar* de, bi van hevokan axa û kedxwer mehkûm kirine:

*Gava ku ji ber derê Resûl Axa bîna nanê petî û qeliyê kete nava gund, çend kesîb, jin û zarên birçî temûl nekirin, hatine ber mala wî. Ciyê qelî diqelandin dûr ve sekinîbûn stûyê xwe xwar kiribûn lê dinihêrîn. Waxtê te li wan meriyê birçî dinihêrî, ew pirçûkirî bûn, çavên wan çûbûne kort, dest û piyên wan werimîbûn. Ji dûr ve meriv tirê xurt bûne, hema ku meriv nêzîkî wan dibû, di hate xuyakirinê wekî ewana werimîne.*¹⁴²

Hopo, romana Erebe Şemo ya dawî ye. Mirov dikare *Hopo*, wekî berdewama *Jiyana Bextewar* bihesibîne, ji ber ku lehengên sereke yên her du romanên jî yek in û mijar hevûdu temam dikin. Lê *Hopo*, temayên wekî aramî û kêfxweşiyê bêtir di xwe de dihevin. Bûyerên li ser şer, pevçûn, tevgerên şoreşê, guherînên mezin, hilweşîn

¹⁴⁰ Boyîk, h.b., r. 137.

¹⁴¹ Betül Çoban, (2017). “Lehengên Erênî û Şoreşger di Romanên Kurdî yên Sovyeta Berê de”, *Wêje û Rexne*, 9/10, r. 122.

¹⁴² Şemo, *J. Bextewar*, r. 55.

û wd. ku di *Jiyana Bextewar* de cî digrin, di *Hopo* de tunene. Di *Hopo* de bûyer kêr, teswîra çîya û banî, newal û kanîyan zêde ye. Mekan, ne herêmeke berfireh, lê gundekî piçûk e, ku ev gund di bin hukmê Sovyetê de ye. Li gund, sîstema kolxozvanîyê hatiye avakirin û gundî bi awayekî serfiraz û jidil, di karên gund de dişixulin. Zilma beg, axa û şêxan ji holê rabûye. Jixwe serdema desthilatdarîya wan qedîyaye. Şerên giran li paş mane. Civak, di nav aramî û serfirazîyê de ye. Bi hatina sîstema Sosyalîzmê re, li nav civakê xwendin belav bûye. Ciwanên gundên Kurdistan diçin bajarên wekî Yêrêvanê, Moskovayê, Tiflîsê û li wir dest bi xwendina bilind dikin û diqedînin. Dibin bijîşk, mamoste, rojnamevan, endazyarê çandinîyê û hwd. û vedigerin gundê xwe. Li gundê xwe di xebata kolxozê de dibin rêvebir. Di vê romanê de, guherîn û pêşketina li nav civakê, ast bi ast û bi awayekî eşkere ye. Pergaleke nû ava bûye û ev pergal wekî kirasekî li civakê tê dirûtin. Bi hatina Sosyalîzmê re mercên jiyanê hêsan bûne. Gundî bi xwe dikin û bi xwe dixwin. Ew, ji xaniyên bin erdê derketine. Di hilberînê de teknîka herî pêşketî dixebitînin. Zarok tev dixwînin. Ji bo zarokên ku hê naçin dibistanê, bexçeyên zarokan hatine avakirin. Her wisa têkilîyên nav malbatê jî guherîne. Jin xwedîmaf û gotin in. Lehenga bi navê Zînê, mînaka guherîn û pêşveçûna jinan e. Ew keçeke sêwî ye, xwendîye û bûye endazyara çandinîyê û ji bo pêşveçûna gelê xwe ji dil û can dixebite.

Şemo, bi vê romanê, wêneyê jiyana gundên Kurdên li dora Çiyayê Elegezê girtiye, ku ew di bin hukmê Sovyetê de ne. Guherîn û pêşketina di civakê de qeyd kiriye. Xwezî û daxwazîyên ku di her sê romanên xwe yên pêşîn de ji bo jiyanê bextewar ji bo gelê xwe dikir, di vê romanê de bi dest dixe. Gelê wî jî, mîna her gelî azad dibe. Bi zimanê xwe dixwîne û keda xwe dide xwe. Loma ew her minetdarê vê pergalê û dîwana Sovyetê ye û bi devê lehengên xwe, ku di vê romanê de yek ji wan Morov e, vê minetdarîyê her gavê tîne ziman:

- *Werin em gişk kasên xwe vexwin eşqî Partîya Lenîn, eşqî Dîwana Sovêtê, ya ku azayî da me, em ji qetla Romê xelas kirin, ji destê wan axa, beg û miftexuran, ên ku em bi hesabekî bêpere ji xwe ra didane xebatê! Lê niha şikur hûn dibînin, em aza dijîn, êdî kesek me naşêlîne! Û niha*

*gelek cahilêd me, ên mîna Zînê û Hesên, dixebitin, çêdikin emrê teze, çêdikin deb û edetên teze.*¹⁴³

Di romana *Dê û Dêmarî* ya Egîdê Xudo de helbet em rastî nîşaneyên dema *Emrê Teze* tî, herwisa tê de berawirdîya edetên kevn û nû jî heye lê bereksê romanên din ên Kurdên Sovyetê, ew pevçûna di navbera axa, gundî, kedkar û dewletê de, ku diviyabû roman li ser vê bihata sazîkirin, jî xwe re cih nedîtiye. Em dibêjin “diviyabû”, ne ku ev xwestina me ye, jî ber ku nivîskarên romanên din bi tevahî jî vê pîrsgirêkê dest pê kirine, da ku mesajên xwe yê ku bi rêya berhemê didin, meşrû bikin. Xerabî tunebe, dê çawa behsa qencîyê bê kirin? Herwisa, lehengên kedkar ên ku li hemberî xerabîyan disekinin û jî bo welatê xwe, jî bo wekhevî, biratî û aramîyê bi dil û can şer dîkin, dixebitin, dixwînin û pîrsgirêkan çareser dîkin dê çawa bihatana peydakirin? Jixwe tê zanîn ku di berhemên Edebîyata Sovyetê de hertim du karakter hene; karakterên reş û sipî yanî baş û xerab. Karakterên baş, ku wekî “lehengên erênî” tî binavîkirin, nûnerên îdeal ên civaka nû ya Sovyetê tî dîtin, yê xerab jî wekî bermayîyên împeratoriye tî teswîrkirin ku ew astengên li pêş şoreşê ne. Ji bo lehengên erênî, wekî mînak yekem, em dikarin Pavel Vlasov nîşan bidin ku ew lehengê romana *The Mother* ya Maxim Gorki ye. Di destpêka romanê de, Pavel wekî ciwanekî bêdeng, xebatkar û rûken xuya dike, lê di dilê xwe de gelekî hêrs e li hemberî neheqî û pergala heyî. Bi rêya xwendinê û hevaltîya komên şoreşger, dinyaya wî diguhere. Ew li ser mafên karkeran û pêkanîna şoreşê têdikoşe û bi ramanên xwe derdora xwe hişyar dike. Gava ku ew alaya sor ya 1ê Gulanê hildide û li kolanan dimeşe, ew dibe wekî sembolekê. Ev çalakî ne tenê cesareta wî nîşan dide, lê di heman demê de wî wekî rêberekî karkerên din jî dide nasîn.¹⁴⁴ Bêguman, em dibînin ku Pavel Vlasov ne tenê karakterek e, ew felsefe û îdeolojîya şoreşger ya Sovyetê ye ku Gorkî bi rêya wî dixwaze nîşan bide ku kesekî sade jî dikare bibe rêberekî mezin û dîroka civakekê biguherîne. Karakterên wekî Pavel, ku ew fedakar, jîr, paqij û zana ne, bêguman ne bi dilê xwe, lê bi hişê xwe yê

¹⁴³ Şemo, *Hopo*, r. 259.

¹⁴⁴ Maxim Gorky, *The Mother*, Translated by Hugh Aplin, Alma Classics, 2015. r. 161.

îdeolojîk tev digerin. Di rewşên zehmet de jî, civaka xwe hêvîdar û bi cesaret dikin. Ew, tu caran ji armanca xwe û ji fikr û ramanên xwe dûr nakevin.¹⁴⁵

Di *Dê û Dêmarîya Egîdê Xudo* de ew xerabîya ku em behs dikin û mijar li dor wê diçe û tê, helbet bîr û bawerîyên pûç ên kevin in, ku gel amade ye wan terk bike û dewleta Almanayê ye, ku ew bi Sovyetan re di nav şer de ye. Bêguman, di vê romanê de wekî dijmin û neyarê gelan ji xeynî Almanayê, em rastî bawerîyên pûç tên. Ew erf û edetên ku li gorî nivîskar diviyabûn bîr terkîrin, hê berdewam dikin û dibin sedem ku pîrsgirêkên nû peyda bibin, lê aqilê Sovyetê çawa ku li hemberî hemû pîrsgirêkan disekine, rê li ber van pîrsgirêkan jî digre û mîletê xwe digihîjîne rehetîyê. Di meseleya Xwestina Sîsê bo Îsko (Saşa) de, em vê pîrsgirêkê û çareserîya wê gav bi gav dibînin.

Di vê romanê de wekî mekan em diçin gundekî Sovyetê, Mêrgesorê. Mêrgesor gundekî xweş û aram e. Karê, jineke ciwan e û li vir di sazîya êtîman de dixebite. Cemalê destgirtîyê wî, bi Artêşa Sor re çûye şerê Almanayê. Şevê, Karê, gava li mala xwe rûniştîye, jinikeke rûs tevî pitika xwe tê li derîyê wê dixê û jê re behsa halê xwe yê xerab dike. Roja din gava Karê diçe ser îşê xwe, jinika Rûs tevî nameyekê, pitika xwe li mala wê dihêle û diçe. Di nameyê de dibêje ez bêçare bûm û ez ê rojekî vegerim. Karê, hem pitika wê mezin dike hem jî piştî ku xebera mirina Cemal digre, bi Êsivê hevalê Cemal re dizewice. Êsiv jî mîna Cemal yekî baş e lê zewaca wan zêde dewam nake. Ew bi erebeyê xwe ya bergîran rêwîyan vediguhêzîne. Rojekê, gava bi hespên xwe re mijûl dibe, hespek pehînekê li sîngê wî dixê û wî dîkuje. Karê, dîsa bi tenê dimîne. Lawikê Rûs, ku navê wî Saşa ye, ji xwe re mezin dike û hemû jiyana xwe pê ve girê dide. Gundî ji Saşa re dibêjin Îsko. Gava mezin dibe, wekî yekî jîr û jêhatî tê nasîn. Dil dikeve Sîsê. Ji ber ku Rûs e lê ne Êzîdî ye, dê û bavê Sîsê jê ne razî ne, lê gundî dixwazin miradê wan çê bibe, ji ber ku li gorî wan ferqa xortekî Êzîdî û Îsko tune. Ji dê û bavê Sîsê re dibêjin "Erê Îsko Rûs e lê Rûs ne mîletê xerab in, bi xêra wan em gihîştîne rehetîyê, herwisa Îsko bi xwe li nav Kurdan mezin bûye û ji ciwanên Kurdan bêtir rabûn û rûniştin, erf û edetên bav û kalan dizane". Miradê herdukan çê dibe û çend roj paşê dêya rastîn a Îsko, bi mîrê xwe yê nû û keça xwe ya

¹⁴⁵ Betül Çoban, 2017, Lehengên erênî û şoreşger di romanên Kurdî yên sovyeta berê de, *Wêje û Rexne*, 9/10, r. 122.

piçûk re tê gund. Wekî ku di nameyekê xwe de gotibû, Cemal û bavê Saşayê wî li Ûkraynayê li kêleka hev şer kirine û gava mirine, wan bi hev re binax kirine, gotina xwe dubare dike û tevî Îsko, Sîsê û Karê vedigerine Ûkraynayê. Piştî çend rojan, Karê vedigere gund lê Îsko û Sîsê, bi alîkarîya mêrê dêya Îsko, bo xwendina bilind diçine Petersbûrgê.

Di *Morofa* Eliyê Evdilrehman de wekî dîmenên pêşîn, helbet dîmen û bûyerên devera Serhedê tên pêşberî me. Şer û pevçûnên şexsî û civakî, têkilîyên axa, beg û dewletan, feqîrî, hejarî, zilm û zorî, tehde... Kêlîyek aramî, parîyek nan hesreta gelekane e. Lehengên me yên şoreşger û fedakar Morofê şivan û hevalên xwe ne, ku ew ê bi vîn û xebata xwe ya xurt, insanên dora xwe bigîjînin bextewarîya li nav axa Sovyetê. Morof, xortekî jêhatî ye û şivanê Xalit Begê ye li devera Bidlîsê. Rojekê ji Xalit Begê lêdaneke giran dixwe û bi alîkarîya hevalên xwe, ku Şemo jî yek ji wan e, lê dixê diçe zomeke din, cem Memo û Eyşê, ku ew jî feqîr in, wekî Morof xizmetkarîya Selîm Begê dikin digel sê keçikên xwe. Morof li cem wan dimîne û bi Memo re diçe ber pez. Çend sal şûn de bi keça wan Nûrê re dizewice. Ji ber ku dengê wî xweş e, dibe dengbêjê Selîm Begê. Gava ku ev bûyer diqewimin, Morof xeberên şerê kedkar û dewlemendên Împeratoriya Rûsyayê li nav şivan û xizmetkarên Selîm Begê digerîne. Ew û hevalên xwe, feqîr û bindestîya xwe hergavê bi lêv dikin, hêvîya jiyaneke xweş li nav erdê Rûsan dikin. Biryara xwe didin, plana xwe dikin û tevî gelek malbatên zoma Selîm Begê direvin diçin Ermenîstanê, hêla Elegezê. Li vir çîroka Morof diqede û bi çîrokeke din pirtûk berdewam dike. Ev çîrok, li ser temaya bextewarîyê hatiye sazkirin. Rojên zilm û tehdayê li paş mane, Kurdên Kavkazê ketine bin perê Sovyetê, loma di nav rehetîyê de ne. Silêmanê nexweş, piştî ku rojên berê ên zilm û zordarîyê tîne bîra xwe, ji niha re şikur dike û spasîya xwe li Partîya Komunîst û Lenîn dike, bo ku ev derfet dane wan. Lê xeyaleke wî heye û berî ku bimre dixwaze bi lêz pêk were. Xeyala wî ev e, zarokên xwe Mehmed û Kewserê bide ber xwendinê. Helbet, piştî ku dimre ev xeyala wî pêk tê. Dayka Mehmed û Kewserê, Mirdêsî, xeyala mêrê xwe ji bîr nake û zarokên xwe dide ber xwendinê. Ew jî xwendina xwe bi serkeftî تمام dikin û ji bo xizmeta milletê xwe û Sovyetê dest bi kar dikin. Helbet ew ne bi tenê ne, em dibînin ku gelek ciwanên gund êdî bûne

xwende û ji hev re nameyan dişînin. Dilê xwe li nav gul û çiçekan, li ber av û baya hênîk a xwezaya Elegezê ji hev re vedikin, evîna xwe eşkere dikin.

Hewarîya Heciyê Cindî, ji du beşan pêk tê. Beşa yekemîn wekî bîranîn e û tê de behsa serborîyên xwe yên ku li nav Kurdên Sovyetê digere dike. Ew di vê beşê de li pey çîrokên berîya Sovyetê digere û bi çend şahidan re hevdîtinan dike. Ji wan şahidan yek jê Apê Şewêş e û yê din hevalê Apê Şewêş, Moskov e.

Ji axaftin û nîşaneyan, em fam dikin salên destpêkê ên Sovyetê ne. Kurd, ji şer û pevçûnan xelas bûne, bi kar û barên xwe yên rojane re mijûl dibin, jiyanêke aram û bi xebathezî dijîn. Birînen salên borî tîr dermankirin, kêmasî tîr temamkirin û îmkânên berdest tîr zêdekirin. Bi qalkirina bîranînan, car caran em diçin serdemên berî sovyetan, dîmenên êş û tehdeyan li pêşberî me rêz dibin.

Di beşa duyem de, nivîskar berê me dide herêma Îdir û Qersê, berî avabûna Sovyetan. Em jîyan û tevgerên wê demê ên el û eşîrên Kurdên wê herêmê, bi taybetî yên malbata Emerîkê Axê û her du zarokên wî Elî û Egîd dibînin. Têkilî û tevgerên Êla Sîpkan û Hesenîyan, ge bi hev re ge jî bi derdorê re, wekî êlên din an jî bi Rom û Rûsan re dîsa dibin mijara vê beşê. Şer û pevçûnên wê demê, koçerî, hezkirina xort û qîzan, danûstendina axa û began bi hev re an jî bi gel re wekî çîrok li ber me tîr raxistin. Di dawîya beşê de nivîskar berê me dide jiyana şoreşgerê navdar Fêrik... Çawa ji bo gelê xwe dixebite û di nav şoreşê de bi çi awayî cih digre. Divê em bînin ziman, beşa duyem çawa ku çîroka serborîyên êla Sîpkan û Hesenîyan be, bi vê re jî çîroka sê nîşên malbatekî ye, ya mala Emerîkê Axê ye. Dawîya van serborîyan bi avabûna Sovyetan tê. Malbata Emerîkê Axê û êlên din ên Kurdan, bi hev re, bi zor û zehmet derbasî erdên Ermenîstanê dibin û li wir li bendî hewarîya eskerên Sovyetê disekinin. Lê heta demekî li wir jî rehetîyê nabînin, ji ber ku eskerên Osmanîyê didin pey wan û şevêkî diavêjin ser konan, mîrên êlê, herwisa Elî Axa bi îşkenceyan dikujin.

Têgeha *Emrê Teze* di rastîya xwe de têgeheke îdeolojîk e, ku ji hêla amûrên propagandayê yên Sovyetê ve gelek caran hatiye bikaranîn. Bi vê îdeolojîyê armanc e ew bû ku, jiyanêke nû yanî taze li pêşberî gelên Sovyetê ye. Ji bo vê jiyana nû, divê herkes bi dil û can ji bo dewletê bixebite, biafirîne û bi dijminên Sovyetê re şer bike.

Herwisa cihê bîr û bawerîyên dînî, çandî û edetî ku wekî paşverûtî tên hesibandin, di vê jiyana nû de tune.

Rûdanên fikra *Emrê Teze* li seranserê Sovyetê, herwisa li nav Kurdên Sovyetê pêk tê. Gelên Sovyetê li gorî vê fikrê tên dîzaynkirin û birêvebirin. Kar û xebat, hêvî û daxwazên wan li gorî babetên vê têgehê şikl digrin. Jixwe ji ber vê yê ku, berhemên xwe jî li dorê vê fikrê ava kirine. Nîşaneyên vê dema *Emrê Teze*, ku di hemû qadên jiyana mîletên Sovyetê de, herwisa Kurdên Sovyetê de bi cih bûye, ji hemû alîyan ve dertên pêşîya me. Di metnê û berhemên Kurdên Sovyetê de, ji hunerê bêtir em rastî van nîşaneyan tên ku ew delîlên mezin ên veguherîna vê civakê ne. Ev veguherîna civakî û nîşaneyên fikra *Emrê Teze* zêdetir di van waran de tên xuyakirin, ku ew war bi xwe jî babetên girîng ên civakê ne:

2.2. Xwendin, Perwerdehî û Zanyarî

Berîya şerê yekem ê cihanê û di dema vî şerê de, li hêla Serhedê û Kavkazê tu îmkaneke Kurdan tunebû ku rêya wan bi xwendinê û dibistanan bikeve, lê piştî ku Bolşevîk bi ser dikevin û Sovyeta sosyalîst ava dibe, rêya xwendinê li ber Kurdan jî vedibe. Çawa ku xwendin wekî mafê herkesî tê qebûlkirin, wisa mafê Kurdan jî tê dîtin. Li nav gundên Kurdan dibistanên bi Kurdî tên vekirin, mamosteyên Kurdîzan tên wezîfedarkirin û pirtûkên dersan ên bi Kurdî tên amadekirin. Herwisa li Yêrêvan, Moskov û St. Petersburgê beşên Rojhilatnasîyê û di bin banê wan de beşên Kurdnasîyê tên vekirin. Gelekî zarokên Kurd, ku hinek ji wan êtîm in, li van dibistanên gundan hînê xwendin û nivîsandinê dibin, paşê diçin bajarên Sovyetê û di beşên bilindtir de dixwînin. Paşê vedigerin gundê xwe û wekî berpirsiyarên dewletê zanîna xwe bi gundîyên xwe re parve dikin. Em dikarin bibêjin romana *Hopo* bi temamî li ser vê pergala xwendinê ya Sovyetê hatiye nivîsandin. Di romana *Hopo* de, bikerên sereke ên vê pergalê bêguman *Hesen* û *Zînê* ne. Wekî me li jor qala vê rêbazê kir, ew pêşî li gund, paşê li bajarê dixwînin û pişt re diçin vedigerin gundê xwe, lê îja ne ji bo xwendina dibistanê, helbet ji bo hînkirinê û xîzmeta civaka xwe. Gelo sedema vegera wan bi tenê ew e? Naxêr, ew êdî dibin qasidên diwana Sovyetê û wekî mînakên baş ên vê pergalê li nav gelê tên bicihkirin. Divê ew bi dil û can bixebitin, da ku gel jî çav li wan bikeve û wekî wan bixebite, pê re pê re jî hînê pergala Komunîzmê bibe. Jixwe wisa jî dibe, lewra di romana *Hopo* de gundî her roj hinekî

din zêdetir dixebitin û di rola karkerên hilberîn û berhemdarîya ji bo Sosyalîzmê de, her carê hinekî din jêhatîtir dibin.

Di *Jiyana Bextewar* de, piştî ku Kurd koçî xaka Gurcîstan, Ermenîstan û Împeretoriya Rûsyayê dikin, berîya ku Sovyet ava bibe, Sehîd û bavê xwe Emerîk ji bo xebata rojane diçin Tiflîsê. Li wir, Sehîd ji hevalên xwe dibîne û cara yekem daxwaza xwendinê dikeve dilê wî, lê gotineke wiha xerab jê re tê gotin, ji aliyê xwedîyê pastexaneyê ku tê de dixebite:

- *Wekî tu bixûnî, lê kê bixebite? Ancax pera qezenc kî xwe xweyî kî. Perê bavê te hene, wekî te bide ber xwendinê? Ji wê şûnda Kurd gişk hemal in, xulam in û dergevan in, çi te, çi xwendin e.*¹⁴⁶

Ev gotin Sehîd diêşînin. Sehîd dilê xwe ji bavê re jî vedike, bav wiha dibêje û bi gotinên bavê re nîyeta nivîskar jî eşkere dibe:

- *Lao, xwendin tiştêkî zef pak e, lê em nikarin ewqas pere destxin bidne heqê xwendinê. Tereqê me jî dibên: “Xwendin ji me ra gune ye” nizam çima hemû mileta ra ne gune ye, her me ra gune ye? Bi aqilê min ewê ku xwendinê ji me ra kiriye qedexe, ew dijaminê me ye. Ewî çima ew tiştê pak kiriye qedexe?*¹⁴⁷

Piştî ku Bolşevîk bi ser dikevin, Sovyet ava dibe, rêya xwendinê çawa heqê her gelî be, wisa dibe heqê Kurdan jî. Daxwaza Sehîd tê cih. Ew jî wekî hevalên xwe yên ji milletên din dest bi xwendinê dike:

Ew meremê ku Sehîd ser bû, şev û ro li ser difikirî, lê ew çend sal bûn nedihate serî, îcar hate serî. Ewî jî her bi saya partîya bolşevîka. Ew partîya ku rê û hemû derge vekirin û hemû zehmetkêşa ra, usa jî vekir bona Kurdêd zehmetkêş, ê gele sal û zemana çetinî û zelûliyê da bûn, bin

¹⁴⁶ Şemo, *J. Bextewar*, r. 183.

¹⁴⁷ Şemo, *J. Bextewar*, r. 183.

*nîrê siltanê Romê û şahê Îranê, usa jî bin nîrê bega, axa û şêxê milkedar.*¹⁴⁸

Herçiqas bi xêra Sovyetê di warê xwendin û zanyarîyê de bayê guherînê li nav Kurdan werzîyabe jî, li derve, fikrên derbarê xwendin û pêşketina Kurdan, bi temamî wekî berê ne. Di trêne de, piştî ku Şehîd xwendina xwe diqedîne û dikeve rê bo vegera malê, rastî kalekî tê. Sohbetek wiha di navbera wan de çê dibe, ku xuyaye ew “kalê berê” di wextê xwe de pir Kurd dîtine, lê niha cara yekem Kurdekî xwende dibîne, loma şaş dibe:

- Heval, ez dibînim tu diqicqicî û lez î?

- Belê heval ez î lez im!

- Hûn meriyê kîderê ne?

- Ez meriyê Kavkasê me.

- Dibe hûn ermenî ne?

- Naxêr, ez ne ermenî me.

- Dêmek hûn gurc in?

- Naxêr, ez ne gurc im jî.

- Pey, erê, erê hûn adêrbêcan in.

- Na, ez ne adirbêcan im jî.

- Bisek, wekî usane, hûn mi ra rast nabêjin, ez li bajarê Qersê û Tibilîsê salêd 1910 a heta 1917 a mame, min li wê derê qulix kiriye û miletê Kavkasê tevî nas dikim, lê tu çî milet î?Şehîd got:

- Ez Kurd im.

¹⁴⁸ Şemo, J. Bextewar, r. 189.

Kalê devê xwe vekir, çav beliqandin, berçavkê xwe rast kirin, li Sehîd û kince wî nihêrî, got:

- Hûn mi ra rast nabêjin, berî ewlîn, ew kince li te, ew xeberdana we kivş nake, wekî hûn Kurd in, ya duda jî çi şuxulê Kurda Lênîngradê heye? Çi qewî hûn hatibûne Lênîngradê?

Sehîd wê xeberdana kalê ra texmîn kir, wekî ev kal ji qewrê berê ye, hê tek tek peyda dibin, ewî kalê ra şîrove kir, wekî rastî jî Kurd e, înstîtu kuta kiriye û wê niha here gundê xwe da bixebite. Lema lez dike.

Kalê got:

- Weleh min qe bawer nedikir, wekî Kurd jî bene Lênîngradê.

Sehîd wa qurbetî got:

- Erê, geleka bawer nedikirin, wekî Kurd jî bêne Lênîngradê, lê bi saya Partîya Komunîst û dewleta Sovêtê niha Kurd jî têne vî bajarê mezin.¹⁴⁹

Bi avabûna Sovyetê re, xwendeyên Kurdan her ku diçe zêdetir dibin. Ciwanên Kurdan, li bajaran dixwînin û berê xwe didin gundê xwe, da ku ji bo gundê xwe bixebitin, gundê xwe bi pêş bixin. Me gotibû di *Hopo* de Hesên û Zînê, vî barî hildigrin ser milên xwe. Ew, piştî xwendina xwe dibin agronomê (muhendîsê zîreetê) gundê xwe. Bi dil û can dixebitin da ku gundê xwe, miletê xwe û dîwana Sovyetê bi pêş bixin. Bereksê Hesên û Zînê, yên ku xwendina xwe kuta dikin û venagerin gundê xwe jî hene, ku ji van kesan yek jê hevalê Hesên, Letîf e. Letîf, di nameyeke xwe de, ku ji bo Hesên dişîne, ji Hesên dixwaze ku ew jî neçe gund, lê Hesên di bersiva xwe de van gotinan dibêje:

- Ez dizanim tu yê bibêjî ezî şaş im. Lê ez ne şaş im, ew zanîna ku min stendiye, lazim e bidim gund... Letîf, hinek cahilên me ji gundan çûne şeheran, hînê xwendinê bûne û di şeher da hema wisa mane, êdî venagerin, nayên gund. Ji te tirê wan tiştêkî pak kiriye? Tê bîra te, em

¹⁴⁹ Şemo, J. Bextewar, r. 203.

*çûn Moskovayê seyrangehê, me bi çavên xwe dît çiqas cahil komsomol, xwendekar, kur û keç diçûne Sibîryayê, Qazaxistanê û Altayê, ne li wan garan bi hezaran cahil bûn, ên ku diçûn bixebitin? Çima em jî ne komsomol in?*¹⁵⁰

Em dizanin ku di berhemên Realîzma Sosyalîst de, nivîskar dikevin rola endezyariyê û bi devê karakterên xwe an jî bi tevgerên wan, rê li ber civakê dixin. Di romana *Hopo* de xwendekarekî û hevalekî mîna Letîf heye, ku ji nameyên di navbera wî û Hesên de em fam dikin, ew serê xwe bi rewşa civakê naêşîne û bi tenê li kêfa xwe dinêre, loma rastî bertekên tund ên Hesên tê. Di vê romanê de hebûna Letîf zerûriyetek e. Li gorî teoriya Realîzma Sosyalîst divê yekî wekî Letîf teqez hebe da ku xwendevan fikrên Hesên (a rast fikrên nivîskar û jê wêdetir polîtîkaya xebat û perwerdehiyê ya Sovyetan) ên derbarê xebata piştî perwerdehiyê de bibihîsin.

Hesên di nameyeke din de, ku wê jî ji bo Zînê dişîne, zelaliya xwe ya di fikra xebata ji bo gund de xurt dike û di dawîya nameyê de vê wekî wezîfeyekî pir girîng destnîşan dike:

*...ez çawa komsomol im, wekî gaziya partîyê neqedînim, neçim gundê me Kurdan, li kê derê zanîna ku min bi saya partî û dîwana Sovêtê standiye, niha gelekî lazim e, bidim gundê me.*¹⁵¹

Helbet em dizanin ev name jî, herçiqas Hesên nivîsîbe jî, bersiveke din ya nivîskar e, ji bo fikrên neyînî yên vê derbarê de.

Di romana *Hewarîyê* de, di beşa yekemîn de, lehengê me yê sereke ku ew vegêr e jî (û herwisa tê qebûlkirin wekî ew nivîskarê romanê Heciyê Cindî bi xwe ye), yekî xwende û zana ye. Ew li Yêrêvanê dijî, derdora wî, nas û dostên wî profesor, xwendekar, nivîskar û edîb in. Ji bo tomarkirina serpêhatî û bûyerên ku berîya Sovyetê li nav Kurdên Serhedê qewimîne, berê xwe dide gundekî bi navê “Kûrekend”ê, ku ew gund bi ser Yêrêvanê ye. Kûrekend, gundekî şên û ava ye. Şênîyên wî, bi kar û barên xwe yên rojane re mijûl in. Ê ku şivan be bi pezê xwe re, ê

¹⁵⁰ Şemo, *Hopo*, r. 87.

¹⁵¹ Şemo, *Hopo*, r. 73.

ku gavan be bi dewarên xwe re û yê ku cotkar be bi erdê xwe re mijûl e. Jin bi kar û barên malê re, mamoste û xwendekar jî bi xwendin û zanînê re mijûl in. Li gund dibistanek heye û perwerdehîya tê de bi Kurdî û herwisa bi zimanên din e. Hema bêje hemû Kûrekendîyan li vê dibistanê xwendine:

*Cimeatê xwe li xwendinê girtiye, li kûltûrê, li ronahiyê. Ê va ye, hema ev gundê me Kûrekend, li vê derê, herçî bû cahil -qîz be, kur be- kesekî nexwendî tune. Li her malekê, kitêb hene, qelem, kaxiz û têne pesinandin ew mirovên ku rind dixwînin, di xwendinê da li pêş in, gelekî dixwînin û bi gelek zimanan dizanin.*¹⁵²

Di gund de hinekan, ku yek ji wan Rizalîyê Reşîd e, xwendina xwe di nivî de hiştine û hinekan jî, ku yek ji wan kurê Rizalîyê Reşîd bi xwe ye û yê din jî kurapê wî Keleş e, heta dawîyê çûne û xwendina xwe bi serkeftî temam kirine û li cihên payebilind dixebitin, dersan didin xwendekarên xwe. Rizalîyê Reşîd, ji ber ku xwendina navî û ya bilind bi dest nexistiye li ber xwe dikeve û pê diêşe, lewra ew di wê bîrê de ye ku hikûmeta Sovyetê ji bo xwendinê her mecal û îmkân daye wan. Yanî di vir de sûncê hikûmetê tune, guneh di stûyê wî de ye:

*...lê ne axir min bi xwe jî dixwest kûrahîya zanînê bi dest bianîya, axir hukimetê her mecal û mekan dane me ji bo bipêşdeçûyînê, zanebûnê.*¹⁵³

Gava serlehengê me diçe gund, şênîyê kal ê gund Apê Moskov nas dike û bi hev re rûdinin, Apê Moskov qala bîranîn û serpêhatîyên xwe dike û derheqê perwerdehî û zanyarîya civakê de agahîyan dide. Ew û lehengê me, di vê mijarê de dikevin sohbetake kûr û navê hin kesên xwende ku bi xebat û berhemên xwe yên Kurdî em wan ji Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê jî (Cerdoyê Gêncî, Egîdê Xudo) nas dikin, bi bîr tînin. Bêguman, gava Apê Moskov û lehengê me diaxivin, ew minetdarîya xwe ya ji bo dîwana Sovyetê jî ji bîr nakin û di vê sohbeta xwe de her bi lêv dikin:

¹⁵² Heciyê Cindî, *Hewarî*, Lîs, 2008, Amed, r. 35.

¹⁵³ Cindî, *Hewarî*, r. 35.

- *Erê lawo, -wî got,- ez tevîhev bûm, min xwe winda kir Baweriya te hebe, heke ew êtîmxane nîn bûya, ew zarokên din jî wê ji destê me biçûna. Dîwana Sovêtê ew xelas kirin ji birçîbûnê, ji xolor û mirinê. Herçî hukimetê xweyî kirin, givrik bûn, derketin nava emir, bûn xweyî mal û nav. Berra, ez dibê'm te nas dikir, hema yek Cerdo bû.*

- *Cerdoyê Gêncî, dêmek li wê derê bûye?*

- *Lê çawa, -wî got, - du bira jî bi wî re bûn, yek Fêrîk, ew mir, lê ê din û xwîşka wî Tazo hê hene.*

- *Cerdo, -min gotê,- li nava cimeata me, zilamekî gelekî hezkirî bû, bi saya merîfetên xwe ew qas bi pêş de çû, wekî bû redaktorê gazêteya Riya Teze, bû nivîskarekî Kurdên Sovêtiyê yê berbiçav û gelek şuxul kiriye ji bo bipêşdebirina literatûra cimeata me. Lê heyf, hê di xemla xwe de temirî û hesreta emir di nava çavan de, ji vir deh sal berê vîsiya çawa çirayeke bêdon.*

- *Sed heyfa wî zîlamî, - qisekirê min got,- lê gelo jin û zarokên wî çawa bûn?*

- *Kurekî wî sala tê li Livovê Înstîtûta Ekonomiyê kuta dike, yekî din di dersxaneyê heştan de dixwîne.*

- *Dêmek warê wî şî e?*

- *Belê!*

- *Ê erhemdilah şukir, - wî got û bi dest xwe re sêwiyekî wê êtîmxaneyê yê din, Biro, anî bîra xwe, wekî heylo çû Lênîngiradê, xwendina xwe hilda û hat bû dîrektorê Têxnîkûma Kurdan a Pêdagogiyê li Yêrêvanê, - ew jî niha tune-wî di ber xwe de got,- lê ez dibê'm keçika wî jî niha mezin bûye, wisa nîn e?*

- Wisa ye, -min got,- qîzika wî Rîma li Înstîtûta Zoovête de, di kûrsa çaran de dixwîne, zûtirê wê bibe doxtira heywanet.-Çi rind e,- şabûyî wî got,- lê gelo jina wî, Hesreta Mîrze çawa bû? Ne axir ew jî tevî gelek qîzikan dîsa di êfîmxaneyê me de mezin bû, tê bîra min, teze diranên xwe diguhest.

- Wê çawa be?! -min gotê,- di pey Nûre re ew bi du sê hevalên xwe yen din ve di nava kulfetên Kurdan de bûn xwendiyên pêşîn, Têxnîkûma Kurdan a Pêdagogiyê kuta kirin, bûne dersdar û terbiyetdarên zarokan. Êdî wê çawa be?

- Belê, belê, giliyeke xweş e, -wî xebera xwe ducar kir,- Dîwanê ew kirin meriv, çi qas rind e, gava ku xeberên wiha dibihêyî.

- Lê wekî din êdî kê nas dikî?

- Gelek bûn, -wî caba min da.- hene kolxozvan, pale, dersdar, hema yek Xudo ye...

- Xudo dersdar nîn e, -min gotê,- ew niha li Moskovayê ye, Çawa ilimdar li Akadêmiya Ilman de, di Dereceya Zimanê Kurdî de dixebite.

- Berra?

- Belê.

- Maşelah, -wî bi dengê wisa bilind got, wekî nêriyê li pêşiya me silikî.- Gava ku tu wiha dibêjî, -wî giliyên xwe bi pêş de bir,- hatin bîra min xeberên Elîxanê Serdêr, wekî li vir, di nava me de dersdarekî li pêş bû.

- Ew jî li cem we xebitiye? Sed korayî, di salên xwe yê paşîn de ew ji çavan belengaz bû û li Samîramê mir.

- Korayî bi dijminê te de bê, -wî got,-erê lê, ew jî li cem me dixebitî, sifte dersdar bû, paşê bû serwêr. Wî gelekî jî zarokan hez dikir, gunehê xwe bi wan diani, digot, "Ez hew dizanim zarokên min in." Gelek caran nan di

ber de nediçû, dianî dida zarokên nexweş, ên biçûk î bêsihet. Erê, carekê jî, tê bîra min, wî û Nûrê ji min re gotin, "Moskovo, gidiyo, miqati van tifalan be, wextê wê bê, ku ew ê rabin, ji xwe re bibin malavayî û wê eseh te bi bîr bînin."

*- Ew zarok ne ku bi tenê rabûne bûne malavayî, lê hinek ji wan bûne xebatkarên gelekî berbiçav, hinek jî, çawa min bi bîr anî, bûne hîmdarên lîteratûra û kûltûra Kurdan a Sovêtiyê. -min bi dileşq gotê.- Diwana me per û bask da wan û hezaran, hezarên mîna wan bi firê xist. Lê kirina Elîxan û Nûrê, ya we gişan tu caran ji bîra me naçe, apo!*¹⁵⁴

Di berdewama vê sohbetê de em rastî navekî din jî tên, ku ew jî ji bo Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê navekî pir girîng e. Wî, di salên ewilîn ên Sovyetê de, digel Ahmedê Mirazî, ji bo zimanê Kurdî, bi tîpên Latînî pirtûkeke dersan bi navê *Şems* amade kiriye. Herwisa li dibistan û êtîmxaneyan dersên Kurdî daye û gelek xwendekar li ber destên wî mezin bûne û di warê zanyarî û edebîyatê de serkeftine. Helbet ew kesê ku di vê sohbetê de behsa wî tê kirin, dostê Kurdan ê ermen Agop Xazaryan e ku li nav Kurdên Sovyetê wekî *Apê Lazo* dihat naskirin.

Di beşa yekemîn a romana *Hewarîyê* de mîna ku bîranîn, yanî bûyerên rastî û çîrok tevlihev bûne. Vegêr ti carî xwe eşkere nake ka ew kî ye, lê kesên ku pê re diaxivin wî nas dikin û hurmetê didine wî. Ev jî tenê nivîskarê romanê *Heciyê Cindî* tîne bîra me, lewra jiyana wî jî bi temamî bi vê şeweyê derbas bûye. Bi salan li gundan gerîyaye û li nav civatan rûniştiye, berhevkarîya nimûneyên folklorîk kiriye. Xuyaye Heciyê Cindî herçiqas bi nav xwe tevî vê romanê nekiribe jî, ew bi bîranînên xwe di nav de ye. Ev hêla rastî ye, lê çîrok li ku derê ye? Em dikarin bêjin çîrok jî çîroksazîya romanê bi xwe ye. Helbet gotinên ku ji devê hin kesan tên neqilkirin jî. Mîsal, gava Apê Moskov û lehengê me (vegêr) qala Agop Xazaryan dikin, em ji devê Agop Xazaryan van fikrên wî yên derheqê xwendin û Sovyetê de hîn dibin û vê pirsê ji xwe dikin “Bi rastî jî ev gotinên Agop Xazaryan in û nivîskar wan wekî bîranîn neqil kiriye an nivîskar xwestîye ya dilê xwe bêje û Agop Xazaryan wekî berdevkê dilê xwe bi kar anîye?”:

¹⁵⁴ Cindî, *Hewarî*, r. 42.

- *Gelî zarên delal, kur û qîzên min, gelî qulixdaran, xwişk û birayên şêrîn, gava ku min hûn dîtî, lingên min erd negirtin. Êdî roja we xweş vebûye. Dîwana xebatkaran temamîya cimeatan azad kir ji her tehlî û tengiyan, emir anî, emir da me. Ê ew nivîsara ku vê qîzika hane ew qas xweş got bi zimanê Ermenkî, zûtirê wext ê bê, wekî şairên Kurd wê tercume bikin û hûn ê bi zimanê xwe jî nivîsarên şairê me yê hezkirî Hovhannês Tûmanyân bixwînin û jê hîn bibin. Lê îro ez dixwazim we bimbarek bikim û şa bikim bi kitêbeke teze, wekî bi zimanê we ye.*

.....

- *Ji vî aliyî wiha de hûn ê êdî bi zimanê diya xwe bixwînin. Diwanê spartîbû min, wekî ez li ser hîmê elîfbaya Ermenan elîfbayeke ji Kurdên rêspûblîka me re biafirînim. Ê ez bi hezkirin bi şevan bê xew mam, bi rojan min xwe ji bîr kir, ro kir û pîva, pîrsî, nivîsara xwe rast kir, çêkir û afirand ev elîfbaya han ji bo we, ji bo rojeke wiha... Razîbûna xwe didime Diwana Sovêtiyê, wekî her mecal û mekan dane min ji bo vî şuxulî, wekî her mecal û mekan dane min ji bo vî şuxulê cimeatekê.¹⁵⁵*

Di romana *Morof* de gava em berê xwe didin civaka Kurdan a berî Sovyetê, bêguman ji aliyê xwendin û perwerdehiyê ve em rastî tu tiştekî nayên. Kurd koçberîyê dîkin û konên xwe her carê li zozanekî datînin. Axa û beg, ku ew xwedîyê her tiştî ne, bi dewleta Romê re dibin yek, wan ji mafên însanî bêpar dihêlin, bi zîlm û zordariyê hukmê xwe xurttir dîkin. Êla Selîm Begê jî yek ji wan êlan e ku rastî van tehdeyan tê. Selîm Beg bi xwe jî wekî neyar bi êla xwe re tevdigere lê *Morof* û hevalên xwe bi kelecaniya fikra Komunîzmê, hêviyên derdorê geş dîkin û rêya rizgarîyê li ber civaka xwe vedîkin. Helbet hêvî û daxwazên wan ên li ser zanyarî, xwendin û perwerdehiyê jî hebûn. Piştî ku gihaştin Sovyetê, wan bi xwe jî dest bi xwendinê kir an nekîr em nizanin lê di rûpelên dawîn ên pirtûkê de, em dizanin ku ew hêvî û daxwazên wan ên li ser xwendin û zanînê, li nav civakê pêk hatine. Keç û xort êdî xwende ne û ji hev re nameyên eşq û evînê dinivîsin û dişînin. Mehmedê

¹⁵⁵ Cindî, *Hewarî*, r. 47-48.

Silêman jî yek ji wan xortan e ku di rûpelên dawîn ên pirtûkê de em serpêhatîyên wî yên xwendin û evîndarîyê dibînin. Bavê wî Silêman pir li ber halê xwe dikeve, ji ber ku mecala xwendinê jê re çênebûye, lewra berî Sovyetê şert û mercên Kurdan ên jiyanê pir dijwar bûn û niha di vê bawerîyê de ye ku hikûmeta Sovyetê ev mecal daye wan, loma divê ew lawê xwe Mehmed û keça xwe Kewserê bide ber xwendinê û wan rojên xweş bi çavên xwe bibîne:

Sal bi sal, welatê Sovyetiyê bi kûltûr, senayî û malhebûna gundîtiyê ve kulîlk vedida, wisa jî pê re halê cimaetê xweş dibû. Silêmanê aza bi dîl û ceger dixebitî. Derd û kulên wî tunebûn, fikra wî bi şev û bi roj bi tenê hînbûna Mehmed û Kewserê bû. Ew car caran dikete nava mitaleyan û digot:

- Min derdên dinyayê gelek dîtine, ez zehf hatime zêrandin, bi şev û bi roj diçûme ber pezên axa û dewlemendan, min ji wê zilma wan nexweşî standiye, Xwedê çend salên dirêj bida min, ku ez nemirama, zarokên min biçûna mektebê, min ew yek li ber çavên xwe bidîta û ez bi wan re têr şa bûma, paşê mirin emrê Xwedê ye...

Hema di nava van mitaleyan de Eyîbê cîranê wî serê xwe bilind kir û lê nihêrî Silêman dîsa ketiye nava fikran, wî got:

- Silêman, mala te ava be, li Romê tu der heqa azabûnê de difikiriya, te digot, "Gelo roj ê bê em herine welatê aza, bextê me û zarongên me gul vede?" şukir ji vê rojê re, em êdî aza ne, lê ev mitaleyên te çi lazim in, he? Şukir Mehmed û Kewser jî mezin dibin. Xwestin û meremên te jî hatine sêrî, êdî çi dixwazî?

Silêman di binê simbêlan de vebîşirî û got:

- Eyîb, bira can! Tu rast dibêji. Kesek vê rastiye nikare bi cureyên mayîn bide guhestin, wê bi her du çavan kor be û bi destan şil be. Em niha bi saya sîyasetiya Leninê Mezin aza ne û bextewar in. Bira can! Êdî bi te ve 'eyan e ku du sal in em ji Romê hatine, halê me roj bi roj xweş dibe, bi

keda min û Mirdêsiya helal bîst pez û du çêlekên me hene. Eyîb can! Pirs ne der heqa wê de ye, mitaleyên min bi temamî der heqa tişteki mayîn de ne.

Ew hinekî disekine, dor û berê xwe raçav dike û di ber çavên xwe re derbas dike. Eyîb bê sebir dibêje:

- Xeberdana xwe kuta bike, camêr!

Ew wiha dest pê dike:

- Eyîb can! Ku wisa ye, tu heta niha hay ji nexweşiya min tune yî û ew e giran e. Nêt û merema min bi tenê ew e ku min xwendina zarokên xwe li ber çavên xwe bidîta. Helbet, şik tune ku li vî welatê aza de hemû mecal bo cimaeta hatine afirandin, bêtî min jî zarongên min dikarin bixwînin, lê heke min bi çavên xwe bidîta, xerab nedibû. Hi? Bira, rast e, yanê na?

*- Helbet, bi temamî tu rast dibêjî. Weylê mala te neşewitî, bes e, wan mitalan ji serê xwe derxe. Lo mala te ava be, ya ku kal û bavên me di 'emrê xwe de nedîtibûn, em niha dibînin. şukir niha di her gundekî Kurdan de doxtirxane, mekteb, klûb, kitêbxane hene û gişk bê pere ne...*¹⁵⁶

Bêguman, ji ber nexweşîyê, emrê Silêman têrê nake ku wan rojan bibîne lê dêya zarokan Mirdêsî, her du zarokên xwe dide ber xwendinê. Kewser xwendina xwe berdewam dike nake em nizanin lê kurê wan Mehmed heta dawîyê dixwîne:

*Çendekî û bi şûn de, Mehmed bi serfînyazî îmtihan dan û di zanîngeha Kurdî de hate qebûlîkirin. Wehdeyekî dirêj derbas nebûbû, sala xwendinê êdî dest pê bû, lawikên Kurdan bi zimanê xwe li Yêrêvanê dixwendin.*¹⁵⁷

Piştî xwendina xwe, Mehmed, bi qasî çend salan li gundên Kurdan dersdarîya zarokan dike. Lê şerê “Germanyaya Faşîst, devbixwîn û Sovyeta Ezîz” dest pê dike.

¹⁵⁶ Elîyê Evdîlrehman, *Morof*, Lîs, 2012, Amed, r. 88.

¹⁵⁷ Evdîlrehman, *Morof*, r. 92.

Helbet Mehmed neçe vî şerî û ji bo welatê xwe mêrxasîyan neke, deynê xwe û miletê xwe nede, nabe. Lewra, li gorî rê û rêbazên teorîya Realîzma Sosyalîst, lehengên baş divê hertim baş bin. Eger şer hatibe ber derî, divê ew bêtirs û ji bo xwefedakirinê amade bin, da ku ji civakê re bibin mînak. Helbet Mehmed, li hemberî Almaniyayê bi “qehremanî” şerê xwe dike yanî “borcê” xwe dide û vedigere malê. Lê ji “mêrikê sosyalîst” re sekn heram e. Gava jê dipirsin “Tu dixwazî çi xizmetê bikî?” dibêje “Dixwazim di kolxoza gund de bixebitim”. Îja wekî kolxozvanekî jêhatî, xizmetê ji miletê xwe û gelên Sovyetê re dike.

Di romana *Dê û Dêmarîyê* de herçiqas nivîskar xwestibe bala me bixşîne ser encamên giran ên şerê Almanya û Sovyetê li ser civaka Mêrgesorê jî, hinek caran, her wekî şer tunebe, em xwe li nav kar û barên rojane ên gundîyan dibînin. Gundîyên Mêrgesorê, ew îmkân û derfetên kû Sovyetê daye wan, bi temamî qebûl kirine û bi her awayî jê sûd werdigrin. Herçiqas piranîya mêrên vî gundî bi -qehremanî- çûbin şer û hinek ji wan, wekî Cemalê mêrê Karê, qet venegerîya bin jî, jinên gund ji bo debara xwe û bêguman ji bo silametîya Sovyetê qet ji karê xwe namînin, her dixebitin. Karê bi xwe jî, digel ku rastî ewqasî bobelatan tê, nexweş dikeve, dîsa jî dev ji kare xwe yê êtîmxaneyê bernade. Kurê wî Îsko û zarokên din ên gund ji ber îmkana heyî, ya ku Sovyetê daye wan, li dibistan û êtîmxaneya gund dixwînin, ta ku dîplomeya derçûnê distînin, mîna ku wextekî dê û bavê wan jî li wê dibistan û êtîmxaneya gund xwendibûn û derçûbûn:

*Rewşa gundê Mêrgesorê hatiye guhastinê. Hukumatê û daîrên curebicure mal û xaniyên nû çêkirine. Hemû tişt bi tevayî hatine guhastinê, cahilên gund pir bûne, dixwînin, bi jiyaneka nû dijîn û dixebitin. Di ew êtîmxana gund e wextekê da, kêman kes mane. Zarên bê dê û bav mezin bûne, ber firê ketine, bûne pêşekzanên curbicur, di gund û bajaran da dixebitin, lê Mêrgesorê ji bîr nakin; salê careke têne wergê bîraniyên zarotiya xwe, li ba heval-hogir, dersdar û terbiyetdarên xwe. Ji wan hinek hela hê dixebitin, ji wan yek jî Karê ye.*¹⁵⁸

¹⁵⁸ Egîdê Xudo, *Dê û Dêmarî*, Nûbihar, 2016, Stenbol, r. 41.

Piştî xwendina li dibistan û êtîmxaneyê gund, ên ku bixwazin dikarin herin bajarên mezin ên Sovyetê û li wir dest bi xwendina xwe ya bilind bikin, li wir bijîn û bixebitin. Îsko û Sîsê jî, ku ew hevalên hev ên dibistanê bûn û bi hev re zewicîyabûn, gava piştî şer bi malbatî diçin Ûkraynayê bo serdana gora Cemal û bavê Îsko yê heq, biryar didin ku herin Moskovayê û li wir li Enstîtuya Moskovayê bixwînin:

- *Awqas tiştên gotinê hene ku ji we ra bêjim, birayê Efo... Gênadiyê mêrê Evdokiyyayê mesela xwendina Îsko jî, Sîsê jî safî kir. Ewê li vir bijîn û bixebitin, lê wê demekê li înstîtuya Moskovayê bixwînin...*¹⁵⁹

Wekî gotina dawî, di van romanên de, xwendin û perwerdehî mîna mifteya rizgariya ji cehaletê û pêşketina civakê tê destnîşankirin. Li gor van romanên, Kurdên ku berê ji mafên xwendinê bêpar in, bi xêra dîwana Sovyetê digihêjin dibistan û zanîngehan. Lehengên mîna Hesên, Zînê, Şehîd, Mehmed, Îsko û Sîsê bi xwendina xwe ne tenê jiyanê xwe, lê belê jiyanê gund û civakê xwe jî diguherînin. Herwiha di van romanên de, ev pêvajoyek wekî “Emrê Teze” tê binavkirin, ku li gorî nivîskarê van romanên, ne tenê xwendin û zanyariyê, herwiha azadî, wekhevî û bextewariya civakê jî temsîl dike.

2.3. Aborî û Çandinî

Di romanên *Jiyana Bextewar*, *Hopo*, *Dê û Dêmarî*, *Hewarî* û *Morof* de, di warê aborî û çandinîyê de, pêşketineke mezin di jiyanê gundî û karkeran de tê dîtin. Di van romanên de, pergalên nû yên aborîyê, kolxoz û sovxoz, nîşaneyên girîn ên têgeha “Emrê Teze” ne. Li gorî van romanên, ev pergal, ne tenê rêyeke nû çê kirine ji bo hilberîn û parvekirina berhemên çandiniyê, di heman demê de têkiliyên nû yên civakî û aborî jî afirandine.

Di romana *Jiyana Bextewar* de, berîya dema *Emrê Teze*, yanî berî ku Kurd derbasî axa Sovyetê bibin, em Kurdên Serhedê di nav tengasiyên mezin û belengaziyeke giran de dibînin. Piraîya wan koçer in, şivantî û rênçberîya axa û began dikin. Hinek ji wan li bajaran hemalîyê dikin, an jî li gundan bi destheqa kêr ji xelkê re dixebitin. Ji alîyê rêvebir, axa, beg û dewlemendên zalim ve tîr rêvebirin

¹⁵⁹ Xudo, *Dê û Dêmarî*, r. 93.

û şeliandin. Parîyeke nan ku di destê wan de hebe, ew jî, ji alîyê dewleta Romê û şîrîkên wî ve wekî bac û xerac tê stendin. Ên koçer di bin konên kevn û peritî de dijîn, ên li gundan di xanîyên xirbe û kavişên axî de dijîn. Ew xanî, hema bêje bi temamî di bin erdê de ne, tavê û ronahîyê nabînin. Erdê ku diçînin, pez û dewarên ku şivantî û gavantîya wan dikin, ne yê wan lê yê axa û bega ne. Herwiha xwarina wan timî nanê cehî ye ku ev jî nîşana herî mezin a feqîrîyê tê qebûlîkirin ji alîyê nivîskar ve, loma gelek caran em rastî vê sembolê tên, ji ber ku nivîskar naxwaze hejarîya civakê bi me bide jibîrkirin. Helbet ev pîrsgirêk û bi taybetî aborîya lawaz a civakê, piştî ku Kurd ji Serhedê bar dikin û li derdora çîyayê Elegezê kom dibin, hema yekser bi dawî nabin, ji ber ku hê Şoreşa Cotmehê pêk nehatiye û Sovyet ava nebûye. Loma nivîskar, xwendevanên xwe ji wê atmosfera reş û tarî, bi êş û keder dernaxe. Ew Jiyana Bextewar ya ku nivîskar xwendevanên xwe ji bo wê amade kiribû, hê jî nehatiye, ji ber ku dixwaze em bizanibin çawa li Serhedê zilm û tehdê ji dewlet, axa û began dihat, li vir jî hê ku Sovyet ava nebûye, heman pîrsgirêk û arîşe berdewam in. Helbet piştî avabûna Sovyetê, em di şêwaz û vegotina nivîskar de çend guherînên berbiçav dibînin. Teswîrkirina bûyer û kesan zêdetir dibe, hevokên hunerî û lihevhatî pirtir dibin (Di romana *Hopo* de hê pirtir dibin.). Bêguman ev ji ber guherîna atmosferê ye jî, ya ku ji serî ve nivîskar em ji bo wê amade dikirin. Di romanê de em derbasî qonaxê din dibin, lewra di şerê Monşevîk û Bolşevîkan de Monşevîk, yanî Lenîn û hevalên xwe bi ser dikevin, hikmê Bolşevîkan diqede, pê re jî pergala sîyasî, civakî, aborî û hunerî diguhere. Karker, gundî û rênçber dibin xwedîgotin. Li gundan “kolxoz” yanî koperatîfên xebat û çandinîyê û komîteyên alîkarîyê ên gundîyan ava dibin. Li bajaran bankayên gundîyan vedibin. Emerîkê ku berîya şoreşê rastî gelek zor û zehmetîyan hatibû, têra xwe kul û derd dîtibûn, vê xebera xweş ji gundîyên xwe re dişîne û mizgînîya xwe li wan dike, ew ên ku li bajarê Tîblîsê ji bo debara xwe dixebitîn:

... giliyê teze gund da zef in. ...Li gunda “Komîta Komekiya Gundiya” teşkîl bûye. Li bajara da “Banka Gundiya” vekirine. Ew kesîbê ku gayê wan tunene, dîwan pera dide wana ku ji xwe ra ga bistînin, wekî belengaz nebe. Ê toximê wî tunebe pere didinê, wekî ew merî bona çandinê toxim bike; lê ku doşaniyê wî tunebe, pere dide, wekî xwe ra

*doşanî bistîne. Geleka usa bi alîkarîya dîwana Sovêtê halê xwe xweş kirine. Gereke ez bêjme we: Komekê dide wan meriya, ê ku ji gund kaxezê tînin: belê rast e, ew meriyê gund e, besa xeberê: ji Sengerê ye û xebatçî ye, paşê pera dide... Wan pera jî dîwan dide, lê 10 sala şûnda, kengê halê te xweş bû, wî çaxî distîne...*¹⁶⁰

Di romana *Jiyana Bextewar* de, berîya avabûna Sovyetê, “sifreyên xwarinê yên vala” ku hejarîya civakê nîşan dide û di dema Sovyetê de “sifreyên xwarinê yên tîr û tije” ku ne hejarî lê bereksê wê dewlementîya civakê nîşan dide, ji alîyê nivîskar ve pir hatiye bikaranîn. Berîya Sovyetê, sifreyên xwarinê yên karker û gundîyan her tim vala ne, yên ku li ser wê sifreyê birçî rûdin, wisa birçî jî radibin. Xwedîyê malê, ji ber desttengîyê û sifreya xwarinê ya vala, li ber mêvanê xwe dikeve şermê. Lê di dema Sovyetê de, yanî di dema “Emrê Teze” de nivîskar êdî sifreya tîr û tije dide ber me, mîna ku Rîhana jina Emerîk, dide ber kurê xwe Sehîd û mêrê xwe Emerîk:

Êdî êvarekê dereng bû, bav û kur rûniştin, şîv dixwarin. Dê, bona şandinê, kur ra hewle, kade, mirtoxe, penêr, toraqa eyara bi pincara biharê çêkiribû û kupek jî rûn. Ewê çend heb jî keşk dagirtibû. Wextê Rihanê ew hedayî kur ra dadigirt, xeber dida digot:

*- Mêrik, dewla xwedê serê te, Sehîdê min û dîwana Sovêtê be, şikir doşanî heye, nan heye, ne wekîa wexta berê ye, bîr nav çavê me xî, ji me bistînin.*¹⁶¹

Di vê dema nû de, lehengên romanê mîna ku di nav ayînekê de bin, hema bêje di her sohbetê de rojên berê bi bîr tînin û ji bo halê xwe yê niha şikur dikin, paşê spasîya xwe li Lenîn û dîwana Sovyetê dikin. Helbet, nivîskar vê berawirdîya ku bi devê lehengan hertim tîne pêşîya me, bi hêvîya armançekî dike, ku ew jî ji ruhê edebîyata Realîzma Sosyalîst pê ve ne tiştekî din e. Li gor vê ruhê di nav edebîyatê de, gava ku ji alîyê aborî ve behsa dema berê bê kirin, ji xeynî tunebûnê, bêguman divê her tişt kevn û perîtî be, bereksê vê, her tişt nû û nûjen jî divê “niha” hebe.

¹⁶⁰ Şemo, *J. Bextewar*, r. 192.

¹⁶¹ Şemo, *J. Bextewar*, r. 193.

Bêguman divê “hebe”. Lewra “hebûn” dîwarekî zexim ê Edebîyata Sovyetê ye, ku nivîskarên vê edebîyatê pir caran pala xwe didinê. Helbet afirîner û xwedîyê vê “hebûn”ê jî, li gor van nivîskaran, ji dîwana Sovyetê pê ve ne kesekî din e:

Lê wextê tarî kete erdê, li ezmanê şîn tiji stêyrk bûn, cahil ji hev bela bûn, herkes ber bi mala xwe çû. Meriyê kal man. Wana derheqa xebata kolxozê da xeberdida, wekî bi maşînê xebat çiqas zû dibe, xebata kolxozvana çiqas sivik kirine. Wê êvarê wana xebata berê û yê niha anegorî hev dikirin: Wextê bi cotê darîn zevî radikirin, wextê bi dasa, melendiya û kêlendiya giha û nan didrûtin, wextê bi kama nan dikutan: cote ga kamê da girêdayî, sibê heta êvarê ber tava havinêye germ, merî diqijlîn, serî li merîya dibû mînanî "dew". Wextê wana ceh tenê li erdê diçandin, hine sal ew ceh surê dibir, şîn nedibû. Bedo digot:

- Lê icar? Îcar maşînê erdê diqelêşe, cot dike, gihê û nan didrû, nan dikute, hemû xebatê rind, temiz û zû jî dike. Tê bira we, berê cem me xên ji ceh, tişteke şîn nedibû, lê niha bi ulmê agronomiyê genimê kirik û bostanê kartola, gizêra, pîvaza û silqa şîn dibe.¹⁶²

Di Jiyana Bextewar de, wextê şer û pevçûnan, peyv û axaftinên gundîyan piranî li ser zilm, tehde, kuştin û birçîbûnê bûn. Lê di dema Sovyetê de, gundî wê rojevê li paş xwe dihêlin û vedigerin ser karên xwe yên rojane ên gundan. Helbet sohbetên xwe jî li ser kar û barên xwe yên rojane dikin. Bêguman, di her axaftina wan de dîyar dibe ku ew dîzaynkerê fedakar ên vê pergalê ne û ji bo pêşvebirina aborî ya gundê xwe û esas ya Sovyetê, divê her bi dil û can bixebitin, da ku jiyaneke bi qelîte û bereket per û baskên xwe ji wan re veke:

Wê êvarê wana derheqa avê û derheqa êlektirîkê da xeberdida. Wana şêwr kir, wekî kolxozvan jî komekê bidin: cewê bikolin bona avê, erdê bikolin bona kêranêd êlektirîkê û gele şîxûlêd mayîn. Biro got:

¹⁶² Şemo, J. Bextewar, r. 219.

- *Sehîd, gundê Elegezê xanîyê rind ji kevirê birî, mînanî koşka çêdikin.*
Gerekê em jî usa bikin, wekî kolxozvanê me jî xanîyê rind xwe ra çêkin.
Derheqa wê yekê de, Sehîd got, emê pirsê daynin ber komnehîya partîyê
û komşuxulkira Sovêta nehîyê, wekî texta, kêrana, sûsa û tiştêd
*mayîn bidne gundîya.*¹⁶³

Di vê romanê de hêja ye em hinekî li ser van her du lehengên sereke Emerîk û kurê wî Sehîd bisekinin. Emerîk, piranîya emrê xwe li Serhedê, di nav zor û zehmetîyan de derbas dike. Têra xwe kul û kederan dibîne. Carekî, leşkerên Romê bi milê wî digrin, berê wî didin zindanan. Wextekî ku her kes hêvîya xwe jê dibire, bi xîreteke derasayî li ber xwe dide, paşê direve tê malê. Ji neçarî, tevî eşîra xwe Sîpkan derbasî Ermenîstanê dibe, ku wê demê Ermenîstan di bin kontrola Împeretoriya Rûsyayê de ye. Heta ku Sovyet ava dibe, ji bo ku debara xwe bike, gelek caran bi lawê xwe Sehîd re diçe Tîblîsê dixebite, li wir hemalîyê dike. Piştî ku Sovyet ava dibe, em wî bi awayeke din dibînin. Ew êdî ji dewletê û leşkeran nareve. Em wî wekî parêzvan û fedakarê hikumeta Sovyetê dibînin. Berî Sovyetê, tenê ji bo ku zikê xwe û malbata xwe têr bike dixebitî lê niha hemû xebata wî ji bo silametîya Sovyetê û civaka wî ye. Sibehan berîya herkesê ji xew radibe diçe ser kar, êvarê piştî herkesê vedigere, tê malê. Gava nexweş dikeve jî, dîsa ji karê xwe namîne. Li gorî wî ew û civaka xwe, yanî Kurdên Sovyetê deyndarê Lenîn û Sovyetê ne, ji ber wê, divê ew di xebata xwe de her serkeftî bin. Loma ji ber vê ye, gava ku Sehîd diçe leşkerîya Sovyetê û bi Artêşa Sor re li hember "Faşîstan" (Almanan) şer dike, ew û Rihana jina xwe qet xemgîn nabin û çûna wî bi rehetî qebûl dikin û bi ser de jî wî temî dikin ku dijmin qir bike, tune bike û ji welat derîne¹⁶⁴

Sehîd jî di jêhatîbûnê de bi temamî yekî mîna bavê xwe ye û hemû liv û tevgerên wî ji bo berjewendîyên Sovyetê ne. Ew, mînakê herî baş ê civaka xwe ye ku li gor Realîstên Sosyâlîst divê karakterên wiha hebin, ji ber ku ew ji bo dîzaynkirina civakê pêwîst in. Loma Sehîd gava ku wextê xebatê tê dixebite, gava ku şer tê ber derî (a rast şerê bi almanan re ji ber derîyê wî gelekî dûr e) bêyî tirs diçe şer. Çawa ku di xwendin û xebata xwe de jêhatîbû, wisa di şer de jî jêhatiye. Heta ewqasî

¹⁶³ Şemo, J. *Bextewar*, r. 220.

¹⁶⁴ Şemo, J. *Bextewar*, r. 242.

jêhatîye ku nav û dengê wî, tirs û xofê dixê dilê dijminên wî. Mîna ku "Cin ji hesin bitirsin" ji wî ditirsin.¹⁶⁵ Gava ku şer diqede û Sovyet bi ser dikeve, Şehîd mîna qehremanan tê pêşwazîkirin û xelatîkirin, lê piştî çend rojan dîsa dest bi kar û xebata xwe ya gund dike. Divê em bala xwe bidinê, lehengên wekî Emerîk û Şehîd hema bêje qet nawestin, eger biwestin û nexweş bikevin jî qet nasekinin, lewra ev jî sebebek wê heye, ku ev sebeb jî bi îdeolojîya Komunîzmê re rasterast têkildar e.

Em dikarin bibêjin Erebe Şemo, çîroksazîya beşên dawî yên *Jiyana Bextewar* bi temamî li dor jiyana gundîyan a çandinîyê ava kiriye. Lewra, piştî ku Şehîd xwendina xwe temam dike û vedigere gund, li wir dimîne, heta ku diçe şerê almanan. Gava ku Şehîd li gund e, em bi liv û tevgerên wî, jiyana însanên wî gundî û kar û barên wan ên her rojîn nas dikin. Em dibînin ku bi navê "Kolxoz" pergalek çandinî û ajaldarîyê hatiye avakirin û gundî di bin banê wî de li gor hunera xwe her roj dixebitin û mehane an jî salane heqê destê xwe wekî heywan an jî wekî zad/tene distînin. Li gor diyalogên gundîyan, em têdigihîjin xebata ku dikin û heqê ku distînin hev derdixe, yanî ew keda ku didin, mîna berê ne badilhewa ye. Helbet vê jî bi hebûna pergala heyî, ya ku Sovyetê damezirandiye, girê didin. Kolxozvan yanî pale, serê sibehê zû ji xew şîyar dibin, bi kêfxweşî berê xwe didin nav erd û zevîyan û li wir bi dil û can dixebitin, heta ku dibe êvar. Ji bo ku performansa wan nekeve, carna di navbera xwe de dikevine lecê, ên serkeftî di rojnameya *Rya Teze* de dibin mijara nûçeyan û ji alîyê Rêvebirîya Kolxozan ve tînin xelatîkirin. Bêguman ev dîmen, dîmeneke afirandîye ku li ber çavên me hatiye xêzkirin. Helbet mimkun e, xebatkar di kar û barên xwe de hergavê jêhatî bin û lecê bikin û ên serkeftî jî bibin mijara nûçeyên rojname û radyoyan. Lê gelo çiqasî mimkun e, xebatkarên gundekî bi temamî (pale, şivan, gavan, bêrîvan...) her roj serê sibehê zû şîyar bibin û bêyî gazinc û rexneyekî, bi kêfxweşî herin ser karê xwe, heta êvarê têra xwe bixebitin û dîsa bêyî gazinc û rexneyan vegerin malê? Helbet, gava em vê romanê û hemû berhemên din ên Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê bixwînin, divê em her tim bînin bîra xwe ku ev berhem, ji komîteyên sansûra edebîyat û hunerê derbas bûne ku ew komîte jî bi temamî di bin kontrola hikûmeta Sovyetê de bûne. Bêguman berhemên ku fikr û ramanên fermî yên Sovyetê di mijarên xwe de bi cih nekirine û karakterên

¹⁶⁵ Şemo, *J. Bextewar*, r. 248.

xwe li gor wê ava nekirine, ji komîteyê derbas nebûne. Îja em vê pirsê ji xwe bikin dê rewş zelaltir bibe. Kolxozvanên ku her sibehê ne bi gazinc û gotin lê bi kêfxweşî diçin ser karê xwe û êvarê jî wisa vedigerin malê, hema tenê gazincek jî bikirana dê ev pirtûk îro li ber destê me bûya? Bêguman, gava em dibêjin gilî û gazin tunene, divê neyê wê wateyê ku di xebata kolxozvanîyê de herkes karê xwe bêqisûr, rast û durust dike. Lewra em dibînin ku hinek kolxozvan ji hinek kolxozvanên din kêmtir dixebitin û performansa wan ji ya kolxozvanên din zêdetir nabe. Lê di vê rewşê de jî, bi hinceta motîvekirinê, em li fikrên îdeolojîk ên nivîskarî diqelibin û em dibînin ku ev barê ne giran lê li gor fikra sereke ya pirtûkê gelekî muhîm, piranî li ser milê Sehîd e:

...lazim e herkes ji me xîred, dil û can bixebitin. Nav me da merî hene ku rind, dil û can dixebitin, lê hê zef heyf, merî jî hene ê çawa em dibên: "xwe tê da dixapînin". Wextê dibe civat jî, ew merî ji teva zeftir qewrîya xwe diqelêşe, zêde xeber dide.

*- Ew kolxozvan pak nafikire, wekî ew bona xwe dixebite, wekî ew bona zarê xwe û mala xwe dixebite; dixebite, wekî dîwana Sovêtê, ya ku azayî daye wan û mexlûqetê wan, qewet be, ne hê bîra me teva dane zulma padşê Romê, qirkirina Kurdêd me, ne hê bîra me da ne dîwana daşnaka, ximnapê wane talançî û begêd me Kurda, ê ku ji hemûşka zêdetir em dizêrandin, sal û zemana ji bona xwe em bê heq didane xebatê. Mînanî qaçaxa jî em dişêlandin.*¹⁶⁶

Di Morofa Eliyê Evdilrehman de berî ku Morof û heval û nas û dostên xwe derbasî Êrisetê bibin, Morof bi xwe heta demekê şivantîya Selîm Begê dike, paşê dibe dengbêjê wî. Digel ku ewqas salên dûredirêj li cem wî dixebite jî, Selîm Beg ti car heqê wî bi temamî nadê û bi ser de jî tehde û heqaretan lê dike. Ne ku tenê nade wî, hema bêje ji bo hemû mirovên êla xwe wiha bi neheqî tevdigere. Ew her gavê xwarinên xweş dixwe lê mirovên civaka wî gelek caran birçî radikevin, li ber mêvanên xwe dikevin şermê. Ew di konên herî xweşik û mezin de dimîne lê mirovên

¹⁶⁶ Şemo, J. Bextewar, r. 217.

êla wî di konên perîtî û piçûk de dimînin. Bêguman em dikarin berawirdîyeke wiha bi rûpelan dirêj bikin lê ji bo ku em bigîjin fikra sereke ewqasî bes in û zêde ne jî. Nivîskarê *Morof*, Eliyê Evdilrehman, hema bêje heta dawîya pirtûkê, mijarê li dor vê nakokîyê dibe û tîne, lewra dixwaze em bizanibin di dinyayeke wiha de hizûr tune, hebe jî tenê ya axa û began heye. Jixwe, ji ber ku hizûr tune, debar nabe, Morof û hevalên xwe, digel malbatan berê xwe didin erdê Sovyetê. Ji vir û pê ve haya me ji Morof û hevalên wî û Selîm Begê çê nabe, lewra mîna ku me dest bi çîrokeke din kiribe, mijar û leheng diguherin. Nivîskarê ku heta li vir, bi kêmasî û neyînîyên di nav civakekî de çîrok dihonand, yanî ew rewşa xerab dianî ziman, ji vir û pê ve berê xwendevanên xwe dide kelecانىyên hewldana avakirina jiyanê nû. Ji vir û pê ve li şûna rexneyan, em pesn û methîyeyan dibînin. Destên ku em dibînin radibin jorê, ne ji bo nifiran lê ji bo şikurdariyê ne. Gilî û gotin, ne li ser neçarîya çarenûseke reş û tarî lê li ser plansazî û hûrgilîyên siberojekê ne. Kar û xebat, ne bi zor û zordariyê lê bi dilxweşî û şahîyê ne. Bêguman, Mehmedê Silêman tam jî mîna wê ye, ku gava ew ji eskerîyê vedigere malê, careke din naçe bajêr û bi dildarî di kolxozê gund de dixebite.¹⁶⁷ Hemû huner û zanîna xwe bi gundîyan re parve dike. Bi zanebûna wî û bi jêhatîbûna kolxozvanan, rewşa gundîyan a aborî her carê hinekî din baştir dibe, halê wan xweştir dibe. Tiştên ku berê bi destên wan nediket, êdî li ber destên wan in. Xaniyên wan bi kevirên tûfê hatine çêkirin û bi lembeyên Îlyîç hatine ronîkirin. Gundê wan bi bax û bexçeyan hatiye xemilandin. Tê de mekteb, nexweşxane, pirtûkxane, hemam û dernên din ên çandî, civakî û hunerî hatine avakirin. Li kêleka zimanê Ermenî, Rûsî û Adirbêcanî, di radyoyê de, êdî Kurdî jî heye:

Kolxozê gundê Nêcirlûya Jorîn li Deştê Araratê û kêleka Çemê Zengûyê cîwar bûye. Wexta ku meriv ji dûr ve li wê dinihêre, tê qey bibêjî avahîyeke biçûk e, lempeyên Îlyîç mîna stêrkan diçirûsin. Zingîniya dengê radyoyê ye, bi zimanê Êrisî, Ermenî, Adirbêcanî, Kurdî xeber dide. Wisa jî gelek avahiyên duqatî, yekqatî yên bi kevirên tûfê çêkirî tene kifşê. Li wê derê, mekteba heftsale, klûb, kitêbxane, doxtirxane, nivîsxaneyê kolxozê, hemam, tewle, gom û gelek ocaxên kûltûrîyê û ronahîyê yên mayîn hene. Gund bi bax û rezan ve hatiye xemilandin.

¹⁶⁷ Evdilrehman, *Morof*, r. 93.

Helbet, ev bipêşdeçûyîn gişk bi saya sîyasetîya Lenîniyê ya mîletîyê ye, lê di karê çekirin û avakirina wî de keda kolxozvanan û Mehmed jî ne hindik e.

Gund têr û tijî ye. Bi saya xebata kolxozvanan a baş û teşkîlkirina xebatê ya rind, kolxozvanan ji ber her rojxebateke xwe ve, bi hesabê orte, 65 manat standibûn. Çi qasî diçe, halê kolxozvanan xweş dibe. Nêcîrlû gundekî înternasyonal e; Ermenan, Adîrbêcanîyan û Kurdan dest dane destên hev du, mîna bira şerkarîyê dîkin bo ji wehde zûtir qedandina hemû qerarên partîyê û hukimetê.

Niha êdî çil û yek sal e temamîya cimaeta Sovyetîyê bi saya sîyasetîya Lenînê Mezin aza ye, bûne xwedanên bext û textê xwe, xwendin û kûltûra xwe, wisa jî di nava wan de Kurdên Sovyetîyê gihîştine wan nêt û meremên xwe, ku bi qirnan li hêvîyê bûn¹⁶⁸

Di romana *Dê û Dêmarîyê* de em bandora şerê Almaniyaya Hîtler û Sovyetê li ser gundîyên Mêrgesorê dibînin. Nivîskar, berê me dide vê fikrê ku her çiqas Kurd li Sovyetê gihîştibin rehetîyê jî, ji ber Almaniyaya -faşîst- ev rehetî nemaye. Hêvî û daxwaz, ji bo bidawîbûna şer û serkeftina Sovyetê ne. Rojên xweş û bi aram, ew roj in ku ew li bendê ne. Gundîyên Mêrgesorê, di wan rojên zor û zehmet de, bi hemû hêza xwe, çî jin û çî mêr (bêguman Karê yek ji wan jinan e), bi dil û can dixebitin, da ku ji bo rojên xweş û bextewar amade bin.¹⁶⁹

Pîştî ku şer bi dawî dibe û di wî şerî de Sovyet bi ser dikeve, rewşa gund jî ber bi başbûnê ve diçe. Hikûmeta Sovyetê, mal û xanîyên nû çê dike. Xort û ciwanên gund pir bûne, jiyanek nû dijîn û dixwînin, dixebitin. Zarokên êtîmxaneyê mezin bûne û bi xwendin an jî bi kar û xebatên curbicur mijûl dibin. Hinek ji wan diçin bajaran dixebitin an jî dixwînin û Mêrgesorê, bi taybetî êtîmxaneya gund û li êtîmxaneyê jî Karê, ji bîr nakin, salê carekî tînin serdanê.¹⁷⁰ Bêguman, ji vê bi şûn ve em rastî nîşaneyên aborîyên li ser rewşa gundîyên Mergesorê nayên, ji ber ku şer bi

¹⁶⁸ Evdilrehman, *Morof*, r. 94.

¹⁶⁹ Xudo, *Dê û Dêmarî*, r. 34.

¹⁷⁰ Xudo, *Dê û Dêmarî*, r. 41.

dawî dibe û li gor nivîskar pirsgirêkek aborî ku bê qalkirin an jî safîkirin namîne. Eger em wekî nivîskar bifikirin, hemû meseleyên ku bi hikûmeta Sovyetê ve girêdayîne, wekî aborî û perwerdehîyê, piştî şer tînin safîkirin, lê hinek edet û kevneşopîyên di nav gel de dibin pirsgirêkên sereke, ku çareserîya wan jî gel bi xwe ye.¹⁷¹

Di romana *Hewarîyê* de, gava ku serleheng (vegêr) ji Yêrêvanê diçe gundê Kûrekendê, herçiqas ne bi hûrgilî be jî û xisûsen çîroka romanê li ser vê nehatibe sazîkirin jî, li ser rewşa aborî û debara şênîyên Kûrekendê zanînên me çê dibin. Hinek caran vegêr bi xwe van zanyarîyan vediguhêze xwendevan û hinek caran em ji devê Apê Moskov û Apê Şewêş dibihîsin. Gava ku qala serpêhatîyên borî dikin, bêguman rewşa aborî ya dema xwe jî tînin pêş çavan û ji bo vî halê xwe yê ku niha tê de ne şîkur dikin û dîwana Sovyetê wekî xelaskerê xwe dibînin:

- *Çi bibêjim, lawo!.... gava ku wan salan tînim bîra xwe, xwîna reş hildişe nava dilê min. De sala hezar û neh sed û hijdehan, wehdê şerê Romê û Daşnakan bû, gelekên me li serên rêya mirin, gelek di Ava Reş de xeniqîn, gelek jî hatin kuştin. Êlên me yên rengîn temam pêpes dibûn. Zarezara birçîyan bû, nexweşan, hinek bi tayê diketin, xolorê jî jixwe em hildabûn. Li ber dîwaran, tijî kal, pîr, zarokên bêxweyî û bêxwedan bûn, nêzenêza wan bû, hesreta wan kirtolek nanê reş, firek ava sar... Ji xelayê dê ewledê xwe dihişt. Cimeat hatiba ah û zarê. Bi xeberekê, zulm bû dibarî, xwîn bû dikişîya. Erê lawo, ya ku me dîtiye, bila here, venegere. Û em ê li rûyê dinyayê wînda bûna, heke wan salan Lenin hewara xwe bi me re negihanda. Wan çaxan ji me re gotin, ku dinya êdî ya me ye, ya pale û gundîyan, welat êdî ji destê kedxuran azad bû. Ruh bi ber me de hat û herçî qudûm di ber çongên me de hebû, em jî rabûn, me berî dijminê welêt da..... Paşê, hema wan mehan, hatin ji me re gotin, ku ji bo zarokên me yên bédê û bêbav li Aştarakê êtîmxaneyek vekirine.*¹⁷²

¹⁷¹ Xudo, *Dê û Dêmarî*, r. 70.

¹⁷² Cindî, *Hewarî*, r. 41.

- Erê lawo!... ez tevîhev bûm, min xwe winda kir. Baweriya te hebe, heke ew êtîmxane nîn bûya, ew zarokên din jî wê ji destê me biçûna. Dîwana Sovyetê ew xelaskirin ji birçîbûnê ji xolor û mirinê. Herçî hukimetê xweyî kirin, givrik bûn, derketin nava emir, bûn xweyî mal û nav.¹⁷³

Gava ku vegêr teswîra gundê Kurekendê dike û derheqê aborî û çandinîya gundîyan de agahîyan dide, bêguman fikr û hestên xwe yê derheqê Hikûmeta Sovyetê de jî dide der. Li gor wî, Kûrekend berê bajareke xerabe bû û warê bûmên kor bû, lê niha bi xêra Hikûmeta Sovyetê careke din ew şên bûye û gundî êdî dikarin debara xwe bikin û bi rihetî çandinîya rez û zevîyên di destên xwe de bikin:

Kûrekend sî û çend salan berê xerabe bû, meskenê bûmê kor, guhera pezê payîza dereng û bihara zûhatî, Hukimeta Sovyetiyê guhdarî da ser wê qijleyê jî, şên kir, kire ber pîlanê, bi tîpa teze dewsa axilan, guhêrên pêz, otaxên teze yê çendpencere çêkir û ava kir. Rêncberê berê bere bere bi rieatiyê ve hate girêdan, hêja bû xweyîyê gund, kewşen û avê û konê hizhizî bi çît û berçîtê xwe ve, wekî tevî kolozê terrikî hê di binê stêrên hinek malan de dimîne, her cara gava ku çavê mirov pê dikeve, xwîna reş hildişe nava dil û hinavê wî, derd û kulên kevin tev radibin. Tê ber çavan emrê berê yê reş î hiş, şerên qebîleyan ên bavobavo, hewar û gazîyê, halê zelâlîyê, kuştinê, qirkirinê, talan û tajan.. Û îro ew rojên qetlê, ku wextekê hebûne, êdî derbas bûne, winda bûne û mane çawa xewnerojkên reş, wekî mirov tu caran naxwaze bîne bîra xwe, çima ku di xwe de hêrs dibe, dikewgire, dişewite wekî agirê tenûrê.

*Kûrekendîyan giş di kolxozê de ne û tevî kolxozvanên gundê Haytaxê yê cînar, dostên kal û bavan, pembû, tirîyan, bax û rezan, bostan û pincarê bêcer dikin, onceyê hiltînin datînin. Xwelîya deşta Yerêvanê ya tev de zêr bi xebatkarên xwe yê teze re gul vedide, dixemile, bi gûşîyên tirîyên şêrin î cinetî, bi hezar turletehmî...*¹⁷⁴

¹⁷³ Cindî, Hewarî, r. 42.

¹⁷⁴ Cindî, Hewarî, r. 34.

Bêguman, eger mirov di rewşa xwe ya aborî de bi kêmasî nebe û pê re, ji jiyana xwe kêf û zewqê bistîne, helbet dê rojên pêşî û paşîya xwe jî zêde neyne bîra xwe lê ev berhema ku bi rêbazên teorîya Realîzma Sosyalîst hatiye nivîsandin, herçiqas rojên berê ên şer û pevçûnan bîne bîra me jî, rojên ku hê tam nehatine, yanî ew rojên “teze” li nav serê me bi cih dike û bi xurtkirina daxwaz û hêvîyan, berê me dide xebata ji bo Komunîzmê:

Belê li vî gundî kesek di par re nanihêre, bi pey roja bihurî nakeve, giş bi pêş de dinihêrin, li roja sibehê û bi sibeha teze re teze dibin, emrê xwe xweş dikin, bi serecem, dewlemend û bextewar dikin, berbirrî sibeha xwe ya teze dibin, sibeha Komunîzmê.¹⁷⁵

Gava ku Şewêşê kal û lehengê me yê bênav li nêzîkê gund dimeşin û Şewêşê kal qala serpêhatîyên xwe dike, tirextorekî di ber wan re derbas dibe û Şewêşê kal bala lehengê me dikşîne ser tirextor û jê re girîngîya hebûna vê tirextorê rave dike. Helbet em krîtîka van gotinên Şewêşê kal bikin, em ê baş serwest bibin ku, di rastîya xwe de ev ne gotinên Apê Şewêş lê gotinên nivîskarî bi xwe ne û armanc ew e ku bala xwendevan bikşîne ser xebatên hikûmeta Sovyetê:

Ez û Şewêşê kal ku nêzîkê gund bûn, tirextorek di ber me re derbas bû, çû aliyê kîlerên kolxozê. Şewêşê kal lê nihêrî, got. - Evê han jî, kurê Mistoyê Kalo ye, qerewîlê gund. Niha bûye tirextorîst. Wextekê, bi serê te kim, me çetin maça cot digirt, lê evê te li rasta hanê dide pêşîya xwe, heta em bi vir de, heta em bi wê de diçin, ew radike û tê.¹⁷⁶

Romana *Hopo*, em dikarin bibêjin bi temamî romaneke çandinî û aborîyê ye. Mijar her li ser çi be jî, dawîya dawî bi çandînî û debara gundîyan ve tê girêdan. Ji ber vê ye, nivîskar, her fersendê diceribîne, da ku bala me bikşîne ser rewşa wan. Ji demên borî yê berîya Sovyetê, bi devê lehengên xwe agahîyan dide me û halê wan ê ku ew niha tê de ne, mîna ku ta bi derzîyê ve bike, yeko yeko li ber me rêz dike. Di xisûsiyeta pergala Komunîzmê de, îdare, rêveçûn û xebitîna kolxozan, li nav gundên

¹⁷⁵ Cindî, *Hewarî*, r. 36.

¹⁷⁶ Cindî, *Hewarî*, r. 144.

Kurdên Ermenîstanê ku ew penaberên şer in, diceribîne an jî serborîya vê ceribandîne, ku îxtîmal e ji alîyê hikûmeta Sovyetê ve jixwe hatiye kirin, dinivîse, neql dike. Ji ber vê ye, “kolxoz” û “kolxozvan” du peyvên sereke ne di vê romanê de û hewce ye em koka wan zanibin û di rastîyê de, ew kanîya ku jê zane (Komunîzm) bi bîr binin.

Peyva “kolxoz”, ji du peyvên Rûsî (kollektivnoye hzyaystvo) çê bûye, ku bi wateya xwe ya Kurdî “çandinîya hevpar” e. Kolxoz, pergaleke çandinî û hilberînê ye ku hikûmeta Sovyetê, li gel polîtîkaya xwe ya aborî û hilberînê, li nav gund û navçeyên Sovyetê daye destpêkirin. Di vê sîstemê de, erdên çandinîyê milkên dewletê ne û dewlet van erdan, tevî alav û kelûpelên çandinîyê teslîmê kolxozan dike. Gundî jî, ji bo van kolxozan, bi hevkarî dixebitin û heqnanê xwe mehane an jî salane distînin. Helbet di van kolxozan de ne tenê çandinî, herwisa ajelvanî jî heye. Mîna ku em di romana *Hopo* de jî dibînin, şivan û gavan diçin ber heywanên ku malên kolxozê ne û bêrîvan jî diçin dotina wan. Eger em li roja xwe ya îro binêrin, bêguman tiştê ku kolxozan bîne bîra me, herçiqas ji hinek alîyan ve ji hev cuda bin jî (lê di xebata hevpar de yek in), koperatîf in.

Ji bo romana *Hopo*, eger em gotina xwe ya dawî di serî de bibêjin, bêguman, ji sedî sed romaneke îspatkirinê ye. Çi ye ev îspatkirin? Berîya Sovyetê jixwe em dizanin Kurd di halekî çawa xerab de ne lê piştî ku Sovyet ava dibe? Gelo sozên ku bo Kurdan û milletên din tînin dayîn, cihê xwe dibînin an na? Zikê mirovên hejar, gundî û karkeran êdî têr dibe an na? Komunîzm, pergaleke kêrhatîye yan na? Em dikarin pirsên bi vî rengî zêdetir bikin û guman nîne ku ev roman dê bibe bersiva van pirsên me jî. Herçiqas, roman di dema destpêka Sovyetê de derbas dibe û di vê demê de li bin hukmê qaîdeyên Sovyetê qala jiyana rojane ya gundekî Kurdên Ermenîstanê dike jî, nivîskar, gelek caran bi zanebûn rewşên xerab ên berîya Sovyetê an jî bûyer û serpêhatîyên berîya Sovyetê tîne dide ber me, da ku di hewla xwe ya îspatkirinê de li hemberî me bi hêz be û karibe pirsên me bi rehetî bibersivîne.

Di destpêka romana *Hopo* de, bi Cimo re em diçin nav gundê Axbaranê, ku ew piştî “şerê wetenîyê” biryar dide vegere gundê xwe û ji bo Sovyetê xebata xwe li wir berdewam bike. Bêguman ev awayê vegerînê, di heman romanê de li çend cihên din jî tê pêşîya me, ku dîyar e wê demê ev wekî polîtîkayeke fermî dihat dîtin. Hesen û

Zînê jî, ku du lehengên sereke ên vê romanê ne, piştî tehsîla xwe, vedigerin gund û li kolxozên gundê xwe rêveberîyê dikin. Di vir de em hesta dildarîyê dibînin, lewra tişta ku nivîskar dixwaze bi me bide zanîn jî ev e. Ji ber vê ye, gelek caran gava tê pêşîya me, em dibînin ku Hesên, Zînê, Sertîp, Cîmo, Hopo û gelek lehengên din ên romanê birçî û bêxew dimînin lê dîsa jî ji xebata xwe kêr nabin.

“Lembeyên Îlyîç (Lenîn)”, “nanê genimî”, “xanîyên bilind ên kevîrîn”, “maşîn” û “tîrextor” çend têgehên sereke yê vê romanê ne, ku ew hertim wekî pîvan hatine bikaranîn û dubarekirin di navbera berîya Sovyetê û wextê di bin hukmê Sovyetê de. Her gava ku nivîskar dixwaze berîya Sovyetê li ber çavên me rêş bike û dema ku roman tê de derbas dibe, yanî wextê Sovyetê, bi me şîrîn û xweş bike, ji van têgehên jorîn yek teqez der tê pêşîya me. Ev têgeh, temsîla Sovyeta pêşketî ne û pê re nîşaneyên *Emrê Teze* ne. Herwisa em dikarin bibêjin, ev têgeh, bi sedemên ku me li jor gotin, armanca nivîsandina vê romanê jî di xwe de dihevin.

Eger em hinekî li ser bisekinin, em dikarin lembeyên Îlyîç, hem bi awayê rastî, hem jî bi awayê mecazî wekî temsîla ronahîyê bibînin. Awayê rastî jixwe eşkere ye, lembe ne û derdora xwe ronî dikin. Awayê mecazî, ew fikr û peyam e ku nivîskar pir caran hewl dide bigihêjîne me. Çi ye ew fikr û peyam? Helbet “ronahîya fikrî” ye, ku li gor nivîskar, Sovyet destpêk û çavkanîya wê ye. Bêguman, bi çî armancî hatibe behskirin jî ji bo me hebûna wê (eger hebe, ji bo me nîşane ye) girîng e. Lewra tişta ku em li pey digerin niha ew e.

Gava Sertîp diçe tewleya çêlekan, tewle bi lembeyan ronî ye û Sertîp tîne bîra xwe ku berê li tu maleke Kurdan ev lembe tunebûn, lembeyên neftê hebûn lê ew jî bi kêr nedihat:

*Kete bîra Sertîb: Beriya dîwana Sovêtiyê ronahîya wiha di tu malên Kurdan da tunebû. Lempeyên neftê jî, di mala hemû kesî da tunebûn. Di malan da çirayêd neftê vêdixistin, an çiralixêd ji donê bizinan. Ew jî hemangî birûsî didan. Lê gava ku mirov sibehtirê radibû, ber bêvilêd mirovan bi teniyê rêş dikirin.*¹⁷⁷

¹⁷⁷ Şemo, *Hopo*, r. 20.

Bêguman, ew cihê ku dibêje “Sertîp tîne bîra xwe”, eger em li gor armanca sereke ya vê romanê bifikirin, em ê serwext bibin ku naxêr, Sertîp van tiştan nayne bîra xwe, di rastîyê de nivîskar tîne bîra xwendevan, da ku berawirdîya her du deman bê kirin.

Di *Hopo* de, nanê cehî û genimî bûne temsîla feqîrî û dewlemendîyê. Ya rast ne tenê di *Hopo* de, Erebe Şemo, di *Jiyana Bextewar* de jî, pir caran ev her du temsîl bi kar anîne, da ku em rewşa aborî ya wan kesên ku qala wan tê kirin bizanibin. Di *Hopo* de Hesên û Zînê li du gundên cîran, agronom (Endezyarê Zîreetê) in. Zînê bi hunera xwe dike ku gundîyên wê, salekî berîya gundîyên Hesên nanê genimî bixwin, ku nanê genimî berîya Sovyetê tenê para dewlemendan bû û bi destê xelkê nediket. Hedefa Hesên û gundîyên wî jî ew e ku êdî ne nanê cehî lê nanê genimî bixwin, ji ber ku wan îmkân heye û lazim e van îmkânên ku Sovyetê daye wan (wekî toximê genim ê Kûbanê, erd, terextor, maşîn...) badilhewa neçin:

*Hesên ketibû mitalan der heqa wê yekê de, wekî gundê wî hê nanê ceh dixwin. Wî divîya wisa bikira, wekî nanê wan jî rind şîn bihata û ji nanê gundên cîranan kêmtir nebûya.*¹⁷⁸

Dîsa di warê aborîyê de, da ku em bizanibin rewşa gundîyan çiqas baş e û ji halê xwe razî ne, nivîskar, gelek caran bala me dibe ser tirextor û maşînan, ku ew jî li gor nivîskar bi xêra dîwana Sovyetê hatine ber destê van gundîyan, loma gundî her gavê şikurdarî û minetdarîya xwe tînin ziman:

Carinan kal di odeyan da rûdiniştin:

- *Şukir ji partîya Lenîn ra; kê bawer dikir wê wexteke wisa bê, wekî kurê Kurdan jî hînî maşîneke wisa bibe, a ku xwe bi xwe di rêyan da here û ji ga, hespan, deveyan jî zûtir here, şukir...*¹⁷⁹

.....

¹⁷⁸ Şemo, *Hopo*, r. 150.

¹⁷⁹ Şemo, *Hopo*, r. 26.

Gundî, biçûk û mezin derketin derve û bi ken û eşq digotin, “Hatin hatin, maşînên me hatin” û bi bez bi pêşîyê da çûn. Berî gişan zarokêd biçûk xwe gihandin maşînan. Keçan destên xwe dirêj dikirin, digotin, “Ewê han Egît e, ewê han Lûlo ye, ewê han jî Îsko ye.”¹⁸⁰

Eger ji alîyê aborîyê ve em li vê romanê binêrin û qala qelî û birincê nekin nabe. Çawa ku me li jor behsa nanê ceh û genimî kir û me got di *Hopo* de pir caran derbas dibin û ew wekî temsîla hejarî û dewlemendîyê tînin, bi heman awayî qelî û birinc jî di *Hopo* de pir caran cih digrin. Xelkê ku di *Jiyana Bextewar* de devê wî bi çênîyekî goş neketibû, di *Hopo* de hema bêje her roj qelî û birincê dixwe.¹⁸¹

Di *Hopo* de, “xanî” jî yek ji wan temsîlan e ku nivîskar pir li ser sekîniyê û gelek caran bi devê lehengan agahî daye xwendevanan, bê xanîyên berê û niha çawa ne. Helbet em van agahîyan wekî nîşaneyên dema *Emrê Teze* qebûl dikin û wekî referans dibînin ji bo rewşa aborî ya wê demê. Bi saya van nîşaneyan, xwendevan fêr dibin ku xanîyên berîya Sovyetê binerd, biçûk û tarî bûne, lê yê di dewra Sovyetê de modern in, ji kevîrên tûfê hatine çêkirin, bilind in û ronahîyê dibînin. Helbet ev jî bi xêra diwana Sovyetê ne, ku li ser navê nivîskar, leheng careke din şikûrdarî û minetdarîya xwe ji Lenîn, Partîya Komunîst û Sovyetê re tînin ziman:

*...Wî dît, di nava wan pênc salên ku ew çûbû Êrêvanê de, gund lap hatibû guhestin. Êdî ew xanîyên berê yê binerd qet tune bûn. Xanî giş ji kevîrên tûfê yê birî hatibûne avakirin.*¹⁸²

.....

- Ji min tirê gundê we mîna gundêd me yê li welatê Mûşê ne? Gişke binerd bûn, lê ev xanîyêd we mîna xanîyêd geheran in tu firqî tune, weleh min nizanîbû gundêd Kurdan wisa gund in.

*- Xaniyêd me yê berê binerd bûn, lê bi saya Diwana Sovîtiyê em ji binê erdê derketin ronîyê.*¹⁸³

¹⁸⁰ Şemo, *Hopo*, r. 26.

¹⁸¹ Şemo, *Hopo*, r. 64.

¹⁸² Şemo, *Hopo*, r. 81.

.....

*...sal bi sal halê me hê pak dibe, hûn li xaniyê xwe binihêrin, hûn ê bi dest xwe ra bibînin halê xwe yê berê û halê niha. Gelo begêd me, an axayêd me, wexta ku hemû mecal di destên wan da bû, di xaniyên wiha da qe dijiyan? Komunîstan ev yek da me...*¹⁸⁴

Di Jiyana Bextewar de, gava me bala xwe didayê, pirsgerêka herî mezin bêguman feqîrê û hejarê bû. Zilma axa, beg û dewletan rê nedidan ku xelk bi kar û barên xwe yê rojane re mijûl bibin. Kesekî hal û mecal nemabû ku siberoja xwe bifikire. Eger di roja xwe de karîbûna zikê xwe têr kiribana, ew roj ji bo wan kêfxweşî bû. Hemû û kul derdên wan, hinekî hizûr û aramî bû. Li ser vê mijarê, gava em berê xwe didin romana *Hopo*, em xweş dibînin ku ev metirsî bi temamî qedîyane. Ew mirovên ku ketine bin hîmayeya Sovyetê li gundan bi cih bûne, bi alîkarîya Sovyetê ji xwe re xanî çê kirine, erd ketine destên wan û çandinîyê dikin. Ji vê demê û pê ve, hemû jiyana wan, kul û derdên wan, karûbarên gund yanî heywan, erd û çandinî ye. Hêvî û daxwazên wan, xewn û xeyalên wan bi temamî li ser vana ne. Ji bo wan kêfxweş an jî xemgîn dibin. Helbet em dizanin nivîskar dê vê jî bibe li hebûna Sovyetê biqelibîne. Lewra ev erkekî Realîzma Sosyalîst bi xwe ye, ku Sovyet sedema hemû xêr û xweşîyan e, mîna ku berîya Sovyetê, ji bo ku gundî rewşa hewayê bizanibin divê biçûna cem faldar, şêx û melayan, nivîst çê bikirana an jî qurbanî bidana, lê di dema Sovyetê de, bi xêra dîwana Sovyetê, tenê li nûçeyên radyoyê temaşe dikin an jî rojnameyan dixwînin:

Kolxozvan ketibûn tefekurîyê, wekî ekinê wan bi derengîyê nekeve, çimkî heke ekinê wî çîyayî bi derengîyê ket, êdî hebek nan nade û mexlûqet ê bê nan bimîne, lewma ew wisa di heyra bihîstina radyoyê da bûn.

Êvarekê, klûb tijî kolxozvan bû, ji nişkê ve dengê Radyoya Rurdî ji Êrêvanê hat, dîktor got: "Hevalêd radyoguhdar, ew berfa ku van rojan toisa gele barî li nebyêd Ermenistanê ye çîya, ew hukmê sîklonê bû ji

¹⁸³ Şemo, *Hopo*, r. 112.

¹⁸⁴ Şemo, *Hopo*, r.168.

şimalê, rast e, berf gele ket, lê sîklon êdî vekîşîya. Van roja tav ê dîsa bide û bihar ê wextê da bê. Xeber da Radyoya Kurdî, Êrêvan...

Kolxozvan giş şa bûn, kalekî got:

- Ê wekî ev bager berî Diwana Sovêtiyê biqewimîya, gelo me yê çi bikira? Em ê biçûna cem faldaran, an jî cem mele û şêxan çi ka ew çi dibêjine me. Wan ê bigotana: "Herin qurbanan bidin, pêz şerjê bikin, çiralixan bidin, me jî ji bîr mekin."¹⁸⁵

Romana *Hopo*, romaneke kolxozvanîyê ye. Lehengên romanê, hema bêje bi temamî kolxozvan in. Hinek diçin ber heywanan, hinek jî bi erdên dora gundê xwe re mijûl in. Ne tenê mêr, jin jî di nav vê pergalê de ne. Li gor romanê, ji bo ku însanek bixebite, hemû îmkân hatine çêkirin. Eger jinek bixwaze bixebite lê zarokên wê hebin, hewce nake mitalan bike, dîwana Sovyetê çareya vê jî peyda kiriye û nahêle ku zarok li nav herî û gemarê qirêj bibin û bi ser de jî dike ku xwarina baş bixwin:

....baxçeyê zarokan vekirîye. Her uzvê kolxozê izna wan heye zarokên xwe bibe bexçe, bila zarokên wan di nava herî û gemarê da negerin, bila di bêxçe da xwarina baş bixwin û li cîyê rihet razên.

*Çend jinan got: "Me zarokên xwe daye baxçeyê zarokan, li wê derê bi rastî zehf pak e ji bo zarokan."*¹⁸⁶

.....

Jinikê jî got: "Em jin ji hevalê Morov zehf razî ne."

- Seba çi hûn ji min razî ne?

- Seba wê yekê ye, wekî te baxçeyê zarokan vekir. Em niha serfînyaz zarokan dibin wê derê, dihêlin û diçin ser xebatê.

- Çima min baxçe vekiriye? Partîya me û Lênîn baxçe vekir.¹⁸⁷

¹⁸⁵ Şemo, *Hopo*, r. 39.

¹⁸⁶ Şemo, *Hopo*, r. 54.

Kolxozvan eger jêhatîbin û rind bixebitin, wêneyê wan li ser rojnameya *Rya Teze* tê weşandin û di *Radyoya Yêrêvanê* de pesnê wan tê dayîn. Bêguman ev bi armanca motîvekîrîne ye, da ku xebata wan li paş nemîne.¹⁸⁸ Helbet ji bo motîvekîrîne ne tenê ev heye, carinan kolxozvan di navbera xwe de dikevin lecê jî, ku jê re dibêjin “leca sosyalîstîyê”. Wekî em di Hopo de dibînin, Sertîp û Zînê, tevî kolxozvanên xwe ji gundê Axbaranê diçin gundê Darebîyê û doza lecê li Hesên û kolxozvanên wî dikin, bi armanca ku di nav salekê de kolxozê kîjan gundî pirtir bixebite û têkeve karê.¹⁸⁹

Romana *Hopo*, li gel berhemên din ên wekî *Jiyana Bextewar*, *Dê û Dêmarî*, *Hewarî* û *Morof*, ne tenê guherînen aborî û çandîniyê nîşan dide, herwiha bi şewaza Realîzma Sosyalîst, mîsyoneke îdeolojîk jî pêk tîne. Di van romanên de, bi sembolen wekî “kolxoz”, “lembeyên Îlyîç”, “nanê genimî” û “xanîyên kevirîn” berawirdiya berîya Sovyetê û serdema Sovyetê tê kirin. Nivîskarên van berheman, bi rêya lehengên xwe yê fedakar û xebatkar, ne tenê serkeftinên aborî û civakî yê pergala Sovyetê vedibêjin, herwiha xwendevanan teşwîq dikin ku bi xebata kolektîf û bawerîya bi Komunîzmê, siberojeke geştir biafirînin. Bi vî awayî, ev roman, wekî tabloyên hunerî yê Edebîyata Kurdî ya ewra Sovyetê, hem çîrokên jiyana gundîyan vedibêjin û hem jî armancên îdeolojîk ên wê demê diparêzin.

2.4. Çand û Huner

Di romanên Kurdî yê Sovyetê de, têgeha “Emrê Teze”, bi awayekî berfireh çand û hunerê, wekî amûrên sereke yê guherîna civakî temsîl dike. Ev berhem nîşan didin ku, edetên Kurmancî (govend, stran, zewac, beranberdan û edetên êlî) çawa bi nîrxên nûjen ên Sosyalîst re têne tevlihev kirin, ku di encamê de çandêke tîkel a Kurmancî-Sosyalîst peyda dibe. Huner, di van romanên de ne tenê wekî vegotîneke şexsî, lê wekî amûreke kolektîf a şoreşê tê dîtin, ku armanca wê avakirina kesayetîya “mêrê nû” û “jina nû” ya bi fikr û ramanên îdeolojîya Sovyetê ye. Di van romanên de hêmanên folklorîk, li gorî îdeolojîya Sovyetê tîne adaptekirin, herwiha hêmanên sereke yê nasnameya Kurdî, wekî ziman û hin edetên êlî, tîne parastin. Ev yek

¹⁸⁷ Şemo, *Hopo*, r. 39.

¹⁸⁸ Şemo, *Hopo*, r. 61.

¹⁸⁹ Şemo, *Hopo*, r. 190.

nîşan dide ku "Emrê Teze" ne tenê temsîla guherîneke aborî û sîyasî dike, herwiha temsîla şoreşeke çandî û hunerî jî dike, ku di navbera kevneşopî û modernîteyê de pevçûneke dîyalektîk çêdike.

Di Hewarîya Heciyê Cindî de, beşa duyem, bi temamî li ser jîyan, çand, erf û edetên berê yên Kurdan e. Li gor vê romanê, berî ku Kurdên Êzîdî derbasî Sovyetê bibin, li hêla Serhedê, li derdora Qersê niştecih in. Di nav şer û pevçûnên di navbera dewletên herêmê de, li gor qaîde û edetên xwe dijîn. Lê ji ber şer û pevçûnan, dek û dolabên Osmanî û Împeratoriya Rûsan û şîrîkên wan, ku dixwazin dudulîyê têxin navbera Kurdên Misilman û Êzîdî, ji halê xwe bêzar dibin. Jixwe piştî ku Sovyet ava dibe, em dizanin, dibin niştecihên wê û rewşa wan a çandî, hunerî, aborî û zanyarî jî di beşa yekem de, gava ku lehengê me li nav gundê wan digere, em dibînin. Helbet cihê ku em ê li ser bisekinin jî beşa yekem e.

Di beşa yekem de, gava ku vegêr yanî lehengê sereke diçe gundê Kûrekendê, em jî pê re li nav gund digerin û dibin mêvanê Apê Şewêş û Moskov. Ew zemanê şer û pevçûnan li paş maye. Gundî, bi kar û barên xwe yên rojane re mijûl dibin. Herçiqas jî welatê xwe dûr mabin û ketibin bin hikmê Sovyetê jî, çanda xwe ya mêvandarî, mirovhezî û qedirzanîyê diparêzin. Li şevbihêrkan rûdinin û sohbetan dikin. Esl û nesebê xwe ji bîr nekirine û girîngîyê didin derdora xwe. Li ziman û zarê xwe xwedî derketine û hay ji kevneşopîyên xwe hene. Li gel van hemûyan, em dibînin ku ji gelek alîyan ve, bi taybetî jî di warê rola jinan de, guhertinên mezin çêbûne ku Apê Şewêş vê yekê wiha tîne ziman:

- *Bi serê te, dinya hate guhestinê. Gelo kê dîtibû, wekî li vî erdê me jina Kurmanc bê, li deştê pembû û tiriyan hilde dayne...*¹⁹⁰

Dîsa di sohbetên navbera Apê Moskov û lehengê me de, em hîn dibin, ji ber îmkanên ku diwana Sovyetê daye Kurdan, li gundê Kûrekendê û derdorê, keç û law tev bi hev re li dibistanan dixwînin û dibin xwedî kar. Helbet di vir de, tiştên ku nivîskar bi xwe jî dixwaze bala me bixşîne ser, nêrîna Sovyetê ya derheqê maf û statuya jinan de ye. Di beşa duyem de, yanî berîya avabûna Sovyetê, gava ku Kurd di

¹⁹⁰ Cindî, *Hewarî*, r. 109.

bin hikmê Osmanî û Împeretoriya Rûsyayê de ne, em dibînin ku jin tenê ji bo xizmeta malê, zewacê û zarokçêkirinê ne. Tê kuştin an jî revandin. Gotin û biryara wan bêqîmet e. Lê di beşa yekem de, yanî piştî ku Sovyet ava dibe û Kurd xwe li wir digirin, rola wan diguhere. Êdî tevî civatê dibin, serbilind digerin, dixwînin û di karê xwe de bilind dibin.¹⁹¹

Ji aliyê çand û hunerê ve eger em lê binêrin, *Morofa* Eliyê Evdilrehman, tê û tije ye. Êl û eşîrên ku bûne mijara vê berhemê, li zozanan, tevî pez û dewarên xwe bi şeweyê kurmancî dijîn, ta ku ji hev diqetin û piranîya wan derbasî axa Sovyetê dibin. Helbet li zozanan, belkî jî ji ber ku nivîskar hertim bala me dikşîne ser vê, tehde û zilma ku Selîm Beg li mirovên derdora xwe dike, bêtir xuya dibe. Lê dîsa jî, jiyan û çanda wan a koçerîyê berbiçav e, ku bi taybetîyên xwe jî ji çanda tevahîya Kurdên derdorê ne cudatir e. Jin, bi karûbarên malê re, mêr jî li derve, bi pez û dewaran re mijûl dibin.

Di *Morof* de, heta dawîyê jî hewleke mezin heye, ji bo ku guherînek çê bibe li nav civakê. Ew guherîn, piştî ku Morof û hevalên xwe derbasî Sovyetê dibin, çê dibe. Lê Morof û hevalên xwe para xwe jê distînin an jî nastînin em nizanin. Lewra çîroka wan berdewam nake. Em xwe li nav civak û çandeke nû dibînin ku mirovên wê ne koçer, lê gundî ne. Li şûna zozanan, di gund de dijîn. Keç û xort naçin ber pez û dewaran lê diçin dibistan û bajaran. Li seyrangehan bi hev re dilizîn û nameyên bi eşq û evînî ji hev re dişînin. Bi dilê xwe ji hev hez dikin û bêtir pirsgerêk digihîjin hev. Di dawetan de li gor erf û edetên xwe kêf û şahîyan dikin û razîbûn û hezkirina xwe ya ji bo Partîya Komunîst û Sovyetê bi lêv dikin:

Gundê Hebilkendê di orta çemên Hrazdanê û Erez de cîwar bûye. Li wê derê, daweta Mehmed û Xanimzerê ye. Qîz, bûk û jinên Kurdan algevez li xwe kirine, govend girtine û direqisin. Di odeyekê de jî, dengbêj kilamên siwaran û yên bengîtiyê dibêjin, cimaetê mijûl dikin. Di odeyê de din de dixwin û vedixwin, fîncanan bilind dikin, bo saxiya her du gulan vedixwin, dê û bavên zavê û bûkê caba wan kasên saxiyan didin,

¹⁹¹ Cindî, *Hewarî*, r. 43.

razîbûna xwe 'elamî vexwariyan dikin. Paşê dê û bavên bûk û zavê dikevîne govendê, direqisin, şa dibin û dibêjin:

- Şayiyên wihaya bila li ber derê mala her bineciyekî be. Em bo şayiyê razîbûn û hezkirina dilê xwe didine Partîya Komûnîst û hukimeta xwe ya Sovyetîyê.¹⁹²

Di Dê û Dêmarîya Egîdê Xudo de, serê pêşî em şerê du dewletên mezin - Sovyet û Almanya- dibînin ku gundekî Kurdan, Mêrgesor, para xwe ji vî şerî distîne. Gelek kes diçin şer lê venagerin. Zarok bê dê û bav dimînin lê Sovyet êtîmxane û dibistanan dide çê kirin û li wan xwedî derdikeve. Ne tenê ji bo zarokan, ji bo malbatan jî xaniyên nû û ji bo xizmeta wan a fermî, sazîyên nû dide çê kirin. Wext derbas dibe, rojên berê li paş dimînin, birîn derman dibin, êş û azar diqedin û ciwan dikemilin. Jiyana nû, tê avakirin. Lê vê carê şerekî din dest pê dike ku ev ne di navbera dewletan de ye û ne şereke çekan e jî. Helbet ev şerekî çandî ye ku li nav gundîyên Mêrgesorê bi peyv û gotegotan dest pê dike. Bêguman em dizanin ku ev şer bi daxwaza nivîskar dest pê dike, lewra, herçiqas Sovyet ava bûbe û bi milyonan millet tabîê wê bûbin jî, dîyar e pîrsgirêkên çandî di navbera nav milletan de hene, ku ji bo pratîka qaîde û qanûnên Sovyeta Komunîst xeterîyê çê dikin. Berhemên ku bi rê û rêbazên Realîzma Sosyalîst hatine nivîsandin, kanîya pîrsgirêk û çareserîyan in jî. Di van berhemên de pîrsgirêk hertim hene û çareya wan jî hazir e. Lewra ew, bi pîrsgirêk û çareserîyên xwe, berhemên sîparîşkirî ne. Di Dê û Dêmarîyê de çi pîrsgirêk û çareserî hene, em hinek em qala wan bikin. Saşa, gava ku ji Sîsê hez dike û dixwaze pê re bizewice, mîna ku li dîwarekî biqelibe, rastîyên civakî der tînin pêşîya wî. Civaka ku tê de mezin bûye, Êzîdî ne û ew bi eslê xwe Rûs e. Hem ji alîyê dînî ve, hem jî ji alîyê etnîkî û çandî ve zewaca wan dikeve xeterê. Li gund, nîqaşên mezin dest pê dikin. Hinek (li gor ku terîfa wan tê kirin, ev kesên nezan in) dibêjin Saşa Rûs e, Sîsê Êzîdî ye, loma ne mimkun e her du bi hev re bizewicin, hinek jî (li gor terîfê ev kesên zana û şareza ne) dibêjin ma çi ferqa Rûs û Êzîdîyan heye, divê bizewicin. Lehengê bi navê Apê Reşîd, ku li gor terîfê ew yekî zana ye, li hemberî bavê Sîsê, Efo, wiha piştgirîya Saşa û Sîsê dike:

¹⁹² Evdîlrehman, *Morof*, r. 101.

Canê min hela ji min re bêjin, çiyê Êrîsa di wî xortî da heye, we kiriye serê xwe, Êrîs e ha Êrîs e! Li wî, xeberdana wî, rabûn-rûniştandina wî dinhêrî, bi çend cara ji cahilên me yên din baştir e... Hela bêje, Efo, te çi qusûr di wî da dîtiye? Hema em miletê Êrîs hildin pêş çavan, axir ev miletekî dinyayê yî here birehm û qenc e, Xudênas! Qedera wî xortî jî rûyê vî şerî, awha li hev hatiye. Karê jî, bi Xudê va eyan e, jineka bi navnamûs e, ew mezin kiriye, çawa hewce ye usa terbiye-tore dayê, xort jî ketiye kirasê me, îdî çi dixwazi, hela bêje!. Em xilaskiriyê kê ne? Hûn cahil in, nayê bîra we, salên reve-revê ji destê Roma Reş, wextê em ji welatê xwe der ketin, kê em xelas kirin, hî? Em çima dûr diçin? Di vî şerî da Êrîs nebûya kê zane ew Hîtlerê merivxur wê çi bihaniya serê me? We ji bîr kiriye?¹⁹³

Bêguman di vî şerê civakî de daxwaza nivîskar û li paşnûmaya vê daxwazîyê, îdeolojîya Sovyetê bi ser dikeve.

Wekî din jî, di vê romanê de, hinek pîrsgirêkên erf û edetî (mîna qelenddayînê) hene ku li gor nivîskar (herwiha li gor îdeolojîya Sovyetê) divê bîn terikandin. Ji ber ku ti fêdeya wan ji mirovan re tune. Em van pîrsgirêkan ji Sîsê hîn dibin. Lê berî ku qala van pîrsgirêkan bike, xweşîyên erf û edetî yên civaka xwe jî tîne ziman:

- Dayê, tu zanî, di nav edetên me yî miletiyê da giştan zehftir çi bi min xweş tê? ...

- A, wekî, roja eydê gundî hemû diçine malên hev, eyda hev pîroz dîkin. Yên ku bi hev ra ne xweş bin jî wê rojê li hevdu tên. Tu zanî ev tişteki çiqas rind e? Paşê, wextê ku yek dimre, gund hemû şînê dîkin, hewariyê mala mirî dibine mala xwe, wextê dawetan jî gund gişk şadibe, mêvanan di nav hev da belav dîkin. Tişteki kûr û mezin di nav qewimandinan da heye. Ez awqas kitêbên nivîskarên cur bi cur miletan dixwînim, tu rastî edetên awha nehatime...

- Tu rastî, qîza min, te rast texmîn kiriye, lê çi bi te xweş nayê?

¹⁹³ Xudo, *Dê û Dêmarî*, r. 60.

- Heyf, dayê can, li rex tiştên ha yên rind, yên xirab jî hene. Behsa xeberê, qelendê qîzan. Ew tişteki sosretî ye, dê û bavê qîzê û xort rûdinin, bazarê dikin, qey bêjî dewar yan jî tişteki din dikirin, difroşin. Tiştên bi vî tehrî dîsa hene, çima hûn nizanin?¹⁹⁴

Jiyana Bextewar, li ser êleke Kurdan, Sipîkan, hatiye nivîsin. Li gor romanê, ew li devera Entabê, ku dikeve navbera çiyayên Sîpan, Kosedax, Eledax û Dûmanlîyê, dijîn. Herçiqas şer û pevçûn, zilm û zordariyên axa, beg û dewletan li serê wan bûbin bela jî, li gor çanda xwe, bi erf û edetên xwe yên kurmancî dijîn. Piştî ku ji devera Entabê direvin û li derdora çiyayê Elegezê binecî dibin, heta ku Sovyet ava dibe, rewşa jiyana wan zêde naguhere. Bêguman ew guhertina ku ji hemû alîyan ve bandorê li jiyana wan dike, bi avabûna Sovyetê re dest pê dike. Piştî ku Sovyet ava dibe, li nav vê êlê û derdora wê, di warê hizrî, aborî, çandinî û perwerdehiyê de, nîşaneyên guherînê pir tîn dîtin lê di warê çandî de divê em berê xwe bidin romana *Hopo*, ji ber ku di *Hopo* de, jiyana van însanan stabîle dibe û bi vê sedemê nivîskar bala me dikşîne ser çand û jiyana wan a rojane.

Hopo, mîna gelek romanên din ên Kurdî, romaneke gundewarî ye. Ji ber ku mijar, tim û daîm li ser çandinî, heywandarî û têkilîyên li ser kar û barên rojane ên gundîyan e. Lê tişteke din heye ku *Hopo* cudatir dike. Gundên ku wekî mekan hatine bijartin, têkilîya wan her bi dewletê re heye. Helbet dewleta ku em behs dikin Sovyet e. Sovyet, bi sazîyên xwe yên wekî kolxoz, nexweşxane û dibistanan li van gundan e. Gundî bi xwe jî, lingekî wan timî li bajarên Sovyetê ye. Zarokên wan pêşî li gund, pişt re diçin bajaran dixwînin. Mezin jî li nav erd, zevî û bostanan dixebitin û diçin ber heywanan. Bi rêya kolxoz û berpirsiyaran, kêmasîyên xwe yên her gavî temam dikin. Herçiqas têkilîya wan bi medenîyetê re, ango bi bajar û bajarvanîyê re zêde bûbe û îdeolojiya Komunîzmê li ser wan hatibe ferzkirin jî, em di rewşa wan a Kurdbûnê de kêmasîyeke mezin nabînin. Ew bi zimanê xwe diaxivin û herçiqas hinek guherîn çê bûbin jî, bi piranî li gor çanda xwe ya berê dijîn. Wekî mînak, hê jî şerm e ku keç û kur biçin ba hev. Hesen gava diçe serdana Zînê, ji ber vê şermê, Zînê, wî wekî nasê xwe dide nasîn:

¹⁹⁴ Xudo, *Dê û Dêmarî*, r. 70.

*Zînê dizanibû edetên kevn di gund da hê berk in û hê zehf şerm û kirêt e, wekî xortekî xerîb bi ser keçikan da bê, lewma wê got, wekî Hesên nasê wê ye.*¹⁹⁵

Di gengeşîya navbera Zînê û Hesên de, em pê dihesin ku ev edet divê bên rakirin, ji ber ku kevn mane û ne li gor demê ne. Mîna ku dîyar dikan, ev bar li ser milê ciwanan e û rakirina van edetan ne karekî hêsan e:

- *Te çima caba min neda? Te çima nenivîsî tu yê kîngê bêyî? Çima tu nizanî gundî hê li ser edetên kevnê?*

- *Rastîyê bibêjim, Zînêcan, min kir ku binivîsim, lê paşê min da hişê xwe, heta ku name bigihîje te, hazir ez ê bême cem te. Ê bila gundî bibêjin, em çima bitirsin?*

- *Şixul ne di tirsandinê da ye, Hesên, tu dibînî gelek guhestin ketine gundêd me, lê hê gelek edetên kevn jî di gundan da mane, em nikarin di wexteke kin da wan edetên sal û zemanan bidin hildanê. Xebata min jî, di nava wan da ye, timî li ber çavên wan e, aqilê min î birî famdarî ye ez çi dibêjim.*

- *Na, Zînê, gerek em cahil wan edetên kevn bidin hildanê.*

- *Tu rast dibêjî, Hesên, lê ew yek di derbekî da nabe. Xwe ew ne xanîyek e tu bihedimînî û yekî din li dewsa wî çê bikî.*¹⁹⁶

Ev edetên ku bûne belayê serê ciwanan, li gor nivîskar, ji alîyê jinên pîr ên xurîfî ve tên parastin. Lê zû an jî dereng, dê rojekî bê û ev edetên kevn ji holê bên rakirin.¹⁹⁷

Edetekî din jî heye ku di vê berhemê de wekî pîrsgirêkeke mezin hatiye destnîşankirin, di warê mafê jinan de, ku ev pîrsgirêk qelenddayîn e. Loma em her

¹⁹⁵ Şemo, *Hopo*, r. 85.

¹⁹⁶ Şemo, *Hopo*, r. 86.

¹⁹⁷ Şemo, *Hopo*, r. 92.

gavê, ji ber qelenddayînê, rastî îtiraz û nîqaşên keç û jinan tîn, ku bi piranî ji vê edeta kevn ne razî ne, lê ji gotinên wan jî dîyar dibe ku pêvajoya guherînê dest pê kiriye:

- *Niha êdî ne ew wext e, gava ku qîzên cahil bi zorê didan mîrên kal, ji bo ku qelenê pir bistînin, ew wext çû, êdî tune.*¹⁹⁸

Di *Hopo* de, dîyar dibe ku rol û statuya jinan a li nav civakê, ne mîna berê ye. Jin, mîna berê di mala xwe de rûnanin û tenê bi karê malê re mijûl nabin. Ew xwedîgotin û xwedîyê heqê biryardayînê ne êdî. Jinên ciwan, li hemberî edetên kevin, ên ku pêşîya wan digrin û li hemberî kesên ku van edetan diparêzin, derdikevin. Li gor wan, xwedîyê wan êdî ne bav û bira ne, dîwana Sovyetê bi xwe ye. Zelêxeya dêya Hesên jî yek ji wan jinan e ku, mafê xwe yê jinanîyê diparêze. Ew, li ser vê mijarê, bi dêya xwe re pir caran dikeve nîqaşê û wiha mafê xwe diparêze:

- *Çima ez ê bê xweyî me? Xweyîyê min dîwana Sovyetê ye, ya ku azadî da min û da we jî... Tu dibêjî ez miqabilî edetên me Kurdan diçim, lê çawa ez miqabilî wan edetan neçim? Çima te ji bîr kiriye, we dixwest bi zorê, bêyî dilê min, ez bidama kurê wî dewletiyê, wî dînikî û bêaqilî...*¹⁹⁹

Ji gotinên Dûko jî, ku ew bavê Zelêxê ye, tê piştrastkirin ku dem, ne ew dema berê ye. Êdî dîwana Sovyetê li pişt jinan e:

- *Niha ne wextê berê ye, wekî ez herim gulîyên wê li destê xwe bialînim û bi kutanê bînim malê. Dîwan, niha li pişt wan e.*²⁰⁰

Di meseleya qîzrevandinê de jî, em rastî guherînên bi vî rengî tîn. Ev tevger, mîna berê bi xweşî nayê pejirandin û mîna edetekî aqilane û maqûl nayê dîtin. Wekî mînak, Egîdê ku dil dikeve Zînê, gava daxwaza revandina Zînê pê re çê dibe, carinan di nav xwe de dikeve nav muhasebeyan, ka ev tevger rast e an na. Ji ber ku ew Komunîst e û tiştên wiha ji zû ve neqewimîne.²⁰¹

¹⁹⁸ Şemo, *Hopo*, r. 112.

¹⁹⁹ Şemo, *Hopo*, r. 124.

²⁰⁰ Şemo, *Hopo*, r. 129.

²⁰¹ Şemo, *Hopo*, r. 256.

Gava ku Egîd hewarîya xwe digihîjîne hevalên xwe û daxwazîya xwe rave dike, bersivên hevalên wî, ji bo me jî dibin bersiv, ku guherînek çawa çê bûye li nav civakê:

- *We soz daye hev du, ew razî ye?*

- *Na, min qe tu caran negotîyê, wekî dilê min ketiye te.*

- *Dêmek tu dixwazî bi zorê wê birevînî? Mîna berê? Û dixwazî em komekê bidine te?*

- *Çima tu nizanî, ev şixul ji bo me komsomolan tiştêkî ne pak e û bênamûsî ye?*

Yekî din jî got:

- *Egît, ne tu çûyî qursan, tu bûyî sinetçî, tirextorçî, xwe tu ne sersax î? Niha êdî kesek qîzan narevîne, ew wext çû, bira, ne tu komsomol î? E'mrê teze tu yê çê bikî, tu diçî pey wan şixulan, ên ku berê kal û pîrêd me dikirin, heyran!*²⁰²

Di romana *Hopo* de, mijareke din jî heye, ku ji hêla çandî ve pir bala me dikşîne. Di romanên din de, wisa bi girîngî û hûrgilî, li ser edetekê ku civak bi temamî jê razî ye, nehatiye sekinandin. Sedem herçiqas îspata jiyana nû ya aram be jî, Erebe Şemo, pîrozbahîya *Beranberdanê* ji bîr nekiriye û di vê berhema xwe de cih dayê. Di vê pîrozbahîyê de, bi qasî beran û mîyan, gundî jî têra xwe kêf û şahîyê dikin û dawîya dawî spasîyên xwe li Partîya Komunîst dikin, ji ber ku ev rehetî û derfet daye wan:

- *Ez ê vê fîncanê vexwim bi eşqa Partîya Komûnîstan, ya ku azayî da me, Kurdêd belengaz ên ku timî nuxsan û bindest bûn; bi eşqa xebatçiyên me kolxozvanan, hûn niha êdî xebata me ya aza û xebata me ya bitifaq dibînin. Sal bi sal halê me hê pak dibe, hûn li xaniyên xwe binêrin, hûn ê bi dest xwe ra bibînin halê xwe yê berê û halê niha. Gelo begêd me, an*

²⁰² Şemo, *Hopo*, r. 264.

*axayêd me, wexta ku hemû mecal di destên wan da bû, di xanîyen wiha
da qe dijiyan? Komûnîstan ev yek da me...*

*Di pey van gilîyên Sertîb re, giş rabûn ser pîyan û bi hev ra vexwarin bi
eşqa komûnîstan û Dîwana Sovêtê.²⁰³*

Romanên Kurdî yên Sovyetê, bi têgeha "Emrê Teze", diyardeyeke çandî û civakî pêşkêş dikin, ku tê de huner û edetên Kurdî bi îdeolojîya Sovyetê re tînin ba hev. Di van romanên de tê nîşandan ku Kurd, di nav şertên Sovyetê de, hêmanên xwe yê nasnameyî, wekî çand û ziman, diparêzin. Herwiha bi guherînên mezin, wekî rola jinan, gihîştina perwerdehiyê û tevlêbûna jiyana kolektîf, tîne dewlemendkirin. Ev roman, hunerê wekî navgîniyeke afirandina civakeke nû bi kar tînin, ku tê de edetên kevînar ên wekî qelenddayînê tînin rexnekirin û nîrxêna nû, wekî wekhevî û azadî, tînin pesinandin.

Gotina dawî, têgeha "Emrê Teze" di romanên Kurdî yên Sovyetê de ne tenê temsîla guherîneke sîyasî û aborî ye, lê temsîla şoreşeke giştî ya çandî, civakî û hunerî ye jî. Nivîskarên wekî Erebe Şemo, Heciyê Cindî, Egîdê Xudo û Eliyê Evdilrehman, bi karakterên xwe yê xebatkar û pêşverû, modela "însanê nû yê Sovyetê" pêşkêş dikin, ku ew ji bo civakeke wekhev, azad û pêşketî bi dil û can dixebitin. Ev roman, her çend bi bandora îdeolojîya Sovyetê hatibin nivîsandin jî, wekî berhemên edebî yê girîng ên Kurdî dimînin, ku ne tenê dîroka Kurdên Sovyetê, herwiha hewildana wan a ji bo jiyaneke nûjen û bextewar îfade dikin. Bi vî awayî, "Emrê Teze" ne tenê demeke nû ya dîrokî ye, bêguman ceribandineke nû ya jiyaneke ye, ku di Edebîyata Kurdî de cihê xwe yê taybet girtiye.

²⁰³ Şemo, *Hopo*, r. 168.

ENCAM

Di vê xebatê de, bi awayekî berfireh û analîtîk, têkilîya di navbera îdeolojîya Sovyetê û Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê (1920–1991) de hat vekolan. Armanc ew bû ku têgeha “Emrê Teze” bi awayekî krîtîk, herwiha wekî projeyeke îdeolojîk û edebî, di van pênc romanên Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê de bê vekolîn: *Hopo* û *Jiyana Bextewar* (Erebê Şemo), *Hewarî* (Heciyê Cindî), *Dê û Dêmarî* (Egîdê Xudo) û *Morof* (Eliyê Evdilrehman). Bêguman, bi rêya vê vekolînê, hat dîtin ku têgeha “Emrê Teze”, di van romanên de wekî temsîla guherîneke dîrokî tê pêşkêşkirin. Herwiha ev guherîn, ne tenê guherîneke civakî-aborî ye, lê belê stratejiyeke îdeolojîk a Sovyetê ye ku bi amûrên edebî tê normalîzekirin.

Bi analîza romanên Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê, em dibînin ku têgeha “Emrê Teze”, wekî metaforeke têkoşîna jiyane û projeyeke demdirêj a îdeolojîk tê bikaranîn, ku tê de çîna karker û gundî bi rengekî kolektîf li hemberî zordestîya feodalîzm û kapîtalîzmê serî hil didin. Ev têgeh, ji statûya metaforeke edebî ya sade derdikeve û dibe navendeke mezin a îdeolojîk û estetîk, ku hem dîroka Kurdên Sovyetê û hem jî guherîna wan a çandî, civakî û aborî bi awayekî têkûz radigihîne. Di vê çarçoveyê de, têgeha “Emrê Teze” ne tenê guherîneke demkî ya dîrokî ye, lê stratejiyeke edebî ye ku tê de Kurdên Sovyetê ji bindestîyê ber bi azadî, yekîti û pêşketinê ve tene birin û ev yek di bin çarçoveya teorîya Realîzma Sosyalîst de tê pêşkêşkirin. Li gorî vê felsefeyê, ku bi bingeheên Marksîst-Lenînîst ve girêdayî ye, huner divê rastîya civakê nîşan bide, lehengên erênî yên bi nîrxên kolektîf xemilandî biafirîne û ji bo pêşketina civakê xizmet bike.

Di romanên *Hopo* û *Jiyana Bextewar* ya Erebê Şemo de, em dibînin ku têgeha “Emrê Teze” rasterast bi pêşveçûnên aborî û perwerdehiyê ve tê girêdan, ku di wan de lehengên wekî Sehîd, Hesên û Zînê, wekî endezyarên civakî tene temsîlîkin. Ev leheng, bi xwendin û xebata kolektîf, ne tenê guherîna kesane lê belê avakirina civakeke nû ji sembolîze dikin, ku ev civak bi her awayî amade ye ji bo guherînê.

Di *Hewarî* ya Heciyê Cindî de, têgeha “Emrê Teze” bi bîranînên dîrokî tê honandin, ku minetdarîya ji Sovyetan re wekî temayeke sereke tê dîtin û rola Sovyetê di rizgarîya Kurdistan de wekî bingeha “Emrê Teze” tê destnîşankirin.

Di *Dê û Dêmarî* ya Egîdê Xudo de, têgeha “Emrê Teze” bi pevçûnên nifşî û çandî ve tê girêdan, ku zewaca di navbera milletên cuda de wekî sembola yekîtiya Sovyetê tê dîtin û ev yek têkilîya di navbera nasnameya Kurdî û enternasyonalîzma Sovyetê de bi awayekî têkûz nîşan dide.

Di *Morof* a Eliyê Evdilrehman de jî, têgeha “Emrê Teze”, bi guherîna ji jiyana koçeriyê, ber bi jiyana gundewarî ya modern ve tê îfadekirin. Lehengên wekî Morof û Mehmed, wekî şoreşgerên pratîk, yên ku bi xebata xwe di civaka xwe û kolxozan de guherîna civakî temsîl dikin, tene nîşandan. Bi senteza van mijaran, tê dîtin ku “Emrê Teze” wekî guherîneke dîyalektîk tê temsîlkirin: ji pevçûna di navbera kevneşopî û modernîteyê de, civakeke nû ya Sosyalîst derdikeve holê, ku tê de Kurdên Sovyetê wekî parçeyeke yekpare ya civaka Sovyetê tene temsîlkirin.

Mirov dikare bi rehetî bibêje ev roman, xisûsen ji bo bernameya polîtîk a edebî hatine nivîsandin. Di vê bernameyê de, bi rêya Realîzma Sosyalîst, “Însanên nû yên Sovyetê” hatine destnîşankirin. Ev însanên nû, ku ji bo Sovyetan divê karibin her fedakarîyê bikin, wekî prototîp, hema bêje di hemû berhemên vê serdemê de hatine bicihkirin. Di van berhemên de, herçiqas bi navên xwe cuda bin jî, bi taybetîyên xwe yên wekî hev, ji me re xerîb naxuyên. Ne tenê di berhemên Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê de, di berhemên hemû edebîyatên gelên ku bin hukmê Sovyetê de ne, em rastî vê bernameya polîtîk a edebî tînin. Bêguman, ev ne ji encama tercîhan çê bûye, ev gavên ji bêgavîyê bûn. Ji ber ku rêyeke din tunebû. Loma, gava em berê xwe bidinê, hema yek be jî, ti nimûneyeke rexneyê, ku wê demê li ser Sovyet û Komunîzmê hatibe kirin peyda nabe. Ji ber ku ne mimkun bû, berhemek bêyî destûra hikûmeta Sovyetê here ber çapê û bê weşandin. Bêguman, gava em bi berfirehî berê xwe bidinê, bi xêra reformên Sovyetê, bizaveke pir girîng li Edebîyata Kurdî ya giştî zêde bû. Herwisa li huner û arşîva Kurdî jî.

Di encamê de, ev xebat destnîşan dike ku têgeha “Emrê Teze” di romanên Kurdî yên Sovyetê de wekî projeyêke îdeolojîk hatiye bikaranîn. Ev berhem, her çend di bin sansûra Sovyetê de, bi armanca propagandayê hatibin nivîsandin jî, dengê têkoşîn, xeyal û xwestekên Kurdan ya ji bo jiyaneke çêtir vediguhêzin. Herwiha tê dîtin ku ev berhem, li gel şahidîya xwe ya dîrokî, têkilîya tevlihev a di navbera huner û siyasetê de û rola edebîyatê di avakirina civakan de dihevin.

Bêguman, Sovyet tava Kurdên Serhedê-Kavkazê bû, ku ew gelek caran pê germ jî bûn û pê şewitîn jî. Helbet, ji bo pêşketin û nûjenîyê, îmkanên pir mezin ji bo wan hatin amadekirin, lê derd û kulên Kurdên vê herêmê ti car neqedîyan. Sirgûnî û heps, birçîtî û mirin dîsa hebû. Lê xizmeta mecbûrî ya ji bo hikûmet û rêvebiran? Ew jî hebû. Loma mirov bibêje, ew bextewariya ku li ser navê têgeha “Emrê Teze” hate pesinandin û bû mijara vê xebatê jî, bextewariyeke îdeolojîk e, dê ne şaş be.

ÇAVKANÎ

Ahmedzade, Haşim (2004). *Ulus ve Roman*, İstanbul: Pêrî.

Akboğa, Hasan (2013). “Kürt Aydınlanmasının Kalesi: Radyoya Yêrêvanê”, *Kürt Tarihi*, s. 4, İstanbul, s. 16-19.

Althusser, Louis (1971). *Lenin and Philosophy and Other Essays*, New York and London: Monthly Review Press.

Alakom, Rohat (2009). *Çokkültürlülük Işığında Kars Kürtleri*, İstanbul: Avesta.

Alakom, Rohat (2012). “Kürt-Rus İlişkileri Tarihinden Şemsedinov Kürtleri”, *Kürt Tarihi*, s. 1, İstanbul. s. 30-35.

Alakom, Rohat û Badem, Candan (2012). “Karslı Bir Kürdün Digor’dan Sibirya’ya Uzanan Öyküsü”, *Kürt Tarihi*, s. 3, İstanbul, s. 10-17.

Alakom, Rohat (2023). *Riya Teze*, Stenbol: Avesta.

Alan, Remezan (2009). *Bendname*, Stenbol: Avesta.

Allison, Cristine & Kreyenbroek, Philip (2008). *Kürt Kimliği ve Kültürü*, İstanbul: Avesta.

Bedîrxan, Ezîz Zîyo (2022). *Kızıl Kürdistan*, çev. Hejarê Şamîl, İstanbul: Dara.

Bukşpan, A. B. (2007). *Azerbaycan Kürtleri*, çev. Hejarê Şamil, İstanbul: Peri Yayınları.

Can, Hüseyin (2005). “*Sosyalist Sovyetler Birliği*”nde Kürtler, İstanbul: Pêrî.

Celalî, Mûrad (2014). “Di romanên Erebe Şemo Jiyana Bextewar û Hopo de: Tîpên Şoreşger ên Romantîk”, *Nûbihar*, 126 (Jimara Taybet), r. 72-76.

Çoban, Betül (2017). *Şopên Realîzma Sosyalîst di Romanên Kurdî yê Sovyeta Berê de*, Teza Lîsansa Bilind a Zanîngeha Mardin Artûklûyê.

- Çoban, Betül (2017). “Lehengên Erênî û Şoreşger di Romanên Kurdî yên Sovyeta Berê de”, *Wêje û Rexne*, j. 9/10, r. 105-124.
- E. Bonnell, Victoria (1997). *Iconography of Power: Soviet Political Posters under Lenin and Stalin*, University of California Press.
- Egîdê Xudo (2016). *Dê û Dêmarî*, Stenbol: Nûbihar.
- Eliyê Evdilrehman (2012), *Morof*, Amed: Lîs.
- Emin Zeki Beg, Muhammed (2010). *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*, İstanbul: Nûbihar.
- Ergün, Zülküf (2017). “Ducemseriya Realîzma Soayalîst di Romanên Erebe Şemo û Hecîye Cindî de”, *e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi*, 9(2), r. 644-661.
- Erebe Şemo (2016). *Hopo*, Diyarbakır: Lîs.
- Erebe Şemo (1994). *Jiyana Bextewar*, İstanbul: Deng.
- Ergün, Zülküf (2023). *Edebîyata Kurdî ya êwra Sovyetê*, Ankara: Nûbihar.
- Eskerê Boyîk (2019). *Çanda Kurdên Sovetê*, Stenbol: Peywend.
- Enç, Bahar (2024). *Edebîyata Kurdî ya Zarokan di Serdema Kafkasyayê de*, Teza Lîsansa Bilind a Zanîngeha Bîngolê.
- Figes, Orlando (1996). *A People's Tragedy: The Russian Revolution 1891–1924*, London: Penguin Books.
- Fitzpatrick, Sheila (1999). *Everyday Stalinism: Ordinary Life in Extraordinary Times Soviet Russia in The 1930s*, Oxford University Press Inc.
- Gorky, Maxim (1995). *Untimely Thoughts: Essays on Revolution, Culture and the Bolsheviks 1917-1918*, Translate; Herman Ermolaev, New Haven: Yale University Press.
- Gorky, Maxim (2015). *The Mother*, Translated by Hugh Aplin, Alma Classics.

- Gramsci, Antonio (1971). *Selections from the Prison Notebooks*, translate by Quintin Hoare û Geoffrey Nowell Smith, New York: International Publishers.
- Gültekin, Mehmet (2014). “Kurdên Qafqasyaya Başûr”, *Nûbihar*, j. 126 (jimara taybet), Zivistan, Istanbul, r. 21- 22.
- Hassanpour, Amir (2005). *Kürdistan’da Milliyetçilik ve Dil*, İstanbul: Avesta.
- Heciyê Cindî (2008). *Hewarî*, Amed: Lîs.
- Hejarê Şamil (2005). *Diaspora Kürtleri*, İstanbul: Pêrî.
- Kan, Güneş (2016). *Îmaja Ermenî di Romanên Kurdî yên Sovyeta Berê de*, Teza Lîsansa Bilind a Zanîngeha Mardin Artûklûyê.
- Keleş, Nevzat (2016). *Şeddadiler, (951-1199) Orta Çağda Bir Kürt Hanedanı*, İstanbul: Bilge Kültür Sanat.
- Konak, İsmet (2017). “1917 Ekim Devrimi’nde Kürtler”, *Kürt Tarihi*, s. 30, İstanbul, s. 4-7.
- Konak, İsmet (2012). “Kürt Tarihinde Bir Özerklik Modeli: KIZIL KÜRDİSTAN”, *Kürt Tarihi*, s. 14, İstanbul, s. 37-40.
- Konak, İsmet (2017). “Mustafa Suphi’nin Rusya İç Savaşındaki Rolü”, *Ayrıntı Dergi*, s. 23, Ekim- Kasım 2017, s. 40-43.
- Konak, İsmet (2022). *Sosyalist Kürtler*, İstanbul: Nûbihar.
- Konak, İsmet (2014). “Sovyet Kürtlerinin 1937-1938 Sürgünü”, *Kürt Tarihi*, s. 4, İstanbul, s. 20-25.
- Kollontai, Alexandra (1971). *The Autobiography of a Sexually Emancipated Communist Woman*, Foreword by Germaine Greer, Herder and Herder.
- Kotkin, Stephen (1995). *Magnetic Mountain: Stalinism as a Civilization*, University of California Press.

- Leezenberg, Michiel (2022). “Sovyet Kürdolojisi ve Kürt Oryantalizmi”, Werger; Menaf Êlî, *Kürt Araştırmaları Dergisi- Dosya; Kafkasya Kürtleri*, s. 8, s. 97-114.
- Leezenberg, Michiel (2023). “Tarih Tarafından Unutulmuş Bir Halk: Kürtler Hakkındaki Sovyet Çalışmaları”, *Kürt Tarihi*, çev. Metin Yüksel, s. 52, s. 10-15.
- Lenin, V. I. (1999). *Ekim Devrimi Dosyası*, Çeviren; Kenan Somer, Ankara: Sol Yayınları.
- McDowall, David (2004). *Modern Kürt Tarihi*, İstanbul: Doruk.
- Moran, Berna (2009). *Edebiyat Kuramları ve Eleştiri*, İstanbul: İletişim.
- Öztaş, Özkan (2016). *Sovyetler Birliği’nde Kürt Sanatı*, İstanbul: Yazılama.
- Sehîdê Îbo (2009). *Kurdê Rêwî*, Stenbol: Avesta.
- Sezer, Müslîh (2020). “Destpêka Romana Kurdî; Panoramaya Romana Êwra Kavkazê (1935-1991)”, Edîtor; M. Zahir Ertekin-Mehmet Yıldırımçakar, Destpêka Romana Kurdî, Van: Peywend. r. 23-47.
- Taels, Herman (2001). *Eski Sovyetler Birliği’nde Kürtler*, çev. Nadire Işık, İstanbul: Pêrî.
- Tagızade, Leyla (2006). “Sosyalist Realizm: Kökeni, Oluşum Süreci ve Kavramı”, *Modern Türklük Araştırmaları Dergisi*, s. 3(4). s. 7-24.
- Temûrê Xelîl (2014). *Antologiya 35 Helbestvan û Nivîskarên Kurd ên Sovyeta Berê*, İzmir: Na.
- Tosinê Reşîd (2012). “Sovyetler Birliği’nde Kürt Edebîyatı”, Derleyen; Vecdi Erbay, *Înatçı Bir Bahar; Kürtçe ve Kürtçe Edebîyatı*, İstanbul: Ayrıntı.

Yavuzer, M. N. (2020). “Panoramaya Nasnameya neteweyî di Romana Êwra Kavkazê de (1935-1991)”, Edîtor; M. Zahir Ertekin-Mehmet Yıldırımçakar, *Destpêka Romana Kurdî*, Van: Peywend, r. 49-78.

Yıldırımçakar, M. (2020). “Bi Perspektîfa Hînwerîya Lehengên Erênî Tîpê Şoreşger ê Rûs di Romana Kurdê Rêwî ya Sehîdê Îbo de”, Edîtor; M. Zahir Ertekin-Mehmet Yıldırımçakar, *Destpêka Romana Kurdî*, Van: Peywend, 155-169.

<https://electro.nekrasovka.ru/books/6179694> (dîroka jêgirtinê: 17.07.2025)

Arşîva rojnameya *Новая Жизнь-Novaya Zhizn* (Menshevik) 1917-1918:
https://nlr.ru/res/inv/ukazat55/record_full.php?record_ID=126741 (dîroka jêgirtinê: 17.07.2025)